Arşîva Bîra Kurdan: Ji Le Monde diplomatique gotara bi serenavê "Gavên bê serî yên artêşa tirkî" ('98)

ÇAPA ÎNTERNETÊ

LE MONDE diplomatique kurdî

Tîrmeh 2012 - Hejmar 32 www.diplo-kurdi.com • info@diplo-kurdi.com 20 Rûpel

P. Bourdeau û R. Christin
Tûrîzma ku heta destpêka sedsala 20ê mijûlîyeteke dewlemendan bû, îro veguherîye çavkanîyeke endustrîyel û çawa ku li Çînê qewimî dibe sedemê dagerîneke girseyî ya nifûsê...
▶ R. 6

Joëlle Fontaine
Krîza aborî li Yewnanîstanê du bîranînên kevin zindî kirin: Yek ji wan, dema Almanyayê di Şerê Cîhanê yê Duyem de Yewnanîstan dagir kiribû û ya din jî dema destwerdana Hêzên Hevgirtî...
▶ R. 9

Frédéric Durand
Welatê Tîmor-Leste herçiqas weke welatekî "biqasî nokekê piçûk" jî were terîf kirin, ew dîsa ji Lubnan an jî ji Jamaîkayê mezintir e û serjimara wê qasî ya Qibris an jî Estonyayê ye...
▶ R. 13

Salima Ghezali
Sartre, di pêşgotina pirtûka Frantz Fanon a "Lanetîyên li ser rûyê erdê" de pesnê şideta bindestan dide. Hêja ye ku mirov li ber ronahîya serxwebûnan û şerên navxweyî ji nû ve lê binêre…
▶ R. 18

Razmig Keucheyan
Çima şoreşeke karkeran a weke ku di 1917ê de li Rûsyayê li dar ket, li tevahîya welatên din ên ewropî hatibû şikandin? Antonio Gramsci, di 'Nivîsên Girtîgehê' de li bersiva vê pirsê digere...
▶ R. 19

Li bakurê Kurdistanê rewşa siyaseta legal û asta temsîlîyê

MAHMUT KILINC *

Li bakurê Kurdistanê, di nava siyasetvanên bakurî da, taybetî li ser birêxistin û meşandina karûbarê siyasî, ji berê da gengeşîyek heye: Bi ya beşekê, divê kurd bi derdorên çepgir, pêşverû û demokratên tirk re di nav partîyeke Tirkîyeyî da cih bigirin, ew partî, demokratîkbûna Tirkîyeyê bona xwe wek peywirekê bipejirîne û hewl bide bona çareserkirina pirsgirêka kurd, bi ya ditîna din; divê kurd him li herêma bakurê Kurdistanê û him jî, li herêmên Tirkîyeyê yên ku kurd lê niştecih in, xwe rêxistinî bikin û bi armancê destxistina mafên demokratîk û neteweyî siyaseteke demokratîk bidin ber xwe.

Bawerîya herdu dîtinan jî, li ser zemînekî rewa, çewsandina çarçoweya zagonî ya Dewleta Tirk e, daku di bergeha demokratîkbûnê da bê guhertin. Di hêla din da, ligel zagonên Tirkîyeyê, li bakurê Kurdistanê rêxistinên "îllegal" ji berê da hene, dîroka wana wek partî heta destpêka salên şêştî, lê wek rêxistin heta destpêka sedsala 20ê dajo. Lê, êdî ew jî ne wekî salên şêştî di nav qalibên îdeolojîk da ne û siyaseta ji dema Şerê Sar xwe dişon, ji xwe, ji xêncî PKKê, hinek tenê navê wana tê zanîn, hêza hinekan jî daketîye asteke gelekî marjînal.

Îro li bakurê Kurdistanê, sê partî temsîlîya herdu dîtinan dikin. ***Partîya Aştî û Demokrasiyê-BDP***, li ser dîtina yekem siyasetê dimeşîne. Ji bernameyên ***Partîya Maf û Azadîyan-HAKPAR*** û ***Partîya Demokrasîya Beşdar-KADEP*** û herweha ji peyamên rayedarên herdu partîyan dixuye ku ew bêhtir li ser xeta din disekinin.

Dîroka kulvara siyasî, ya siyaseta bakurê Kurdistanê, ya ku bi zagonên Tirkîyeyê "legal" tê hesibandin bi damezrandina ***Partîya Keda Gel*** (Halkın Emek Partisi-HEP) dest pê dike. HEP di 7ê pûşbera 1990ê da hat damezrandin. Pêvajoya damezrandina HEPê gellekî bi gengeşî dest pê kir. Li Parîsê, di bin navê "Konferansa Kurd" da civînek ku du rojan ajot hat li darxistin, ji SHPê (Sosyaldemokrat Halkçı Partî) 6 parlementerên kurd beşdarê civînê bûbûn. Ji ber vê beşdarbûnê ev parlementer, bi daxwaza ji partiyê derxistinê (îxrac) ketin ber lêpirsîna disîplînê. Vê biryarê, rêxistinên, lijneyên bajar û bajarokên seranserê bakurê Kurdistanê rakir ser pîyan û nerazîbûnek gelekî fireh rû da. Di encama vê gengeşîyê da, her şeş parlementer ji partîyê hatin derxistin.

Berê jî parlementerek, parlementerê bajarê Meletîyê **Îbrahim Aksoy**, ji ber ku di civîna Konseya Ewrupa da li ser mafên gelê kurd axifîbû, ji partîyê hatibû derxistin. Parlementerên hatibûn derxistin û çend parlementerên ku bi mebesta piştevanîyê ji partîyê xwe bi paş ve kişandibûn, bi serokên 12 lijneyên bajarên Kurdistanê dest bi karê damezrandina partîyeke nuh kirin. Ewil bi navê *"pêkhatina demokratîk"* alternatîfek li rayagiştî diyar kirin. Piştî demekê giranîya siyasetvanên kurd li ser alternatîfê diyarker bû. Hinek siyasetvanên tirk, her çiqasî eşkere nekiribin jî, ji ber vê ji Pêkhatina Demokratîk xwe paşve kişandin. Lê kurdan bi israr karûbarê alternatîfê meşandin, fireh û bilind kirin.

Di encamê da HEP hat damezrandin. Lê bi damezrandinê re çewsandina dewletê dest pê kir. Weha dixuya ku di destpêkê da dewlet li hemberî partîyeke ku Kurd têde karîger in, ne amade bû, lê di demeke kurt da xwe amade kir û dest bi êriş û rê û rêbazên bêzagonî kir. Bi qetilkirina serokê lijneya Amedê **Vedat Aydin** êrişên dewletê, gihîştin asta herî bilind û êdî jîyana hemî partîyîyan di bin xetera kuştinê da bû. Heta roja qedexekirinê bi dehan partîyî, ku di nav da 2 jî serokên lijneyên wîleyetan hebûn, bi destê çeteyên mîlîtariîst hatibûn kuştin.

HEP, di 14 tîrmeha 1993ê da hat qedexekirin. Paşê bi dorê, Partîya Azadî û Wekhevîyê-ÖZEP, Partîya Azadî û Demokrasîyê-ÖZDEP û paşê jî heman kadroyê Partîya Demokrasîyê-DEP damezrand. Partî nuh bû, hê umrê wê du meh nebibû, lê êriş û zordarîya dewletê ji berê bêhtir bû, di kurte jîyana vê partîyê da parlementer **Mehmet Sincar**, endamên lijneya navendî û nêzikî du sed partîyî hatin kuştin. Piştî ku DEP hat qedexekirin, Partîya Gel Ya Demokrasîyê-HADEP, piştî ku ew jî hat qedexekirin vê carê Partîya Demokratîk ya Gel-DEHAP, paşê ew jî hat qedexekirin û Partîya Civaka Demokratîk-DTP hat damezrandin. Bi qedexe kirina wê jî partîya îro, ango Partîya Aştî û Demokrasîyê-BDP hat damezrandin.

Partîya Aştî û Demokrasîyê BDP (Barış ve Demokrasi Partisi) ji vê kevneşopîya siyasî tê. Partî, taybetî xwe ji nasnameya Kurdistanî dûr dixe û xwe wek partîyeke Tirkîyeyî pênas dike. Bernameya wê di vê çarçoweyê da hatîye nivîsîn. Lê belê, bona nasnameya partîyekê gelo xwe pênaskirina partiyê têrê dike?

▶ R. 3

Dîyaspora, koçberî û transkoçberîya kurd

PROF. DR. ILHAN KIZILHAN

Pêvajoya pêkhatina koçberîya kurdan li Ewropayê bi rengên cîhguhertin, bi darê zorê ji cih û war kirin, penagihandin, gerîna li kar, xwendin yan jî koçberîya ber bi welatekî din ve heye. Girêdayî avahîya civaka li Ewropayê, weke komên din ên koçber kurd jî bi fenomenên hindikahîyan û etnîsîteyê re rûbirû ne. Hebûna mijarên din ên referansê (erd, sazî, bawerî, ziman) têkilîya navend û derdorê, ya pirranî û hindikayîyê diafirîne; elaqedarî nedomdarîya dem û hêvîyên erdan û ya di warê bîrewerîyê de, elaqedarî sedemên koçberîyê, şert û mercên wê li qada civakî-çandî û yên tevnên kurdî pirsgirêkên xerîbbûn û bidilûcanbûnê, akulturasyon û asîmîlasyonê, jidestdana nasnameyê û bidestxistina nasnameyê, bêdîrokbûn û perspektîfên dîrokê didin der. Li ser bingehê van cudatîyan rengên cihê yên koçberîyê hene, yên weke dîyaspora, koçberî û êdî herweha transkoçberî jî.

Destpêk

Koçberîya kurdan ber bi welatên rojava ve ne bi hatina wan kesên ji wan re karkerên mêvan tê gotin di salên 60î yên sedsala 20ê de dest pê kir. Ne bi tenê li Almanyayê, belê li tevahîya Ewropayê koçberîya kurdan bi ger û geşta kurdan hê dawîya sedsala 18ê dest pê kir, hingê endamên malbatên mezin yan jî wezîfedarên împaratorîyên osmanî yan jî persî bi armanca xwendinê yan jî bi wezîfeyên dîplomatîk hatin bajarên mezin ên Ewropayê (Kizilhan, 2002).

Bi hejmareke mezin kurd cara pêşî ber bi dawîya salên 40î yên sedsala 20ê ji bo xwendinê hatin Ewropayê; wekî din hinek kurdên halxweş jî hingê li hin dewletên Ewropayê diman. Van xwendekaran komele damezrandin, di nava demeke kurt de çalakîyên berfireh ên weke çapkirina weşanan, civîn û hwd. li dar xistin. Ev komeleyên xwendekaran weke mînak ên li Swîsre, Fransa yan jî Almanyayê dikarin weke pêşîyên gelek komele, yekîtî û rêxistinên cihêreng ên kurdan ên li Ewropayê werin dîtin. Bi vî awayî, weke mînak sala 1949ê li Parîsê "Navenda Lêkolînên Kurdî" û paşê li Berlînê (1956) komeleya kurd "Kurdish Students Society in Europe" (KSSE) hat damezrandin. Bi serhildana kurdan li Iraqê re û jihevdeketina berxwedana wan a sala 1975ê re hejmara kurdan li Ewropayê zêde bû (Vanli, 1986).

Kurdên ji Sûrîyê pêşî weke xwendekar hatin. Hejmara wan di salên 60î de ji ber dîktatorîya heta roja me ya îro dewam dike, zêde bû; hejmara penaberên kurd ên ji Sûrîyê her zêde dibe. Tepisandina kurdan li Îranê a ku ji sala 1979ê ve bi rejîma Îranê ya li bin desthilatdarîya Xumeynî re û bi şerê navbera Iraq û Îranê re yê 1980-1988ê dijwar bû, darbeya eskerî ya li Tirkîyeyê ya sala 1980yî, qirkirina Enfalê ya [ji kurdan] "paqijkirina" Kurdistana Iraqê ji sala 1987ê pêve – di nava wan de ya adara 1988ê li dijî bajarê Helebceyê jî, bi 39 êrîşên belgekirî yên bi sîlehên kîmyewî –

▶ R. 4

AHMET KARABULAK: **Gumîneke şîzofrenî**, enstalasyon

EDITO

Federalîzma bi zorê

Serge Halimi

Karesatên herî mezin dikin ku bawermendên herî dildar di cih de sofîtî û dîndarîya xwe jî qat bi qat ji berê zêdetir bikin. Bi vî rengî federalîstên ewropî yên ku hê pir jê dûr in ku fêm bikin, rojekê mirov dikarin pişta xwe bidin siyasetên întegrasyonê – yên pereyî, budceyî, bazirganî – yên ku krîz û qeyrana aborî hem xirabtir kirin û hem jî ew belav kirin. Berevajî, dilê van federalîstan heye ku hêz û otorîteya wan kesên ku ev siyaset pêk anîn, xurttir bikin. Civînên bilind ên ewropî, peymanên îstîqrarê, çerxên disîplînê gelo tu tişt çareser nekirin? Ya ku sofîyên me bi awayekî sabît bersivê didin ev e, ew têra xwe hişk nebûn: tevahîya serketinê bi Ewropayê tê ravekirin û tevahîya binketinê bi nebûna Ewropayê. (1) Ev bawerîya wan a korane dike ku ew bikevin xeweke giran û xewnên xweş bibînin. Her weha kabûs jî, lewma federalîst ji rojên zor û zehmet natirsin. Heta ragihandina van bahozan destûrê dide wan ku bi hênceta rewşa acîl, tevahîya berxwedana li dijî merama wan a mezin bişkînin. Di nîvê borê de û di bin gulebaranê de tu kes divê bi paş ve gavê neavêje. Divê mirov yan ji çem bibihure yan jî bixeniqe, yan "pengijîna federal" bi lez bike yan jî karesatê erê bike. Çiriya paşîn a bihurî kevne-wezîrê karên derve yê alman **Joschka Fisher** fikra xwe weha derbirîbû: "*Heke konfederasyona heyî neberide û nebe federasyoneke siyasî ya xwedî hêzeke navendî, qada euroyê – û tevahîya Yekîtiyê – wê ji hev bikeve.*" (2) Li Fransayê sê kanalên radyoyê yên mezin ên neteweyî û du rojnameyên sereke her vê stran û qesîdeyê dubare dikin.

Dema ku mirov guh dide federalîstan, mirov amade ye lê bifikire ku hêz û çavkanîyên sazî û dezgehên ewropî kêm in, li alîyê din dewlet bi xwe xwedîya otorîte û navgînên bêsînor in. Lê belê Bankeya Navendî ya Ewropî (ECB), ya ku çawa ku em dizanin bi serkeftî ji heqê krîzê derket, hê berîya demeke kurt 1000 milyar euro ji bo ji nû ve fînanskirina bankeyan veqetandî, ne girêdayî hukûmetan e, ne jî girêdayî hilbijêrên Yekîtîyê ye. Ti rengê nebûna întegrasyonê (budceya hevpar, wezîrê yekane) zorê lê nakin, bi vî halî hevdengkirina siyaseta ewropî ya li gorî pîvana siyaseta jixwekêmkirinê ya alman jixwe encam derxistine holê, lewma jê hat ku deyndarîya dewletan xirabtir bike û perîşanîya gelan jî zêdetir bike...

Lê belê reşbînên îro xweşbînên do ne. Yên ku bi zorê ferzkirina siyasetên Yekîtîya Ewropayê ji sîh salan û vir ve han didin (teşwîk dikin), wan bi dorê bazara herî mezin a dinyayê, pereyê yekane, "siyaseta şaristanîyê" pîroz kir; kengî biryara gel li dijî wan bû nebihîstin; tevahîya projeyên întegrasyona ewropî yên ku wê xwe bisipartanatedbîrên civakî – ev nav li wan têkirin –, xizmetên dewletê, girtina sînoran li îxracatê, xira kirin. Bû nîvê şevê, payton veguherî kundirê mîranî; ew bi carekê kêf û helhela xwe ya par û pêrar ji bîr dikin û sûnd dixwin ku timî em hişyar kiribin, gotibin, evna wê ti carî pêk neyê û nexebite.

Gelo dramatîzekirina rewşa malî wê weke hêncet were bikaranîn da ku pêngaveke din a federal ber bi pêşve were ferzkirin, beyî ku sînorên dengdana giştî bandorê lê bikin? Ewropayeke ku jixwe bi zor hevdigire, gelo dikare bi rastî destûra vê redda demokratîk bide xwe?

(1) Pierre Rimbert, "Le théorème de Guetta/ Teorema Guetta" , *Le Monde diplomatique,* çiriya pêşîn 2008.

(2) *Le Figaro,* Parîs, 7ê çiriya paşîn a 2012ê.

Wergera ji fransî: Luqman Guldivê

Fritz Langê biheybet

Lionel Richard

Li gor **Alfred Eibelê** ku pêşgotin di 2007ê de ji bo çapa nû ya nivîsên hilbijartî yên sînemavanê binavûdeng nivîsiye, li ser **Fritz Lang** *«çi bigire her tişt hatiye gotin»*. Xweşbextane, ev yek ne rast e; pirtûka berdest a bi navê *Fritz Langê li ser kar,* nîşana vê ye; analîza jîyanekê ku di heman demê de jî lêkolîneke sîstematîk a berhemekê ye û Bernard Eiseschitz nivîsandiye. (1) Di navbera 1919 û 1960ê de, Fritz Lang nêzîkî çil fîlm çêkirin. Peydabûn, nivîsandin û çêkirina nêzîkî sih ji wan mijara analîzeke hûrgilî ne.

Bingeha lêkolînê çi ye? Arşîva ku Fritz Lang, ji 1955ê bi vir de, ji Sînemateka Fransî re hiştiye, ew emanetî miqateyîya **Lotte Eisner** kiriye; hevalê xwe yê sadiq, ku weke wî naçar bûye ji Almanyayê bireve. Lê herwiha, di nav wan de gelek kovarên almanî yên di navbera salên 1920 û 1930ê, dema amerîkîyan de, nameyên neweşandî û şahidîyên ku nivîskar bixwe berhev kirine jî, hene.

Wê demê **Fritz Langê** belengaz belbî di bin dokumantasyoneke wiha de fetisî bû, lê Eisenschitz karîbû dewlemendîya kesayetîya wî bi hemî paradoksên xwe ve baş eşkere bike. Eisneschitz israrê dike; ew mirovek bû ku *«heta dawîyê»* xwe di nav kûrahîya sedsala tê de dijî, hîs dikir. Ew ew mirov e ku, di bîst salên dawîn ên jîyana xwe de, herçend pir xwestiye bibe hevwelatîyê wê jî, her li dijî *«demokrasîya»* amerîkî bûye. Bêhêvîtîya wî nikaribû hunerê sînemayê ku daketibû asta pîşeyekî teknîkê ku xwe bi çêkirina fîlmên bazirganî mezin dikir, rizgar bikira.

Ev pirtûka Eisenschitz ku tê de têra xwe wêne, krokî û destnivîs hene, pêvajoya amadekarîya fîlman baş rave dike û ji alî pêşangeha li ser fîlma bi navê *Métropolis* ya ku Sînemateka Fransî pêşkêş kiribû ve jî hate tesdîqkirin. (2) Ev fîlma seyr, zanist-xeyalîyê ku bi îcada afirandîyekî mekanîk xwe nîşan dide û utopyaya civatî ya nemumkin ku peymaneke di navbera sermîyan û kar de pêk tîne, tevlîhev dike. Pêşangeh nîşan dide ku daxwaza awarte ya hunerî ya **Fritz Lang**, xwe berdaye nav xetên cilûbergan û nav avakirina hîleyên sînemayî yên ji bo ferzkirina dîtina mîmarîyeke ji nûjenîyê wêdetir, sembola pêşerojê ya robotîze ye ku li dinyayeke serdest û bindest, xwedîyê kargehekê û karkirên xwe şerê hev dikin, derdikeve holê.

Ev fîlm –derhênana herî biha ya wê demê – cara pêşin, di 10ê çileya paşîn a 1927ê de, li Berlînê tê nîşan dan. Lê karmendên sansurê jî li wir in; amade ne ku destên xwe biavêjin meqesên xwe. Di 5ê Tîrmehê de, wan piştî jêkirina sîh û pênc deqeyên fîlmê, destûra belavkirina *Metropolis* dan. Ji bo ji nû ve lêzêdekirina wan, nêzîkî nîv sedsalê macera û bedbextî pêdivî bû.

Serdana vê pêşangeha, ku derfeta dîtina xebateke bêhempa dida, bû sedema pirs jixwekirina di derbarê pêrgînîya fîlmên ku **Fritz Lang** berî 1934ê çêkiribûn ku li Fransayê hatibû rezervekirin. Ji bo hezkirîyên sînemayê yên bijare **Georges Charensol**, *Métropolis* bi riya *«mijareke xwedî îdia ya ji alî Thea von Harbou ve hatiye xeyalkirin»,* hevala wî ya wê demê, meyleke xeter *«ji ber bêpîvanî û bêserûberîya xwe»* li ba wî pêk tîne. Di kovarên pêşeng de, ne seyr e ku mirov gelek caran ji bêpîvanî û giranîyê bikerixe.

Serketina rastî ya pêşîn: *Wesiyeta Doktor Mabuse* e, ku di nîsana 1933yê de derket ser ekranên Parîsê. Mijara wî, dînekî ku doktorê xwe hîpnotîze dike û wî dike serekê komeke eşqîyayan, bêgûman yê gelekan e. Ew ji bo *«ewleyîya xwe ya pêkanînê» û «performansa xwe ya teknîkî ya bêqusûr»* tê pîroz kirin. Lê, piştî salekê, *Liliom* yekane filma **Fritz Lang** ku piştî sirgûnbûna wî li Almanyaya nazî li Parîsê ji alî Fritz Lang ve, di tîrmeha 1933yê de hatiye çêkirin. Ji sisiya yekê vê fîlmê ji alîyê derhêneran ve hatiye birîn, ji ber ku *«pir alman bûye»,* lê tevî vê jî, bîneran lê fîkandiye.

Hîn bi tenê di salên 1960ê de ye, ku *«dahîtîya sînemayî»* ya Fritz Lang biyekdengî ji alîyê rexnegirên fransî ve tê pejirandin. Ji bo pîrozkirina wî, pêşnîyaza ku jê re, di 1964ê de, hatiye şandin, jê daxwaza serokayetîya Festîvala *Cannes*ê dike: Ev cara pêşîn e ku serokayetî dibe nesîbê sînemagerekî.

(1) Bernard Eisenschitz, *Fritz Lang au travail / Fritz Langê li ser Kar*, Cahiers du cinéma éditeur, Parîs, 2011, 272 rûpel, 56,95 euro.

(2) Berhemên Pêşandana ku heta 29ê çileya paşîn a 2012yê hatiye pêşbînîkirin, ji Deutsche Kinemathek a Berlînê dan anîn, ku ew di 2009ê de lê hatin nîşandan. Bi tenê çend berhem lê hatin zêdekirin.

Wergera ji fransî: Yaqûb Karademîr

Ahmet Karabulak: **Rêzewêneyên ji Guernîcayê heta Halebçê**, qîr li ser mûşembeyê, 155 x 300 cm

Le Monde diplomatique kurdî (Çapa elektronîk)
Ji aliyê Independent Kurdish Media Group GmbH ve tê weşandin

INDEPENDENT KURDISH MEDIA GROUP GMBH
Carnotstr. 4
10587 Berlin / Almanya

Lijneya Weşanê
Murad Satik
Riza Dînç

Le Monde diplomatique kurdî

Redaksiyona Zimanî
Mahmûd Lewendî
Remzî Kerîm

Koordînasyon
Yado Ciwan

Alîkarên vê hejmarê
Nedîm Baran
Semra Polat
Ergün Yetkiner

Revîzyona Wergeran
Feryal Guladawîya

Berpirsê Hunerî
Hasan Huseyîn Devecî

Designer
Fabio Biasio

Web Developer
Erhan Yekta

Tel: 00 49 (0)30 330 990 420
Fax: 00 49 (0)30 330 990 429
info@diplo-kurdi.com
www.diplo-kurdi.com

ABONETÎ
Independent Kurdish Media Group GmbH

Berliner Volksbank
Konto: 2284 123 010
BLZ: 100 900 10
IBAN: DE78 1009 0000 2284 1230 00
BIC/SWIFT: BEVODEBB

Abonetîya dîjîtal ya salane: 30 €

Le Monde diplomatique

Damezrîner
Hubert Beuve-Méry

Birêveberê giştî
Serge Halimi

Sernivîskar
Maurice Lemoine

Cîgirên Sernivîskarî
Martine Bulardi
Philippe Rivière
Anne-Cécile Robert

Redaksiyon
Alain Gresh
Mona Chollet
Pierre Rimbert
Dominique Vidal

Birêveberê hunerî
Alice Barzilay

Dokumantasyon
Olivier Pironet

Sekreter
Sophie Durand
Monique Salomé

Tel: 00 33 (0) 153 94 96 01
Fax: 00 33 (0) 153 94 96 26

1-3, rue Stephen-Pichon,
F-75013, Paris, France

www.arsivakurdi.org

Li bakurê Kurdistanê rewşa siyaseta legal û asta temsîlîyê (Dewama rûpela 1)

Bi bawerîya min ligel xwe pênaskirina partîyê divê mirov, li dîtin û bawerîya rayagiştî jî binêre. Gelo rayagiştî BDP çawa pênas dike? Li qada navdewletî çawa tê pêşwazî kirin?

Dema mirov li bersiva van pirsan bigere, tê dîtin ku nasnameya BDPê ya Kurdistanî, herçiqas ew nabêje jî, giran dikşîne.

Lê belê ligel vê bawerîyê û têkoşîneke bi dehan salan û bedelên ku hatine dayîn, bernameya partîyê di asta partîyeke sosyaldemokrat da ye û demokratîkbûna Tirkîyeyê wek peywira sereke daye ber xwe.

BDP di destpêka bernameya xwe da balê dikşîne ser pêdivîya demokratîkbûna Tirkîyeyê û weha dibêje, *"Amade kirin û sepandina projeyên gewre yên guhertina civakî, reformên ku bi mebesta dewlet demokratîze bibe, dê çareserkirina pirsgirêkên civakî bi rêjeyeke bilind hêsa bike. Ancak wê demê Tirkîye dikane bibe endameke şareza û birûmet ya dinyayê."* Û li ser armancê damezrandina partîyê weha dibêje, *"Bi Kurtî, divê li Tirkîyeyê rêxistneke siyasî hebe ku pir-rengînîyê bipejirîne, li mafê mexdûran bipirse, li dijî cûdahîkirina jinan têbikoşe, li dijî rûxandina xwezayê raweste, rê nede mîlîtarîzmê, para kedê bingeh bigire, pêwistîyê bide ked û hilberandinê, bi mebesta ku guhertineke demokratîk pêk bê, ji bo damezrandina rêxistineke demokratîk xwe ferz dike……"*

Ji van hevokan baş tê xuyakirin, ku BDP xwe wekî partîyeke sosyaldemokrat pênas dike û ti hevok di derbarê mafên demokratîk û neteweyî da û herweha di derbarê çareserkirina pirsgirêka bakurê Kurdistanê da, di destpêka bernameyê da cih nagirin.

Lê belê, di bernameyê da beşek di bin sernavê *"Rêya çareserkirina pirsgirêka kurdî bi awayekî demokratîk û aştîyê"* cih digire û çend hevok ji wê beşê; *"Sîstema ku di sedsala 20emîn de li Rojhilata Navîn hat bicihkirin gelek pirsgirêk bi xwe ra anîn. Ji van pirsgirêkan ya here sereke, gelê kurd ku ji gelên qedîm e, di nav vê sîstemê da cih nedît. Birêvebirinên olîgarşîk, otorîter, totalîter û monarşîk ku di serî da Tirkîye, Iraq, Îran û Sûrîye desthilat bûn, hebûna kurdan înkar kirin. Ji ber vê pirsgirêka kurdî li Rojhilata Navîn ya here girîng e û li ber demokratîkbûna herêmê bûye asteng. Dema Tirkîye bibe welatekî demokratîk, ewê li ser demokratîkbûna Rojhilata Navîn karîger be û ew dikane bibe welatekî modelî bona hêrêma Rojhilata Navîn. Ev jî bi çareserîyeke nederbasdar, lê belê bi bingehî pêkan e."*

BDP, çareserkirina pirsgirêka kurdî (kurdan) di sê konaxan da dibîne, *"yek; divê dewlet dest ji şidetê berde û sazîyên ku bi vê armancê hatine damezrandin bêne rakirin. Du, teşhîs û tedawîya xerakirin û rûxandina 25 salan qonaxa duyem e. Avakirina sazûmanek siyasî û îdarî bi rêgezên gerdûnî û dernetewe (ulusüstü) ve guncan qonaxa sêyemin e."*

Di bernameya xwe da BDP, daxwaza ti modelên çareserîyê nake, lê di du salên dawî da daxwaza "statuyeke siyasî" dike, wê jî bi navê "xweserîya demokratîk" pênas dike. Lê çi heye, ku navaroka "xweserîya demokratîk" nehatîye dagirtin, rayagiştî, tenê ji hinek şirove û bawerîyan agahdar dibe. Divê bê dîtin, ku li Tirkîyeyê karûbarê siyasî bona kurdan ne hêsan e. Jixwe, ev xeta siyasî ji destpêkê ve heta îro tûşî çewsandin û zordestîya dewletê hat. Gelek caran helwesta dewletê li dijî zagonên wê bi xwe jî bûye, ango dewletê bi mebesta çewsandin û zordestîyê zagonên xwe jî bin pê kirin. Armanc ji vê, pêşî lê girtina ajdana siyasî ya legal ya bakurê Kurdistanê bû. Li dijî êrişên dewletê, têkoşîna rêxistineke legal ne hêsan bû, lê dewlet jî di karê xwe bi serneket, lewra her çiqasî hemî derî girtibin jî, siyaseteke legal dikane ji gelek derfetên hundirî û navneteweyî sûdê werbigire, dewletê jî nedikanî pêşî lê bigirta, ji ber wê yekê, ji bona dewletê rêya herî hêsan qedexekirina van partîyan bû!.

Di bernameyên herdu partîyên din da, ango di ya HAKPAR û KADEPê da, çarserkirina pirsgirêka bakurê Kurdistanê di sîstema federalî da tê dîtin. HAKPAR di bernameya xwe da bal dikşîne ser sîstema "unîter" û weha dibêje; *"Civakên hemdem, ji bo pêşîlêgirtin û rawestandina jihevbûn û parçebûnê, parvekirina desthilatdarîya fireh digirin, dev ji sîstemên unîter ku tengbûnî, bisînorkirin û zordestîyê bi kar tînin, berdidin. Ew, ji ziman û çandên cûda re ewleyîya qanûnî tînin, di serî de mafê hîndekarîya bi zimanê zikmakî, hemû mafên siyasî û civakî dinasin."*

"Partiya Maf û Azadîyan, ji bo pirsgirêka kurdî li ser heqîyê bighîne çareserîyeke mayende; bi armanca ku mafên demokratîk û azadîyên civakî têxe bin ewleyîya destûra bingehîn û qanûnan, ji bo ji nû ve sazkirina sîstema siyasî û civakî hatîye damezirandin; çareserkirina pirsa kurdî ya bi meyla aştî, demokratîk û wekhevîyê, bi danûstendin û lihevkirina civakî diparêze. Ji bo pêkanîna vê yekê, wê dewletê li ser bingeha wekhevîya gelê kurd û tirk bi şiklekî federalî ji nû ve saz bike. Partîya me wê ji bo pêkanîna vê yekê têbikoşe. Partîya Maf û Azadîyan, dewleta unîter red dike. Derbarê pirsgirêka kurdî de wek prensîb tayînkirina mafê çarenusîyê ya bi destê xwe, dipejirîne. Ji bo çareserkirina pirsgirêkê, ji nû ve sazkirina Tirkîyeyeke demokratîk û federal ya li ser bingeha wekhevîya gelê kurd û tirk, diparêze."

KADEP jî daxwazeke nêzikî HAKPARê dike. Ew jî bi vekirî daxwaza federalîyê dike û di dereke bernameyê da, daxwaz dike ku di nav çarçoveya hiqûqa Rêxistina Neteweyên Yekgirtî da mafên miletê kurd di asta mafê çarenûsî da bê nirxandin. Weha dibêje KADEP; *"Formula partîya me ya çareserîyê: sîstema federal ya azadîperwer, piralî, beşdar, laîk û demokratîk e."* Bona mafê çarenûsî jî bername weha dibêje; *"Li gor şertê Neteweyên Yekbûyî, gel hemû wekhev in (mûsawî ne) û xwedîyên mafê çarenûsî ne. Gelê kurd jî xwedîyê mafê çarenûsîya xwe ye. Lazim e mafên kurdan di vê çarçovê de bê nirxandin."*

Balkêş e, bernameya HAKPAR û KADEPê ji BDPê bêhtir têr û tijî ne û di çespandin û daxwazên xwe da jî pir vekirî ne û daxwaza mafên demokratîk û neteweyî dikin. Lê her çiqasî herdu partîyan ji êriş û bêzagonîya dewletê para xwe stendibin jî, ev, bi zordarî û êrişên li ser BDPê ve nayên raberîhevkirin, lewra bi rastî BDPê di bin zexteke bêhempa da ye. Eger em li dîroka xwe binêrin, em ê binasên (sebeb) siyaseta dewletê bibînin. Komara Tirkîyê di umrê xweyî nod salî da, mafên miletê kurd herdem bona xwe xetereke stratejîk dîtiye. Di vî nod salî da kurdan jî, dest ji daxwazên xwe bernedane. Herdem dewletê, ewil ajotîye ser kes, an grûpên bihêz û rêxistinî. Dema ew dane alîyekî vêcarê dor hatîye yên din. Bi hezaran kes, malbatên ku alîkarîya dewletê kirine hene, lê paşê ew jî ketine ber çerxa zordestîya dewletê. Weha dixuye ku ev siyaset îro jî tê bi kar anîn.

Êriş û zordestîya dewletê ya dijî kulvara siyasî, ku bi damezrandina HEPê dest pê kir, divê li her hêlê ve li ser bê sekinandin. Dewletê, bi hemî derfetên xwe êriş dikir. Hemî derfet bi kar tanîn, taybetî têkilî herêmên peywendîdar dibû, ku ev siyaset bi hêz nebe. Ewil hewl da ku aj nede, paşê nekanibû pêşîya ajdana wê bigire, vê carê hewl da ku bi hêz nebe, di asteke ku kanibe kontrol bike da bimîne. Bi vê mebestê hemî peywendîyên xwe bi kar anî. Hewl da ku li ser kesên hê peywendiyên wan a bi sistemê ve qut nebûne karîger be/bû jî û ew, ji pêvajoyê dûr ketin.

Dixwazim anekdoteke balkêş vebêjim. Piştî qetilkirina **Vedat Aydin**, hinek kadroyên bilind şok bûn, ew ne li benda êrişeke weha hovane bûn. Piştî hilbijartina 1991ê rojekê em li ser vegera parlementeran bona partîyê diaxifîn, serokê partîyê Fehmî İşiklar got; *"hevalno, heta îro ez di ber mexdûran da têkoşîyam, lê gelê kurd him mexdûr û him jî mezlûm e. Ev bona min giran e û ji hêza min der e, li min biborin"* jixwe careke din jî venegerîya partîyê.

Bi ya dewletê, bi qedexekirinê ve him siyaseta bakurî dê lawaz bibe û him jî, derz dê bikeve nav hêzên pêşeng û cihêbûn dê biqewime! Her qedexeyê şopa xwe berda û hinek grup jê qetîyan, lê encam ne wekî dewletê hêvî dikir derket. Pirsek hê jî giringîya xwe diparêze, gelo eger ew qedexekirin nebûna, ev êriş nebûna hêza sîyasî ya bakurê Kurdistanê, dê ji ya îro xurttir bibûya, an lawaztir?
Taybetmendîyeke siyaseta bakurê Kurdistanê heye divê li vira mirov wê vekirî bêje. Ked û bedelên ku hatin dayîn, hinek mafên ku wek "destketî" têne dîtin ve nayên raberîhev kirin. Lewra bi sedan kadroyên vê kevneşopîya siyasî hatin kuştin, çendîn car navenda giştî û lijneyên partîyê di encama êrişên hêzên milîter da hatin rûxandin, asta ku îro gehêştiye li ber çavan e.

Wekî hat gotin, ev kulvara siyasî bi qurbanîya hezaran kesan, bi keda deh hezaran kesî gihîşte roja îro. Gelo mirov dikane bêje ku ev kulvar, ango BDP, HAKPAR, KADEP pirranîya gelê bakurê Kurdistanê temsil dikin? Û mirov çawa dikane temsîlîyeke weha bipîve?

Bona partîyeke legal pîvana temsîlîyê herî tê zanîn û aşîkar, hilbijartinên ku di şert û mercên demokratîk da encam dane ne. Ango, ewil, divê bi rastî şert û mercên demokratîk hebin, hilbijartin ne di bin gef û çavtirsandinê da, berevajî di bin banê atmosfereke demokratîk da encam dabin. Û ya herî girîng, zagonên têkilên mijarê, ango zagona partîyan, zagona hilbijartinê divê ji kemîn û astengan hatibin paqijkirin û demokratîk bin.

Eger mirov ji vê hêlê da li ser mijarê raweste, ewil zagonên Tirkîyeyê, ne demokratîk in. Taybetî Zagona Partîyan û ya hilbijartinê bi gelek astengan ve hatîye dagirtin ku hemî li pêşîya siyaseta Kurdistanî dibin asteng. Xetera herî tê zanîn benda hilbijartinê ye, ku ev bend %10 e. Li hêlekê têkoşîneke çekdar û li dijî vê dewleteke endamê NATOyê ku hemî derfetên xwe yên eskerî bi kar tîne, li hêla din asteng û qedexeyên di zagonan da û çewsandin û êrişên dewlet û derdorên nijadperest, hemî asteng û xeterên li ber siyaseta legal ya bakurê Kurdistanê ne, taybetî BDPê. Li hemberî van êriş û astengan têbikoşe û di hilbijartinê da bi serkeve, divê bê qebûl kirin ku ne hêsan e. Kesên ku ketibin nav karûbarê siyaseteke weha dê vê rastîyê zanibin.

Ji ber van sedeman e, ku partîyên berî BDPê çend caran bi navê partîyê beşdarê hilbijartinan bûn, lê ji benda hilbijartinê derbas nekirin. Di hilbijatina dawî ya sala 2011ê û ya berî wê da bi berbijarên serbixwe beşdarî hilbijartina bû. Di ya 2011ê da hevgirtineke (îtîfaq) berfireh hûnandin, KADEPê di nav da cih girt û HAKPARê piştevanî kir. Di encama hilbijartina 2011ê da serketineke berbiçav bi dest ket, ev serketin, taybetî di hêrêma rojhilatê bakurê Kurdistanê da şayanê balkêşîyê ye.

Helbet mirov encamên hilbijartinê wekî ku partî di bin navê xwe da beşdarê hilbijartinê bûbe nebîne, lê dîsa jî encamên vê hilbijatinê ramanekê dide mirovî. Eger, em encamên hilbijartinê yên li bajarên herêma bakurê Kurdistanê bidin ber hev, mirov dikane hinek rastîyan bibîne.

Wekî tê zanîn çar partîyên ku îro di parlementoya Tirkîyeyê da grûpên wan hene, raberî kirina dengên van li herêma bakurê Kurdistanê girîng e. Ji vana yek, partîya nijadperestên tirk e (MHP) jixwe li herêma Kurdistanê ne xwedî hêzeke ku hewce ye mirov li ser raweste. Tenê li bajarên di sînorê bakurê Kurdistanê û Tirkîyê da, daku ev şerîda ku ji bajarê Kilîsê dest pê dike heta Ezirganê dajo, kurd û tirk di nav hev da nîştecih in û herweha di vê herêmê da giranîya gelê elewî ku rêjeyeke gelek mezin elewîyên kurd in, him partîya nijadperest ji tirkên vê herêmê û partîya CHPê jî ji girseya elewî deng distîne. Tenê li Dêrsimê taybetmendîyeke xwe heye, ku li vî bajarî ji berê va CHP pirranîya dengan stendîye. Dîsa jî di hilbijartina berî vê da, ji Dêrsimê endamê BDPê, berbijarê serbixwe hatibû hilbijartin, herweha îro şaredarî jî di destê BDPê da ye.

Helbet ev encam girîng in, li hinek bajarên herêma Kurdistanê BDP bi hêz e û yekem partî ye, lê li hinek bajarên din di dora dudîyan da ye û li hinekên din jî lawaz e. Helbet BDP bi berbijarên serbixwe beşdarî hilbijartinê bibû, eger di bin navê xwe da beşdar bibûya dê encamek çawa bi destxbixista, ev pirseke bi serê xwe girîng e. Lê, li hemberî vê pirsê divê em ji rastîya hebûna benda hilbijartinê jî haydar bin.

Bi ya gellek kesan eger benda hilbijartinê nebe, BDP dê nêzikî % 8 deng bistîne, ku ji 50î bêtir parlementer dê bidestkevin. Bi ya van derdoran, ji ber ku bend heye, gel dengê xwe dide partîyên din.

BAJAR	BDP		AK PARTI	
Semsûr (Adiyaman)	%6,5	19 811	%67,38	205 219
Agirî (Ağri)	%41,02	82 996	%47,54	96 189
Erdexan (Ardahan)	%12,32	6 971	%40,42	22 754
Êlih (Batman)	%51,84	113 993	%36,91	81 151
Çewlig (Bingöl)	%24,0	30 237	%67,06	84 506
Bidlîs (Bitlis)	%26,06	37 995	%50,62	73 785
Amed (Diyarbakir)	%58,72	411 232	%32,88	230 213
Elezîz (Elaziğ)	--	--	%67,39	212 671
Ezirgan (Erzincan)	--	--	%57,39	73 800
Erzerom	%8,16	33 308	%69,25	252 745
Entap (G. Antep)	%5,08	42 670	%61,85	519 179
Culemêrg (Hakkari)	%79,88	94 660	%16,42	19 465
Îdir (İğdir)	%31,53	25 437	%34,09	27 502
Kilîs (Kilis)	--	--	%59,50	38 823
Qers (Kars)	%19,29	27 620	%42,57	60 959
Meletî (Malatya)	%1,08	4 609	%68,48	293 543
Mêrdîn (Mardin)	%52,12	168 734	%32,04	103 723
Mûş	%44,79	75 885	%42,86	73 114
Sêrt (Sirt)	%42,79	51 577	%48,09	57 963
Ruha (Urfa)	%17,13	119 879	%64,80	453 390
Şernex (Şirnak)	%72,79	125 282	%20,64	35 582
Dêrsim (Tunceli)	%22,96	10 347	%16,23	7 314
Wan (Van)	%48,70	208 355	%40,18	171 067

Bona ku ramanekê bide ezê encamên hilbijartina 2011ê ya BDPê û AKPê bidim berhev, ku mirov kanibe raberî hev bike.

Partiya nijadperest MHP ji çar bajarên Kurdistanê ji %10 zêdetir deng stendiye. Ji van bajaran, ji Ezeromê %13,3, Îdirê %34,0 ku parlementerek bi dest xistiye, ji Qersê %17,2, ji Kilîsê %20,90 deng stendiye. Eger we bala xwe dayê, Îdir, Qers û Kilîs balê dikşînin. Li van hersê bajaran hindikayîyên (eqelîyet) din jî dijîn û di sînorê Kurdistanê da cih digirin. Li Îdir û Qersê nîştecihbûna serjimara gelê azerî û tirk balê dikişîne. Herweha li Kilîsê tirk û ereb hene. Li bajarên din yên Kurdistanê rêjeya vê partiyê %10 kêmtir e, ne şayanê li ser bê rawestandin.

Partîya Komara Gel jî (CHP) tenê li Dêrsimê bûye partîya yekem û herdu parlementerên vî bajarî bi dest xistiye. Li Qersê %16,05, Elezîzê %13,1, Semsûrê %16,5, Erdexanê %29,8, Ezirganê %30,2, Entapê %19,4, Kilîsê %15,2, Meletîyê %19,6, Dêrsimê %56,2 deng stendiye û li bajarên din yên herêma Kurdistanê, rêjeya dengên vê partîyê ne şayanê gotinê ye.

Ji van 23 bajarên hêrêma bakurê Kurdistanê li 15an AKP, li heftan BDP, li yekê jî CHP partîya yekem e. 110 parlementerên hêrêma Kurdistanê hene, ji vana 68 AKPê, 31 BDPê, 7 CHPê û 4 jî MHPê bi dest xistine.

Ji encamên jorî dixuye, ku li seranserê bakurê Kurdistanê ne BDP, AKP yekem e. BDPê %28,99 û 1 654 361 deng, AKPê jî %47,15 û 3 194 657 deng bi dest xistine.

Lê belê, li herêma Rojhilatê Bakur tablo tê guhertin. Li bajarên Agirê, Îdir, Wan, Culemêrg, Şernex, Mêrdîn, Îluh, Mûş, Amed û Sêrtê BDPê bi rêjeya %52,42, AKPê jî bi rêjeya %35,16 deng bi dest xistine. Ferqek gelekî balkêş tê dîtin. Weha dixuye ku eger BDP di bin navê partîyê da beşdarî hilbijartinê bibe ewê ji vê bêtir deng bi dest xe û di vê herêmê da, pirsa temsîlîya siyasî nemaye.

Belê reqem weha dibêjin, ligel ku têkoşîneke çekdar didome û her roj xeter li ser kes û karên Kurdistanî heye, ev serketina BDPê destketineke berbiçav e. Helbet ev encama keda hevgirtina BDP, KADEP, sazîyên civakî yên sivîl û piştevanîya HAKPARê ye. Belê, di sê koşeya nexşeya bakurê Kurdistanê da pirsgirêka temsîlîya siyasî nemaye, lê erdnîgarîya Bakur ji vê gelekî firehtir e û li seranserê Bakur AKP li pêş e

Ev tablo rastîyekê dide ber me, ku divê armanca têkoşîna bakurê Kurdistanê ne tenê di sê koşeya bakur da, li seranserê bakurê Kurdistanê pirsa temsîlîyê çareser bike û vê keysê ji destê dewletê bigire. Bona vê stratejîyeke siyasî ya demdirêj divê. Têkoşîna çekdar ev mesele heta derekê anî, kurd ti caran wekî ku dewlet-hikûmet dibêje dê dest ji çekan bernedin, lê divê têkoşîna demokratîk bêhtir derkeve pêş û bê bilindkirin. Kadroyên partîyê, civaka sivîl bi vê armancê divê ji îro bêhtir kedê bidin. Bila ji bîrê dernekeve, roja ku pirsa temsîlîya siyasî li seranserê Kurdistanê bi dest ket, encamên hilbijartinê an, rapirsinê nîşan da ku pirranîya gelê bakurê Kurdistanê deng didin partîyên Kurdistanî, ti hêz nikanin li ber çareserkirinê rawestin.

Dewlet jî vê rastîyê dizane, ji ber vê ye ku ji sala 2009ê ve bi navê operasyonên KCKê dest bi çewsandin û çavtirsandinê kirîye, bi hezaran kes hatine derdest kirin û radest kirin. Her kes baş dizane ku kesên hatin girtin, ne di nav têkoşîna çekdarî da bûn, endamên BDPê an dengdêrên wê ne. Dibe ku di nav sîstema KCKê da cih jî girtibin, lê bi encam karê xwe bi rêbazên demokratîk meşandine. Ne îro, ji berê ve tê zanîn ku girseya piştevanîya PKKê dike, ango heman girse dengê xwe dide BDPê û pirranîya girseyê endamê partîyê ne. Wekî li jor jî me vegot, armanca dewletê qelskirina hêza siyasîya legal e, lewra rêjeya dengan bilind dibe û dewlet ji vê dibize.

Bi van operasyonan armanceke dewlet-hikûmetê jî ev e, ku dixwaze vîna (îrade) têkoşîn û bizava siyasî ya bakurê Kurdistanê bişkêne. Ew dixwaze, bila kes û kadro bipaşve gav bavêjin, bawerîya wan bê şikandin. Weha dixuye, ku her kî dengê xwe derdêxe, roja din zutirkê desteyek polîs û panzer li ber derî ne. Derdest kirin, avêtina ser malan ji pîvan û nirxên demokratîk û mirovahîyê gelekî der e û ev lebat bi zanayî tê kirin.

Lê eger rayedarên tirk li bîst salên bihorî binêrin, dê bibînin ku operasyon, çewsandin û zordarî, wekî ku hêvî dikin encam nadin.

* Nivîskar, kevneparlamenter

www.lemondekurdi.com

◂ Dîyaspora, koçberî û transkoçberîya kurd (Dewama rûpela 1)

herdu şerên Kendavê yên 1991 û 1992yê (Middle East Watch Report: Human Rights Watch 1993) û şerê eşkere yê eskerî yê bi Partîya Karkerên Kurdistanê (PKK) re, pêre elaqedar îlana rewşa awarte li herêmên kurdan, rê li ber vekirin ku ji van herêman xelk hem bi awayê eşkere û hem jî nepenî van çil salên dawîyê bireve (Kizilhan, 2004). Mirovên ji wan re tê gotin damezrînerên tevgera kurd li derveyî welêt, xwendekar û întelektuel ji tevahîya parçeyên Kurdistanê hatin [Ewropâyê], di nava wan de berpirsîyarên payebilind ên partî û rêxistinên kurd jî hebûn, û ji bo kurdên li Ewropayê bûn teşwîqên girîng ên çandî, sîyasî û civakî (Kizilhan, 2006, 2008).

Di çarçoveya anîna karkerên mêvan di salên 60î ên sedsala 20ê de û piştî dawîanîna li anîna karkerên mêvan sala 1973yê di çarçoveya yekkirina malbatê de pirranîya kurdên îro li Almanya dimînin ji Tirkîyeyê hatin Ewropayê. Karkerên pêşî hê di salên 50î de hatibûn, yekemîn peymana fermî ya ji bo anîna karkerên mêvan di navbera Tirkîyeyê û Komara Federal a Almanyayê de sala 1961ê hat mohrkirin. Ji nîvê salên 60î û pêve Hollenda, Belçîka, Fransa, Danîmarka û Swêdê jî her çû bêhtir karkerên mêvan dan anîn; koçberî zêde bû (Scheikhmous, 1993; Kizilhan, 2005).

Ji sala 1965ê û pêve avahîya koçberên kurd bi anîna karkerên mêvan re ji binî ve guherî. Hê di destpêka salên 1970yî de hejmara karkerên kurd ên ji Tirkîyeyê ji hejmara xwendekaran qat bi qat zêdetir bû (Ammann, 1997). Di qada gelemperîyê de karkerên mêvan ên kurd pirr kêm weke komeke bi serê xwe dihatin dîtin. Ji ber pasaporta tirk weke welatîyên Tirkîyeyê heta di warê etnîk de jî weke tirk hatin danasîn. Ev yek ji bo kurdên ji deverên din jî wisa bû, yên ji Iraqê, yên ji Îranê yan jî Sûrîyê.

Tevgera rizgarîya kurd a li Iraqa roja me ya îro carinan di çarçoveya pirsgirêkên li Iraqê yan jî dîktatorîya Sedam de hat dîtin. Hê nû piştî şer û pirsgirêkên mezin ên sîyasî, aborî û neteweyî li Tirkîyeyê û pêre reva mirovan a ji Tirkîyeyê di salên 80yî de rê li ber guhertina fikr[a li ser kurdan] vekir. Ji dawîya salên 70yî ve kurd xwe disipêrin bawerîya xwe ya sîyasî û pena xwe digihînin Ewropayê. Li vir jî bipêşketineke ji bo tevahîya herêmên kurd li wan dimînin eşkere ye, ji koçberîya ferdan heta bi malbatên mezin. Li vir herweha pêwîst e mirov îşaret pê bike ku koçberî hem ji ber cudakarî û zilmê, hem jî ji ber sedemên aborî û rewşa bêistîqrar a herêmên kurdan pêk tê. Ev meyl îro jî dikare were dîtin. Dema ku mirov koçberîya kurdan di nava dewletan de a ber bi bajarên mîna Stenbol, Enqere, Edene, Bexda, Tehran, Şam û hwd. û ya civakên kurd a li Yekîtîya Sovyetê ya berê û hin welatên Asyayê jî li ber çavan bigire, koçberî û reva [ji ber zilmê] gihiştin asta hicreta miletekî.

Ji dema hilweşîna rejîma Sedam û vir ve li Iraqê kurd xwedîyê hukûmeteke herêmî ya xweser in ku herweha weke Herêma Federe ya Kurdistanê jî tê binavkirin. Tevî vê bipêşketina erênî jî şîddeta rêxistinên terorîst aştîyeke bi rastî neanîn û bûn sedema pêleke din a koçberîya kurdan ber bi Ewropayê ve û ji deryayê û wêde.

Ji dema jihevdeketina Yekîtîya Sovyetê û vir ve jî hejmara kurdên ji van herêman ên ku di dema Şerê Cîhanê yê Yekemîn de û piştî şerî di serî de Ermenîstan koçberî welatên cîran bûbûn û niha li Ewropayê li starê digerin jî zêde dibe.

Bi vî rengî kurdên li Ewropayê li komên cihê dabeş dibin ku me di tabloya 1ê de nîşan daye:

Koçberî yan jî Dîyaspora?

Di van salên dawîyê de her diçe bêhtir li Ewropa belê herweha li Kurdistanê rola Kurdên li derveyî welatê xwe tê guftûgokirin û peyvên mîna koçberî û dîyasporayê li gorî îdeolojî, berjewendî û sedemên cuda tên nirxandin. Bi vê gotara kurt hez dikim ji alîyê civakî-sîyasî û derûnî ve beşdarî vê guftûgoya girîng bibim.

Koçberî, koçberîya ji welatê xwe, koçberîya ber bi welatekî din ve

Peyva koçberî bi rengekî asayî ji bo tevahîya awayên cihê yên tevgerên cihguhertinê yên mirovan weke sernavekî tê bikaranîn. Ango kom û ferdên bi dilê xwe yan jî bi darê zorê ji welatê xwe veqetîyabin hemû weke koçber tên binavkirin. Sedemên koçberîyên bi vî awayî dikarin cihêreng bin. Para bêhtir sedem sîyasî, dînî, aborî yan jî hawîrdorî ye.

Pispor behsa du kompleksên sedeman dikin ku dibin sedema tevgerên cihûwarguhertina mirovan. Li alîyekî sedemên ku weke hêzên dafder (push factors) tên binavkirin hene, li alîyê din hêzên cazîbeyê (pull factors) hene. Di sedemên dafder de şert û mercên jîyanê li welêt ewqasî zextdar, zehmet, bi tehlûke û/yan jî ji bo jîyanê bi tehlûke tê hîskirin ku mirov hewl didin xwe ji vê xilas bikin. Ev hêzên dafder dikarin ev bin: karesatên xwezayî, kêmbûna erdê, bêkarî (herweha xizanî), cudakarîya civakî (weke mînak ya li dijî hindikahîyên dînî û etnîk), şerên navxweyî, yan jî şerên di navbera dewletan de, darbeyên eskerî yan jî şoreş (ên ku ji bo komên hilgir yan jî alîgir ên rejîma hilweşandî tehlûke ne), zilm û zora sîyasî (şîddeta yekser) yan jî zora şert û mercan ("şîddeta strukturel"), silbûn/xerîbbûna subjektîf û dilêşî (Nuscheler,1995).

Faktorên cazîbeyê berevajîyê van in. Hingê mirov şert û mercên jîyanê li welatê dixwazin biçinê ewqasî rehet û hêjayî xwegihandinê dibînin ku ji welatê xwe vediqetin da ku xwe bigihînin vê sûdewarîyê. Li vir mijar weke mînak ewlekarîya ferdî, îstîxdam, dewlemendîya maddî, azadîya sîyasî û herwekî din e. Hêzên dafder û yên cazîbeyê êdî pirr kêm caran bi serê xwe û bi tenê hene. Berevajîyê ve ew her diçe zêdetir bi hev re û xwedî hêzeke ne-wek-hev xwe didin der; ev yek nexasim ji bo Kurdên ji herêmên cihê (Iraq, Îran, Sûrî, Tirkîye û komên kurdan ji Yekîtîya Sovyetî ya berê) wisa ye. Peyvên *koçberî* û *revê* pirr caran weke hev tên dîtin.

Li gorî Sazîya Federal a Koçberî û Penaberan li Almanyayê, dema kesek mekanê navenda jîyana xwe diguhere ya diqewime koçberî ye. Dema ku ev koçberî ji sînorên dewletan dibihure behsa koçberîya navneteweyî tê kirin (BAMF, 2006). *Koçberîya navxweyî* jî ew e ku mekan ji cihekî ber bi cihekî din ve were guhertin û ev di nava sînorên dewletekê de biqewime.

Peyvên *koçberîya ji welatê xwe (emîgrasyon)/koçberîya ber welatekî din ve (îmîgrasyon)* jî di nava lîteratura pisporan de tên guftûgokirin û ya rastî maneya wan û *koçberîyê* weke hev e, mekanguhertineke zelal e ji welatekî yan jî herêmeke dîyar ber bi civakeke vedihewîne ya nû ve. Ango koçberîya ji bo kar a bi armanca guhertina welêt a demdirêj a ferdî yan jî malbatî ya di ser tevneke koçberî organîzekirî de ye da ku destketîyên xwe û tedbîrên hebûna xwe misoger bike (Pries, 2010). Dema ku em ji nêz ve li rewşa kurdan binêrin, hingê em dibînin ku kurdên bawerîyên cihê (sunî, şiî, elewî, êzdî, yaresan), ji cihûwarên kurdan lê belê ji dewletên cihê (Tirkîye, Iraq, Îran û Sûrî), kurdên ji koçberîya li hundirê dewletekê (Stenbol, Tehran, Şam û hwd.), kurdên dîyasporayê weke mînak yên ji herêmên Qafqasyayê û kurdên di demên cihê de û ji ber sedemên cihê koçber bûne, mijara me ne. Beşa herî mezin a koçberên kurd ji wan kesan pêk tê ku ji bo li kar bigerin salên 60î ji Tirkîyeyê hatin Ewropayê. Piştî bêhtirî çil salan mirov dikare bibêje ku vê komê biryara guhertina cihûwarê xwe ji bo dema dirêj daye û dixwaze li koçberîyê êdî bi çar nifşan bijî. Nexasim komên dînî û bi awayekî qismî yên civakî yên mîna êzdîyan, asûrîyên xirîstîyan, ermenî û beşek ji elewîyên kurd ên ji herêmên kurd ên Tirkîyeyê ne, [dîyar e] biryar dane ku dixwazin demdirêj li welatê hatinê bimînin. Amadebûna ji koçberîyê û întegrasyonê re ji bilî biryara daxwaza mana demdirêj, di başbûna li qada perwerdeyî, pîşeyî, jêhatîbûna çandî û civakî û qebûlkirina zimanê welatê lê dimînin weke zimanê yekemîn û hwd. de xwe jî dide der.

Pirranîya kurdên ji ber sedemên aborî Kurdistan terikandin, û herweha welat û aborîya welatê hatinê wisa difikirîn ku wê piştî demeke dîyar vegerin welatê xwe; ev bi pirranî ji wê komê ne ku em dikarin weke koçberan bi nav bikin. Beşeke piçûk bû *koçberên berepaş*, ango vegerîya Kurdistanê. Lê belê ji ber rewşa sîyasî, aborî, şer yan jî weke şer veger para bêhtir hat astengkirin. Bi ser de jî çawa ku berîya niha jî behsa wê hat kirin hejmara penaberên ji herêmên kurdan zêde bû.

Weke xulaseyeke pêşî mirov dikare tesbît bike ku pirranîya kurdên karker ên ku ji wan re "karkerên mêvan" tê gotin, bûn koçberên ji welatê xwe hatî û li hundirê welatekî din bicihbûyî [îmîgrant]. Li gorî texmînên bi îtîna qederê 1.2 heta bi 1.4 milyon kurdên karker li Ewropa hene. Mirov kurdên penaber ji hemû alîyên Kurdistanê û ji Yekîtîya Sovyetê ya berê jî lê zêde bike hingê hejmara kurdên li Ewropayê dimînin qederê 1.8 milyon û 2 milyonan e. Em herweha wisa qebûl dikin ku li derveyî Kurdistanê qederê 10 ta 14 milyon kurdî (di nava vê hejmarê de kurdên bajarên mezin ên tirk, fars û ereban yên weke Stenbol, Tehran û Şamê jî hene) dimînin.

Dîyasporaya kurd

Mirov dikare koçberîya kurdan weke ya komeke dîyasporayê binirxîne heke ev kurd weke mînak ji ber sedemên dînî yan jî sîyasî ji rêxistin û tevnên xwe yên li welatê xwe veqetîyabin û wan qadên civakî û tevnên li welatê hatinê kiribin navenda jîyana xwe. Di nava van de weke mînak birêveberên sîyasî hene ku ji bo xebata xwe ya sîyasî di nava tevnên ji wan re yên kurdî tê gotin çalak in. Xebata sîyasî bi giranî li ser bûyerên li Kurdistanê ye û pirr kêm bi xebata koçberîyê ya civaka kurd a li xerîbistanê elaqedar dibe. Ev yek ji bo wan kesan jî bi vîn rengî ye ku ji ber sedemên dînî revîyane û li welatê hatinê bi tenê heta radeyeke dîyar di warê civakî, çandî, aborî û sîyasî de întegreyî civaka hatine navê bûne. Ev kes û komên wan ên ku mohrên dînî, sîyasî, civakî, çandî yan jî aborî li ser wan daîmî pêwendîyeke xurt a civakî-çandî bi Kurdistanê re û bi "rêxistina wê ya navendê" ya transnasyonal re diparêzin, weke mînak bi Partîya Karkerên Kurdistanê (PKK) re ku li seranserê dinyayê bi awayekî transnasyonal rêxistinbûyî ye. Em bi awayekî din bibêjin, çalakgerên PKKê, alîgirên wê yên ji nêz ve û rêxistinên wan dikarin weke civakeke dîyasporayê werin nirxandin. Erê *koçberên li welatê nû bicihbûyî (îmîgrant)* yên kurd mekanê xwe yê civakî-çandî bi cihûwarê xwe yê cografî re – çiqasî hê gav bi gav pêk were di nava van çil salên dawîyê de û ji ber demên koçberîyê yên cihê û sedemên wê yên cihê dereng mabe jî – li hev tînin, lê belê xisleta dîyasporaya kurd bi xwe jî ew e ku welatê hatîyê daimî weke xerîbîstanê dibîne û bi awayekî xurt berê wê li welatê wê ye (bigire li ber Pries, 2000). Ev rengê dîyasporayê nabe ku illeh weke tehlûkeyekê yan jî "civakeke li dijî întegrasyonê" were dîtin. Ew dikarin xwe li gorî avahîyên li welatê hatinê eyar bikin û weke mînak ji perwerde, çand û aborîyê sûdê wergirin, lê belê haya wan ji xerîbbûna wan heye û hewl didin vê cihêtîyê li ser pîyan bigirin. Di rewşa normal de kurdên ku di salên 60î de ji ber sedemên aborî yan jî ji bo xwendinê koçber bûn û li welatê hatinê bi cihûwar bûn, kêm dikevin nava vî şêwazê koçberîyê. Mirovên ku ji ber sedemên weke fikra sîyasî, girtîgeh, rev, ji cihûwar kirina bi darê zorê ji Kurdistanê veqetîyan bêhtir dikarin di nava koma dîyasporayê de werin hesibandin. Dibe ku asta bi dil terikandina welêt bi roleke girîng radibe. Gelek kurd ji bo ku sax bimînin neçar bûn welatê xwe li cih bihêlin û hê jî bi hestên xwe bi awayekî xurt girêdayî welatê xwe ne; ev hest jî zêdetir dibin ji ber zilm û zorê, redkirina mafên kurdan ên azadîyê, demokrasîyê û dîyarkirina çarenûsa xwe li welatê jê tên. Tevnên dîyasporayê vê rewşê bi çalakîyên xwe yên global û cihî bi kar tînin da ku kurdan bikin alîgirên xwe. Bêguman divê mirov li vir bi awayekî rexnegir îşaret pê bike ku cihêtîyeke zelal di pratîkê de zehmet e, lewra weke mînak koma ku bi tevahî ji ber sedemên aborî ji bo kar koçber bûye jî timî herweha faktorên etnîk, sîyasî, dînî û çandî hem roja me ya îro û hem jî di rabihurîyê de bûne xwedî rolek. Li vir berîya her tiştî xuya ye piştî koçberîyê çarçoveya hêvîyan û ya pêşketinê di serdema globalbûyîna her tiştî digire nav xwe de grîng dibe.

Ji transkoçberîya li nava welatekî ber bi transkoçberîyê ve

Di serdema globalbûna çandî, civakî, sîyasî û aborî de lê belê her weha ji ber ezmûna xurt a koçberîyê bi 12 milyon kurdên koçber li seranserê dinyayê û tevnên wan xuya ye şewazekî Transkoçberîyê (Pries, 1998) pêk hatîye. Li gorî Pries (1998) xisleta transkoçberan ew e ku guhertina cihûwar li welatên cihê ji bo wan ne bûyereke carekê [bi tene] diqewime ye, ji bo wan ev rewşa asayî ye. Dema mirov kurdan ji nêz ve bişopîne, dikare di nava malbateke mezin de jî bibîne ku li welatên cihê yên Rojhilatê Navîn (weke mînak Iraq û Tirkîye) lê belê li seranserê dinyayê ji hev belav bûne û dîsa jî xwe weke kolektîf dibînin (weke mînak beşek li Swêde, Almanya û beşeke din li DYA yan jî Ingilîstanê dimînin). Em dikarin rewşeke dişibe vê di nava koçberîya li nava sînorên dewleteke netewe de jî bibînin, weke mînak beşek ji malbatan li Stenbolê, Izmîrê û beşa din li Dersimê dimînin. Ev *transkoçberîya li nava welatekî* ji ber dîroka wan a bi êş û azar e, ya ku hê di serdema împeratorîyên osmanî û pers de bi serê kurdan de hat. Bi vî awayî piştî Peymana Qesrî-Şîrînê a 17ê gulana 1639ê hat mohrkirin herêmên kurdan di nava împeratorîyên osmanî û pers de hatin parçekirin, paşê jî piştî Şerê Cîhanê yê Yekemîn parçekirina îro em pê dizanin ya di navbera dewletên Sûrî, Iraq, Îran û Tirkîyeyê de pêk hat (Finkel, 2006). Ango kurd di nava van împeratorîyan û herweha di nava sînorên nû yên dewletan de direvîyan yan jî li qadên jîyanê yên nû û ewle di nava sînorên her dewletekê ji van de digerîyan.

Ji ber guherîna nû ya sîyasî û aborî li dinyayê ji bo kurdan jî qada tevahîya jîyanê di navbera cihên cuda de ji sînorên dewletan wêdetir çû. Pêwendîya di navbera herêma koçber jê hatî û yê çûyê bi avakirina qadên ji wan re *qadên civakî yên transnasyonal* tê gotin ji bo dema dirêj bi gewde dibe (Pries 2010).

Ev transkoçberîya nû ya li kurdan diqewime, bi ezmûna ferdî û kolektîf a koçberîyê, belê herweha bi bandora faktorên ji derve yên sîyasî, aborî, civakî û çandî (demokratîkbûn, azadbûn û hwd.) girêdayî hêmanên nasnameyî û avahîya civakî yên herêma jê tên û herêma hatinê, pêk tê (Pries, 1996; Ong et al., 1997; Smith et al., 1999; Pries, 2001, Kizilhan, 2008).

Xulaseya encamê

Koçberên kurd wê bi nifşên paşê re bêhtir rengê transkoçberan bigirin. Heke mirov texmîneke bi dîqet bike, dikare li bendê be ku beşeke mezin a dîyasporaya kurd reng biguhere, bibe şewazê koçber û paşê jî transkoçberîyê. Lê dîyar e, girêdayî pêşketin û bûyerên sîyasî, civakî, aborî û çandî yên li Kurdistanê, timî şêwazekî dîyasporayeke kurd wê hebe. Ev yek herweha elaqedarî asta vebûna li civaka tên navê, pêşketina strukturel, armanc û hejmara endamên van tevnan (dînî, sîyasî, çandî û hwd.) ên koçber û ên li Kurdistanê ye. Pêvajoyên demokratîk, qebûlkirina kurdan weke komeke xweser a xwedî mafên xwe yên çandî û sîyasî wê gelekî bi kêra koçberî, transkoçberî û pêre jî întegrasyona kurdan werin.

Ev pirsgirêkên koçberîya kurd bi tenê weke destpêkekê hatin ravekirin û divê li qonaxên makro û mîkro têkildarî pêşketinên komên cihê li tevahîya beşên Kurdistanê ji nêz ve werin lêkolan.

Tîpolojîyên Koçberîyê	Pêwendîya wan bi welatê wan re	Pêwendîya wan bi welatê nû hatinê re	Sedemên Koçberîyê
Xwendekar	Veqetîn, Xatirxwestin, Berê wan li welatê wan e	Ambîvalent e/bêhtir vekirî ye	Aborî, Rêxistinî / Perwerde
Koçberên Karî	Veqetîn, Ji dest dan, Xatirxwestin	Ji bo dema dirêj întegrasyon / welatê nû	Aborî / Civakî –çandî
Yekkirina malbatan	Veqetîn, Ji dest dan, Xatirxwestin	Ji bo dema dirêj întegrasyon / welatê nû	Aborî / Civakî –çandî
Penaber	Ji dest dan, Trawma, Berê wan li welatê wan e	Pirsgirêkên mayînê / Barê ji heqî nehatî derketin ê ji welêt, xerîbbûn, hwd.	Dînî/Siyasî/ Rêxistinî
Yên din (karsaz, mayînên xwe disipêrin projeyan, hwd.	Berê wan li welatê wan e	Mayîna wan xwe disipêre projeyekê	Aborî, çandî, rêxistinî
Civakîbûnên cihêreng/Dîn û Welatê jê tên (weke mînak Sunî, Şiî, Elewî, Êzîdî ji Ermenîstan, Gurcistan, Iraq, Îran, Sûrî, Tirkîye, hwd.)			

Çavkanî

Adorno, T.W. (1977). Was bedeutet: Aufarbeitung der Vergangenheit? / Maneya wê çi ye: jiheqderketina rabuhurîyê? Di: Erziehung zur Mündigkeit/Perwerdekirina ber bi Reşîdbûnê ve, Frankfurt.

Amman, Birgit: Ethnische Identität am Beispiel kurdischer Migration in Europa / Nasnameya etnîk li gorî mînaka koçberîya kurd li Ewropayê. Di: Kurdologie –Ethnizität, Nationalismus, Religion und Politik in Kurdistan / Kurolojî – Etnîzîte, Neteweperestî, Dîn û Sîyaset li kurdistanê, Münster 1997, rûpel 217-238.

Bundesamt für Migration und Flüchtlinge (2006). http://www.bamf.de/ SharedDocs/ Anlagen/ DE/Publikationen/Migrationsberichte/

Cohen, R. (1997). Global Diasporas. An Introduction / Dîyasporayên Global. Despêkek. Seattle, University of Washington Press.

Finkel, C. (2006). Osman's Dream: The Story of the Ottoman Empire 1300–1923 / Xewna Osmên: Serhatîya Împeretorîya Osmanî 1300-1923. London, John Murray.

Fues, T. (1998). Armut und Wohlstand / Xizanî û Dewlemendî. Di: Hauchler, Ingomar / Messner, Dirk / Nuscheler, Franz (editor in): Globale Trends 1998. Fakten Analysen Prognosen / Meylên Global 1998. Rastî Analîz Texmîn, rûpel 41-55. Frankfurt am Main.

Gebauer, S. (1993). Sozio-kulturelle Konflikte von Asylwerberinnen in der Bundesrepublik Deutschland / Pirsgirêkên civakî-çandî yên penaxwazên li Komara Federal a Almanyayê. Bonn.

Glick, S., Basch, N., Szanton, L., Blanc, C. (editor in) (1992). Towards a Transnational Perspective on Migration: Race, Class, Ethnicity, and Nationalism Reconsidered / Ber bi perspektîfeke transnasyonal der barê koçberîyê de: Nijad, Çîn, Etnîzîte û Neteweperestîya ji nû ve li wan hatî fikirîn, New York, New York Academy of Sciences.

Kizilhan, I. (1997). Die Yeziden. Eine anthropologische und sozial-psychologische Studie über die kurdische Gemeinschaft / Êzdî. Lêkolîneke atropolojîk û civakî-psîkolojîk li ser cemaeta kurd, medico international Verlag Frankfurt.

Kizilhan, J. (2002). Veränderungsprozesse in der Türkei seit Beginn der Beitrittspartnerschaft. Zum Reformbedarf hinsichtlich der Demokratisierung, der Durchsetzung rechtsstaatlicher Strukturen, der Stärkung der sozialen Marktwirtschaft und der Lösung des Kurdenkonfliktes / Ji destpêka hevkarîya endametîyê ve pêvajoyên veguherînê li Tirkîyeyê. Ji bo pêdivîya reforman elaqedarî demokratîkbûnê, pêkanîna avahîyên dewleta huqûqê, xurtkirina aborîya bazarê ya civakî û çareserîya pirsgirêka kurd. Conflict & communication online, hejmar 52, 2002, ISSN 1611-1818.

Kizilhan, J. (2004). Sozialisation im Krieg / Di şer de civakîbûn. Di: Sommer û Fuchs (edîtor in). Handbuch der Kriegs- und Friedenspsychologie / Pirtûka destan a psîkolojîya şer û aştîyê. Weinheim: Beltz Verlag (rûpel 357-368).

Münz, R., Seifert, W., Ulrich, R. (1997). Zuwanderung nach Deutschland. Strukturen, Wirkungen, Perspektiven / Koçberîya ber bi Almanyayê ve. Avahî, Bandor, Hêvî, Frankfurt/M., Campus.

Ong, A. (1997). Ungrounded Empires. The Cultural Politics of Modern Chinese Transnationalism / Împeratorîyên bê bingeh. Siyasetên çandî yên transnasyonalîzma Çînê ya modern, London/New York: Routledge

Pries, L. (1996). Transnationale Räume. Theoretisch-empirische Skizze am Beispiel der Arbeitswanderungen Mexiko-USA / Qadên transnasyonal. Sêwirandineke teorîk-empîrîk di mînaka koçberîya karkerîyê ya Meksîka-DYAyê de. Di: Zeitschrift für Soziologie, sal 25., rûpel 437–453

Pries, L. (2000). Soziologie Internationaler Migration. Einführung in Klassische Theorien und neue Ansätze / Civaknasîya Koçberîya Navneteweyî. Destpêka teorîyên klasîk û rêbazên nû. Bielefeld, nusxeya nivîsê.

Pries, L. (2001). New Transnational Social Spaces. International Migration and Transnational Companies / Qadên civakî yên transnasyonal ên nû. Koçberîya navneteweyî û şirketên transnasyonal. London/New York, Routledge.

Sánchez, O.S. (1999). Zum Stand der derzeitigen migrationstheoretischen und –politischen Debatte unter besonderer Berücksichtigung ihrer kommunalpolitischen Implikationen / Li ser rewşa niha ya guftûgoya teorî û sîyaseta koçberîyê dema ev tê kirin tezammunên sîyaseta xwecihî jî bi taybetî li ber çav tên girtin. In: Informationszentrum Sozialwissenschaften/ Landeszentrum für Zuwanderung NRW: Migration und ethnische Minderheiten / Koçberî û hindikahîyên etnîk, berga 1999/2, rûpel 7-21. Bonn, Informationszentrum Sozialwissenschaften.

Santel, B., (1998). Gesellschaftpolitische, soziale und ökonomische Aspekte der Migration / Alîyên sîyaseta civakî, civakî û aborî yên koçberîyê. Di: Büttner, Christian/Finger-Trescher, Urte/Grebe, Harald (edîtor in), Brücken und Zäune. Interkulturelle Pädagogik zwischen Fremdem und Eigenem / Pirr û çît. Pedagojîya navçandî di navbera xerîb û ê xwe bi xwe de, rûpel 15-26. Gießen: Psychosozial-Verlag.

Smith, M., Guarnizo, L.E. (1999). Transnationalism from Below / Ji jêr ve transnasyonalîzm (Comparative Urban & Community Research, hejmar 6). New Brunswick/London, Transaction Publishers.

Teitelbaum, M. S., Winter, J. (1998). A Question of Numbers, High Migration, Low Fertility, Politics of National Identity /Meseleyeke hejmaran, koçberîya zêde, berdarîya kêm, sîyasetên nasnameya neteweyî. New York, Hill&Wang.

Kizilhan, J. (2005). Zuwanderungsgesetz mit vielen Hindernissen. Ein kleiner Schritt zur multikulturellen Demokratie? Identität und Integration / Qanûna koçberîyê tevî gelek astengîyan. Gelo gaveke piçûk e ber bi demokrasîya navçandî ve?. Di: Interkulturelle Herausforderung. Bonn: Zentrum für kurdische Studien (111-128).

Kizilhan, J. (2008). Diaspora Life: Challenge or danger? / Jîyana dîyasporayê: mesele yan tehlûke Di: The Journal of Kurdish Studies, Volume VI, rûpel 45-54. Department of History, University of Illinois. Peeters Publishers, Leuven.

Human Right Watch (1993). The Anfal Campaign Against the Kurds. A Middle East Watch Report / Kampanya Enfalê li dijî Kurdan. Raporeke çavdêrîya Rojhilatê Navîn.

Nuscheler, F. (1995). Internationale Migration. Flucht und Asyl / Koçberîya navneteweyî. Rev û penaxwestin. Opladen.

Scheikhmous, O. (1993). Kurdische Kultur und Politik im Exil / Çand û sîyaseta kurd li derveyî welêt. Di: Berliner Institut für Vergleichende Sozialforschung û yên din (edîtor): Kurden im Exil. Ein Handbuch kurdischer Kultur, Politik und Wissenschaft / Li derveyî welêt kurd. Pirtûkeke destan a çand, sîyaset û zanista kurd, 2. 12.-112.-11. Berlin, Ed. Parabolis.

Vanli, I. S., Woltschendorf, U. (1986). Kurdistan und die Kurden – Türkei und Irak Bd.II / Kurdistan û Kurd – Tirkîye û Iraq berg II, Göttingen, Gesellschaft für bedrohte Völker.

Wergera ji almanî: Luqman Guldivê

Yekîtîya Ewropayê, ji nuha û pê ve, di krîterên xwedîkirin û nêrina zarokan de, hebûna têkilîyên hisî û dayikî mecbûr dike. Her weha dîsa pêwîst dike ku şert û mecalên sosyal yên zarokan li gor atmosfera wan bin, ger ne wisa be, ev wek "sûc û xerabxwedîkirinê tê hesibandin". Ev wezîfe, berî her tiştî mecbûrî dayikê ye.

Bi navê başîyê refaha zarokan

Sandrine Garcia *

Liberçavgirtina jîyana psîkohîsî ya zarokekî ciwan dibe zemîneke girîng ji bo pêşketina sazîyên cihêreng ên zarokên ji dêûbavên xwe bi demedirêjî an jî rojane veqetandî, pêşwazî dikin û vedihewînin. Di vê yekê de, rola psîkoanalîzê pir mezin e. Ji ber ku teorîyên wê bûn alîkar daku personelên bi zarokên biçûk dadikevin, bibin bisporên vî warî. Lê belê ev zanîn li wêdetirî vî warî berbelav bû. Nexasim di salên 1970yê de gelek kesan guh da van zanînan, lewra wan feraseta hîyerarşîk a danûstandinên dêûbav û zarokan dikir mijara guftugoyê û li hestiyarîya dijotorîter a demê dihatin.

Lê belê rola psîkoanalîzê ne pir zelal bû. Li bin parastina **Françoise Dolto** –a ku di nûnerîya vî warî de ne tenê ye–, psîkoanalîz di heman demê de bû rêbazeke spartina doza zarokan li nêrîneke kevneşop û zikmakî ya rolên her zayendê, û ev rûçikê karîzmatîk vedigere aîdiyeta xwe ya bi demê re guherî ya malbatperestîya katolîk. Dijbera bi daxwaza dilê xwe dawîlêanîna ducanîyê (IVG), **Dolto**yê bênavber peywirên wan ên dayîkbûnê anîn bîra jinan. Ji bo vê yekê, nerazî ji vegotinên herî berbiçav ên kevneparêzên ku banga vegera malê li wan dikir, wê bi temamî xwe da wezîfa pîroznîşandana têkilîya dayîk-zarok. Wê dengeya ruhî ya zarok ne tenê spart hebûna dayîkîyeke hesas a pêvajoya salên destpêkê yên zarok, lê belê wê herwiha ew denge spart pêkhatina çanda dayîkbûnê ya ku dihêle ku dayîk li derdora zarok bibe perwane û hertim li ber bigere.

Fîgura dayîka nezan bi vî awayî şûna ya dayîka xirab girt

Bi vê feraseta ku ji alîyê derdoreke pir fireh ve tê qebûl kirin, amadebûna tam a ji bo zarokê, pîvana sereke ye. Û ji bo ku dayîk ji xeter û girîngîya karûbarê xwe yê bingehîn haydar bibin, **Dolto**yê bi taybetî bal kişandiye ser gelek xeterên li pêşîya zarokan, ên ku ji alîyê psîkoanalîzê ve hatine ron kirin. Fîgura dayîka nezan bi vî awayî şûna ya dayîka xirab girt. Vê jî derfet da bisporan ku jinan bi xweşbînî û baldarî binirxînin, wan teşwîq bikin û han bidin ji bo ku baştir guh bidin şîretên ku nirxê didin formên otorîteyên aîdî çînên navîn û serdest. Ev fîgur niha jî hindik maye cihê xwe bide ya dayîka ku li himberî mezinahîya wezîfa xwe û modela dayîka mukemmel tengezar dibe, ku heman bispor jî ji bo wan îqna bikin, bi kar tînin. (1) Lê belê, ev karê pîrûpakkirinê di heman demê de piştî hilweşînên gîyanî yên ku encamên dayîkbûnê ne, dibe hewldaneke afirandina hewaya xembarîyeke dilovan û piştî dudilîya beramberî pitikeke ku dem û enerjîya wê ya zikmakî di xwe de kom dike. Ev kar li şûna ku bi bîr bixe ku bav jî xwedî qabîliyeta guhertina binê pitikê, aşkirina wê û şûştina wê ne, nîzama kevneşop xurt dike, jinan der barê qabîliyetên wan ên dayîkî de aram dike.

«Ya herî baş ew e ku ew here li mala xwe îstîrehet bike»

Bi venasîna van berpirsiyarîyên dayîkan *(qet nebe têkildarî karûbarên wan ên mecbûrî)* (2), mijara dêûbavên bi pirsgirêk niha veguherî ya dayîkên bi pirsgirêk. Hemû ev hevokên biçûk yên li ser navê başbûna zarokê, başbûna dêûbavan ji bîr dikin, dayîkan ji xwe re dikin hedef: «*Eger hûn nikarin awayekî din bikin, helbet, lê belê, eger na, wê ji bo zarokê baştir be ku ew rojên zêde dirêj li kreşê an jî li dibistanê derbas neke, ku ew xewa xwe ya piştî nîvro li malê bike, ku ew êvarê li parêzxaneyê nemîne, ku ew li malê firavîna xwe bixwe»,* û herwekî din. –ewqas rênîşandêrên îndîrek ku bi navgîna wan, mirov di statîstîkên têkildarî parvekirina karên malê û awayên bikaranînê û awayên din ku tesîrê li jinan dikin, encamên baş bi dest dixe. (3)

Françoise Doltoyê digot, bavan nûnerîya *«remza neberdewamîyê»* dikir, dayîk jî, berevajîyê wan, dibin nûnerên remza berdewamîyê. (4) Û berdewamî, weke ku herkes dizane, xwedîkirina rojane ya zarokan e, ango wezîfeya herî giran e. Veqetandina pitik ji dayîkê (bi awayekî xwezayî meyldar in bibin yek) jî wezîfeya bavan e; bi ser de jî ew ê bi pêkanîna van wezîfeyan *«bi zarê wê nekin»,* heke bikin jî bi tenê ji bo *«alîkarîyê bidin»* hevsera xwe.

Dramatîzekirina xeletîyên dê û bavan...yanî yên dayîkan

Sazûmana bi destê **Dolto**ya têkildarî mijara zarokan, a ku, di çarçoveya dij-otorîterîya salên 1970yê de, bû sedemê beralîkirina kapasîteya hesas, da ji bîr kirin ku piranîya şîretên ji bo çareserkirina pirsgirêkên perwerdeyî di heman demê de hem dûrî heqîqetê ne, hem jî ji alîyê salmezinan ve pir tên daxwaz kirin. Li alîyê din, hin xeterên psîkolojîk ên binavkirî yên herî hindik farazî û hetta xweşxeyalî ne. Fêrbûna paqijîyê, bi vî awayî, wê xeter bûya, ji bilî ku ev yek ji alîyê zarok bi xwe ve bihata xwestin; piranîya cezayan, kêlîyên gêjbûn an jî bêdîqetîyê û hetta zêdegavîyên dilovanîyê dikarin pirsgirêkên girîng bi gewde bikin. Ev şîret xwe dispêrin dramatîzasyonekê an jî sazûmanîyeke «şaşîyên » dêûbavîkî –mirov dikare bibêje dayîkî jî–, lê belê herwiha li ser kêmbînîyeke têkilîyên hêzê yên ku zarok jî weke hemû zindîyên din ên civakî, meyldar in, bikevin nav livûtevgerê ji bo xwegihandina armancên xwe.

Rapora “Li Ewropaya hemdem dêûbavîtîya erênî”

Pir watedar e ku mirov bixwaze ji xwe bipirse ka baştir e ew zarokên xwe eynî weke zilamê şikeftan dikir, perwerde bike, an jî bibe alîgirê demokrasîya malbatî, li şûna ku xwe bixe nav jêpirsîneke li ser zehmetîyên ku jêdera wan wezîfeya dêûbavîkî ya jinan e ku evên dawîyê di serdemekê de pir dixebitin û vê yekê bêhtir ji bo xatirê bendemayînên ku ji dêûbavan tên kirin, pêk tînin. Divê ji ber vê yekê ev nakokîya navbera liv û tevgera handayî ya ku rapora ***Enstîtuya Neteweyî ya Tenduristî û Lêkolîna Dermanî*** (Inserm) (5) ya ku di 2005ê de, ji bo pêşîlêgirtina jirêderketina zarokan pêşniyar dikir, bê dest nîşan kirin, û cudahîya ku himbêza xwe vedike ji bo zeptûrepta rastîn ya malbatên ku li tevahîya Ewropayê hêdî hêdî bi cih dibin.

Rapora terxankirî ji bo *«dêûbavîtîya erênî li Ewropaya hemdem»* di rastîyê de dogmayeke nû, dogmaya bêşîdetîya perwerdeyî dixe nav siyasetên raya giştî û dema vê dike, pişta xwe dide bergeheke pir berfireh a xirabhelwestê. Ew vê yekê jî bi taybetî wiha tarîf dike: *«Nebûna guncawbûna hisî, neqebûlbarî û îhmalkarî (dêûbav ji ber mijûlahî û sergêjahîyên zehmetîyên şertûmercên di nav de dijîn, nikarin bersivê bidin pêdivîyên hisî yên zarok)»*, an jî, wiha tarîf dike: *«Nekarîna handana adaptasyona civakî ya zarok (promosyona civakîbûneke xirab, îhmalkarî, têkçûna psîkolojîk a pêkanîna hişyarîyeke zanînî ya guncaw û/an jî derfetên fêrkirina bi tecrubeyê)»*. (6) Daxwazên di heman demê de hem ewçend bilind hem jî ewçend şîlo, perwerdekarên ku dikarin hemû wext û enerjîya xwe ji bo zarokan xerc bikin, dixin dewrê. Dibe ku bisporên ku van cure raporan amade dikin ji personelên malê (ku ev di heman demê de rewşa Doltoyê bû jî) û pozîsyonên civakî yên ku wan ji kontenjanên materyel dûr dixin, sûdê werdigirin; lê belê gelek dêûbav, û nexasim jin, xuya ye ku bi rewşên din ên dijwar re rû bi rû dimînin. Ev kataloga normatîf dibe ku li mufredatên profesyonel ên xwedî rola parastina zarokan bê zêde kirin an jî xwedî rola destekdayîna dêûbavîtîyê. Ev katalog herwiha kategorîyên civakî yên kedkar jî eleqeder dike.

Ahmet Karabulak: **Rêzewêneyên ji Guernîcayê heta Halebçê**, qîr li ser tuwalê, 70 x 100 cm

* Doçenta civaknasîyê, li zanîngeha Parîs-Dauphîne -Nivîskara berhema Mères sous influence. De la cause des femmes à la cause des enfants (Dayîkên di bin tesîrê de. Ji doza jinan ber bi doza zarokan). La Découverte, koleksîyona «Tekstên ji bo palpiştîyê», Parîs, 2011.

(1) *Binêre li* «Mamans au bord de la crise de nerf (Dayîk li kevîya buhrana hêrsî)», *Le Monde*, 20-21 adar 2011.

(2) *Binêre li* Anne-Marie Devreux, « Autorité parentale et parentalité. Droits des pères, obligations des mères (Otorîteya dêêbavî û dêêbavîtî. Mafên bavan, mecbûriyetên dayîkan)», *Dialogue*, n° 165, Le Kremlin Bicêtre, 2004.

(3) Li gor lêkolîna bikaranîna demê ya 1998-1999ê ya Enstîtuya Neteweyî ya Statîstîkê û Lêkolînên Aborî (Insee), jin rojê 3 saet û 26 deqeyên xwe, mêr jî rojê du saet û deqeyeke xwe ji bo karên malê vediqetînin.. Di 2010ê de, li Fransayê, ji sedî 30ê jinan nîvdanî dixebitin (çavkanî : Eurostat).

(4) Françoise Dolto, *L'Echec scolaire. Essais sur l'éducation (Têkçûna dibistanî. Ceribandina li ser perwerdeyê)*, Ergo Press, Parîs, 1989.

(5) «Troubles des conduites chez l'enfant et l'adolescent (Tengezarîyên livûtevgerê yên zarok û ezeban)», Inserm, www.inserm.fr, Parîs, 2005.

(6) Binêrin li rapora «Evolution de la parentalité. Enfants aujourd'hui, parents demain. La parentalité positive dans l'Europe contemporaine (Evolusyona dêwbavîtîyê. Zarokên îro, dêûbavên sibê. Dêûbavîtîya erênî li Ewropaya hemdem).», Konferansa wezîrên ewropî yên bi karûbarên malbatî, Lîzbon, 2006.

Wergera ji fransî: Baran Nebar

Heta bi destpêka sedsala 20ê, bi tenê hin beşên piçûk ên ji civaka jor dikarîbûn biçin dinyayê kifş bikin. Erê, mayîna li derveyî welêt hê navdengîya xwe ya cihêreng ji dest nedaye, tûrîzm êdî ne bi tenê ji bo yên herî dewlemend e. Ew çavkaniya îndustriyeke nû ye, ku dibe sedema cihguhertina girseyî ya nifûsê, çawa ku li Çînê qewimî. Lê belê gelo fetha dema betalîyê sozên xwe yên azadkirinê bi qasî digot bi cih anîn? Berevajî mîteke cihê xwegirtî, betlaneyên rojavayîyan – yên ku li otantîkbûneke xapînok a bi rehetîya wan re li hev dike – hem ne pardar in di bipêşketina welatên başûr de û hem jî zindîkirina demsalî ya bazara kar de xwediyê roleke erênî ne.

Tûrîzm, endustrîya fîrarê

Betalîya baş biserûber

Philippe Bourdeau û Rodolphe Christin *

Gelo divê mirov matmayî bimîne? Bêhnvedan û vehesîn – ango hem tûrîzm, hem ger û geşt û hem jî kêf – ji wan mijaran in ku têra xwe erênî tên nîşandan. Dîsa jî ji destpêka girseyîbûna bikaranîna dema betalîyê ji bo çalakîyên bêhnvedanê û vehesînê di salên 1960î de, sosyolog **Joffre Dumazedier** fikar dikirin potansiyela wan a azadker ji rê der bixe; wî didît ku ew vediguherin "opiyûma nû ya gel". Wî sala 1970yî pirtûka dîrokzan **Maurice Dommanget** ya bi navê "*Droit à la paresse /Mafê tiralîyê*" dida nasîn; Dommanget dît ku hêdî hêdî welatî elaqeya xwe ya ji bo jiyana siyasî û civakî ji dest didin da ku enerjîya xwe ji "*fikra sabit a kêfên salane*" re veqetînin. Heta tevî ku tehlûke heye bi rêya kar bihêzkirina silkirina xwe jî qebûl kirin...

Bi pêşketina îndustrîya tûrîstîk, dînamîka azadker a betlaneyên bi mûçe yên ku li Fransayê sala 1936ê ji alîyê Bereya Neteweyî ve hatibû destpêkirin, lawaz dibe û berhevkirina dema betalîyê ya hilberînerî û mentiqê bazirganîyê jî xurt dibe. Lewma tûrîzm neçar dikeve bazara cîhanê: ber bi xwe ve kişandina tahtîlvan, di dest xwe de girtina wî, dafdana wî ber bi xerckirina herî zêde ya mumkin ve, ev yek niha armanc e. Ev hingê rastiyeke paralel pêk tîne, a destûra derbaskirinê nade û cudakar e, ew vê rastîyê di nava dewrên pir vejêr de asê dike, pêşîyê li tevahîya xwe di nav xistina hev a xelkê deverê digire û bi awayekî mînak krîstalîze dibe û vediguhure deverên-fetîşê yên bi navê "park". Ji bo ya herî baş û ji bo ya herî xirab ya dikare were serê mirov, mirov dikare bi rehetî bi cih bibe hem li Venedîkê hem jî li herêmeke çiyayî, deverên ku wê nîşanî me were kirin ka em li ku razên, li ku bimeşin û dema mirov rastî hirçekê ku jêre bûye adet bêvila xwe bixe nava sergoyan hat çawa tevbigere.

"Park" weke formulê herî baş ê qada veqetandî ya ku jiyana rehet lê – di dawiyê de – mumkin dibe. Li ser malpera înternetê ya Federasyona Parkên Xwezayî yên Herêmî (PNR) yên Fransayê weha dinivîse "jiyaneke din li vir xwe bi xwe vedibîne". PNR nîşana bêqusûr a wan qadan e, ku dikin mirov bifikire ku di nava wan de tiştekî cihêreng diqewime, "xweber", "otantîk", tevî ku ew bi xwe jî li gorî prosedurên muhendîsîya civakî tevdigerin: qadên bikêr ên ku ji bo armancên hilberînerîyê hatine dabeşkirin, fonksiyonelkirin û pîvan. Resmekî **Gébé** di pirtûka wî ya xetan a bi navê *L'An 01 / Sal 01* de ya ku ji sala 1970yî û pêve weke rêzepirtûk hat weşandin, berferehîya vê nîzama cografî baş nîşan dida, lewma wê welat weke qadeke bi hişkî li qisman dabeşkirî ya ku lê "rêyên betlaneyê" û "peravên şexsî" li kêleka "qadên pîşesazîyê", "qadên eskerî", "nêçîra parastî", "zûrikê qedexe" û "çandinîya kîmyewî" (1) ... hene.

Ev maneya erênî ye ya ku li cudatîyê tê barkirin, ku vehesîn û bêhnvedana deverên din balkêş dike. Lewra, mentiqê wê bajaran weke li vir dihesibîne, deverên din yên "xwezayî" bi îmaj û xisletên erênî yên bêdawî dinexşîne. Ev xislet jî berevajîyê wan zehmetîyan in ku şert û mercên jîyana bajarî ferz dikin: silbûna pîşeyî, zehmetîyên aborî, kontrola civakî, xitimîna trafîkê, bibinketinên bajarvanîyê, qirêjbûn, xirecir û teqereq, neewlebûn, kêmbûna wext, beş beş kirina têkilîyên civakî... Ji hingê ve xeyalâ tûrîstîk piçûk dibe û bi tenê bi sloganên firotinê tê terîfkirin: "*mişterîyên xwe yên hê biryar nedane qaneh bikin da ku bawer bikin ku girên ji qûmê berevajîyê stresa bajêr, dermankirina aşbûneke derûnî ne: bêdengî, hêdîkatîya mehareyan* [gerên li çolê; nota wergêr] *û xetên safî*" (*L'Echo touristique*, 2006). Mafê "ger û geştê" ji hingê ve wê bi tenê sloganeke bazirganiyê bûya – ango li vir slogana kesekî ger û geştê dike – lewra tevahîya fikra azadîya civakî û çandî li derveyî xwe dihêle.

Ev beridîn bi banalkirina referansên deverên tûrîstîk bi rengê mîna "fabrîkeya xewnan" re di heman wextê de diqewime. Mirov li vir ji nû ve perspektîfa îndustriya çandî ya hollywoodî ya kêf û bêhnvedanê dibîne. Ji pêdivîya mîna fikra sabit a rewakirina cidîtîya çalakîya tûrîstîk bi binxêzkirina xisleta wê ya pîşesazîyê, ev hêsanîya xîtabê piştrast dike rola wê ya beyreqdarîya globalbûneke bi kêf ya ku hêmana "lîberalbûneke bi dirûvê mirovan" e û hilgira "*pergaleke tûrîstîk a cîhanî ye*", çawa Rêxistina Tûrîzmê ya Cîhanî ragihand (2).

Dîsa, mîta tûrîzmê weke hêmana bipêşketinê êdî bi awayekî dijwar tê rexnekirin, herweha temsîla tûrîstekî xemsar, dilnerm û egosentrîk jî tê rexnekirin. Krîz global e: krîza enerjîyê, ya avûhewayê, ya demografîyê, ya ewlekarîyê, ya tenduristîyê, ya nasnameyê. Hesteke berpirsiyarîyê û heta ya gunehkarîyê peyde dibe, ku bi rêya helwest, liv û tevgerên her diçe kêmtir marjînal xwe dide der: xwe dûrkirina ji tûrîzmê yan jî ji hin şewazên wê, gerîna li hêncetên pîşeyî, milîtanî yan jî insanî da ku bêyî xwe weke "tûrîst" hîs bikin mirov bigerin, vegera li pratîkên bêhnvedanê yên li bajêr û li nêz, yan jî tercîha mana salekê li cihekî betlaneyê... Heta helîtropîzm jî – gera bêwestan a li rojê – ya ku stûna xeyalî ya betlaneyan bû di sedsala 20ê de, êdî weke berê nîne, lewra li hemberî tehlûkeya pençeşêra çerm ya kujer parastina ji rojê veguherî mijareke tenduristîya gelemperîyê.Piştî ku pirsa tûrîstbûn yan jî tûrîst nebûn weke pirseke cewherî xuya dike, gelo "ez her tiştî ji bîr dikim" ya malbata Bidochon li betlaneyan hê jî derbas dibe? Krîza nasnameyî ya tûrîstê rojavayî – ku ji ber nebûna lêkolînên li ser vê mijarê, em wisa qebûl dikin ku di serî de beşeke hindikayî ya çînên navîn elaqedar dike, yên ku di helwesteke bawerîpênehêner a li beramberî berxwurîyê û dirindetîyên wêde tevizîne – dema ku ev tûrîst êdî ne dikare û ne jî dixwaze xwe wisa bi nav bike, derdikeve holê. Ew li hev dikê pêre ku pozîsyon û awira xwe têkildarî civakên diçe serdana wan ji navendîbûnê bike, bi rêya lêgerîna li gihiştina nêrîneke ji hundir a welatê diçiyê ya li ser hîmekî têkilî û hizirînên cihê, ne li ser yên ku mêvan-mêvandar yan jî mişterî-karhêner peyde bûyî. Çavdêrîkerê potansîyel, dixwaze ne tûrîst be, hêvî dike bigihêje statuya şahidekî karekî sivîl pêk tîne. Bi heman rengî, dema ku ew red dike bibe berxwurekî asayî, ew dikare xwe weke mêvanekî hîs bike, çawa ku di tûrîzma tevlîker de diqewime. Tevna navneteweyî ya pêşkêşkerên paldankan ji bo şevê û ya yên ku li van paldankan dipirsin ango *couchsurfing* û dildarên mêvanan qebûl dikin *greeters* mêvandarîyê, pevguherînê û belaşîyê dikin bingeha xwe.

Ji çaryek sedsalê û vir ve gelek hewldanên ji nû ve vedîtina tûrîzmê, ji bo ku mane û pratîkên wê nû bikin, bi bîrewerbûna li ser bandora wê ya li hawîrdor û civakan re dimeşin, armanca van hewldanên behsa wan tê kirin bêtesîrkirin yan jî întegrekirina rexneyên li wê ye. Ev projeyên reformîst xwe weke ekotûrîzmê, tûrîzma mayînde, piştgir, berpirsîyar, exlaqî, wekhevîparêz bi nav dikin... Veguherîna wan a nû tûrîzma insanî ye, pêre rûbirû ye ku tevahiya zelûlîyên her du çalakîyên ew xwe li yekkirina wan datîne, çêbike: dîtin û rizgarkirina dinyayê. Ya ku rê li ber nagire – berevajîyê vê - ku soza paşerojeke xweş were dayîn. Para van rêveçûnan, hem yên ji dil û hêjayî rêzgirtinê, hem jî yên oportunîst divê mirov piçûk nebîne. Tevî ku terîf û pratîkên wan ên konkret ji ber terîfên daîmî yên bi lez û bez yan jî ji ber ku mirov hizirîna yên din û yên cihê ji hev dernaxe, zelûl bin jî. Di çileyê 2010ê de weşaneke France Interê pêşniyaz dikir û rave dikir çawa ev ê were kirin, ji bo ku xwe dûr bigirin ji tûrîzma girseyî ya li kendavka Alongê: "*xwe dûr bigirin ji tûrîstên ger û geşteke ji % 100 berpirsîyar li Vîyetnamê, dijberê wê tevbigerin*."

Bi piştrastkirina berevajîyê tevahîya qutbûna di navbera jîyana rojane û ya nerojane de, bi tecrûbeya çareserîyên ji bo ji nû ve heyranmayîna dem û deverên herî asayî bi rêya projeyeke siyasî, tevgera felsefî "sîtuasyonîst"an bingeha turîzmeke ku xwe dispêre qutbûna di navbera vir û cihekî din de, di navbera kar û kêfê de ava dikin. Armanca hunerê jirêderketina psîkocografî, ku Guy Debord gelekî hez jê dikir, ew bû ku hîsa jîyana rojane bi saya gerûgeştê biguherîne – vê jî ji vir dest pê dikir. Hewl didan jîyana rojane bi awayekî nedîtî hîs bikin, bêyî ku bikêrhatîbûna civakî-aborî sîstema xwe ferz bike. Helbestvanîyê bi awayekî eşkere xwe digihand siyasetê. Ev proje hê jî di rojevê de ye û peşniyaz dike ku mirov ji lêgerîna formên tûrîzmê yên cihê bibuhure û weke dev ji berdana tûrîzmê li betlaneyê bifikire.

Ev helwesta radîkal ne tenê dij-konformîzmeke hêsan e, ew di asayîbûna jîyana rojane de cihê xwe digire: geh geh gerandina muzîkvanên amator, kesên ku ji ber sedemên mîlîtanî yan jî girîng digerin, yên ku diçin şagirtiya hunerê destan, yên ku diçin cihên karên kolektîf, yên ku tecrubeyên jidil û bi dilê xwe dikin... Ewqas şiklên bikaranîna mekan û demê hene ku hem weke tecrubeyên şexsî ne û hem jî li derveyî qaîdeyên fermî yên tûrîzmê ne ku li ser helwesta mirov û cihên tetîlê xwe ferz dikin. Ew xwe dispêrin tecrubeyên girêdayî têkîldanînê yên ku têkildarî mijarên girîng, hunerî, jêhatîbûna destan, jêhatîbûna fikrê û girêdayî cografyayê û demê ne. Di van şiklên gerûgeştê de mirov rêz û formên tûrîzmê ji bîr dike, weke ku tunebin, yan jî wan red dike.

Tevî ku bi dehan salên rîtuelên konformîst derb li efsaneya azadkirina betlaneyan da, divê mirov piştî-tûrîzmekê hê biafrîne. Û wextê vê dike jî divê mirov formula xeyalî ya Ernst Bloch: " dema betalîyê = qadên vala" ji bîr neke.

* Yê pêşî cografyazan e, yê duyem sosyolog e; herduyan nivîsandina pirtûka li jêr bi rê ve bir: *Le Tourisme: émancipation ou contrôle social? / Tûrîzm: azadî yan jî kontrola civakî?*, Editions du Croquant, Bellecombe-en-Bauges, 2011.

(1) Gébé, L'An 01, L'Association / Komele, coll. « Eperluette », Parîs, 2000.

(2) "Code mondial d'éthique du tourisme /Kanûna gerdûnî ya exlaqê turîzmê", Organisation mondiale du tourisme, 1999.

(3) Ernst Bloch, Le Principe espérance / Prensîpa hêvîkirinê, berg 2: Les épures d'un monde meilleur / îskeletê dinyayeke baştir, Gallimard, Parîs, 1982 (çapa yekem: 1959

Wergera ji fransî: Luqman Guldivê

Ahmet Karabulak: **Rêzewêneyên ji Guernîcayê heta Halebçê**, qîr-kolaj li ser tuwalê, 70 x 100 cm

www.le-monde-diplomatique.com

Kî sûdê ji betlaneyê werdigire?

Gilles Caire*

Berferehbûneke ku mirovan gêj dike



Çavkanî: Rêxistina Cîhanî ya Tûrîzmê (RCT)

Alîkarîkirina Başûr bi rêya xwedirêjkirina li ber tavê…Dilê mirov dibije vê helwestê ku Rêxistina Cihanî ya Turîzmê piştgirîya wê dike. Gelo wê bibe serketineke bi rastî ?

Seyarî, serfkirin, lîberalkirina danûstandinan: ji bo sazîyên navneteweyî tûrîzm potansîyeleke bi hêz ya globalbûnê ye. Lê belê ne bi tenê ev e: li gorî Rêxistina Cîhanê ya Tûrîzmê (OMT, sazîya ku di nava sîstema Neteweyên Yekbûyî de pispor e) tûrîzm herwiha "motoreke girîng ya bipêşketina civakî û aborî pêk tîne ". (1) Roja cîhanê ya tûrîzmê ya sala 2006ê, OMTyê kampanyayeke ragihandinê ya bi navê "Tûrîzm, çavkanîya dewlemendîyê ye ji bo mirovan, malbatan, gelan û ji bo tevahîya cîhanê". Armanca wê ew bû ku *"di mijara têsîrên baş ên turîzmê de mirovan bîrewer bike, li ser fêdeyên wê yên aborî, yên ji bo xurtkirina têkilîyên di navbera gelan de, yên ji bo afirandina karên nû li derveyî bajaran, yên ji bo parastina hawîrdorê…"*. Berîya vê, me bi *"trade not aid"* ("ticaret ne alîkarî") dizanî; êdî em ê bi "travel, not aid" zanibin: ger û geşt, ne alîkarî… Gelo divê mirov tevlî fikreke wisa xeyalperest bibe ?

Li gor OMTyê, tûrîzm derfeteke pir kêmdîtî ye ji bo ku berhemên hilberînerên Başûr bifirosin berxwurên Bakur, lewra ev tûrîzm xwe disipêre çavkanîyên çandî û xwezayî ku li welatên xizan pir caran yekane dahata welêt pêk tînin. Li alîyê din jî, li gorî OMTyê, ew derfetê dide kesên li derveyî jîyana aborî mane da ku cihê xwe têde çêbikin: wisa tê qebûl kirin ku serbest gerandina berxwurên xwedî gelek îmkanên kirînê li seranserê welêt wê têkilîyên kirînûfirotinê bi hilberînêrên herêmî yan jî bi xwedîyên hotelan re hêsantir bikin. Tevî vê jî wisa tê bawer kirin ku wê newekhevîyên cinsî kêm bike, lewra hejmareke mezin a karkerên wê (ji sedî 70yê hejmara karkerên tûrîzmê yên cîhanê) jin in. Li alîyekî din jî wê di mijara pêwîstîya bi parastina dewlemendîyên hawîrdorê û yên çandî de gel hişyar bike. Wisa tê hizirîn ku hêsankirina têkilîyên di navbera welatîyên cuda de, tûrîzm "[qaşo] *wê girêdana civakî gerdûnî bike*" û wê bibe sedema "*serbilindîya çandî, ya aştî û fêmkirina yên din, ya bîrewerîya li ser milkîyet û kontrolkirin..*". (2)



Tabloyeke bi vî rengî wê rastîyê dide jibîrkirin ku tûrîzm berîya hertiştî endustrîyeke di bin serdestîya şirketên pir-neteweyî yên weke TUI Travel yan jî Accorê de ye ku li ser bingeha hevgirtinên mezin û cihanî yên teknîko-bazirganî ava bûne. Sala 2001ê, di koferanseke ji alîyê Rêxistina Cîhanî ya Bazirganîyê (RCB) ve organîzekirî de, sekreterê giştî yê Federasyona navneteweyî ya operatorên ger û geştan, detayên dabeşkirina mesrefên qubale yên tûrîstîk yên navneteweyî li Belçîka, li Almanya yan jî li Ingilîstanê dan zanîn: bi navînî ji sedî 20ê mesrefê li welatê ku kirîn lê hat kirin dimîne, ji sedî 37 para şirketa balefirê ye. Bi tenê ji sedî 43yê vê mesrefê para welatê ku tûrîst diçiyê ye, ev mîqdar jî wê kêm bibe bi îtxalata hin tiştên ku tûrîst naxwazin bêyî wan tehtîla xwe derbas bikin: vexwarin, xwarin, klîma, televîzyon, enerjî… lê dîsa jî forfeyên tûrîstîk ku operatorên ger û geştê pêşniyaz dikin ji sedî 80yê geştên ber bi welatên bi pêş dikevin ve pêk tînê.

Li alîyê din, dema li tetîlê derbas kirî ku weke di nav hewşeke giştî bi rêvebirina fermanî ya tehtîlên organîzekirî de ku têde wext kêm e û kirîn li gorî peşniyazên rehberan pêk tê, têkilîdanîna bi hilberînerên piçûk re hêsan nîne. Weke nimûne em ê li forfeyeke ji bo hefteyekê hertişt têde li ber peravên Tûnisê bifikirin. Buhayê firotina vê forfeyê ji bo tûrîstekî fransî di sezonê de 600 euro ye, 350 euro wê tucarî nekevin destê Tûnisê: ew ê heqê baca li ser nirxê lêzêdekirî (BNL) û bacên balafirgeha Fransayê, lêçûnên ji bo kêrozenê, komîsyonên bazirganîyê, mesrefên giştî û para şirketa ku bîlet firotîye bidin. Ji 250 euroyên mayî, ku piştî qûtkirina baca herêmî ya balafirgeh û BNL, ku wê bikevin destê klub-hotelan, lê divê mesrefên îxracatan û yên şiyandina Bakur a pareke kara bidestxistî jê werin kêm kirin, di dawîyê de herî zêde 150 euro ji bo xurtkirina aborîya herêmî dimîne.

Piranîya tûrîstan diçin bakur

Behsa ger û geştê îmajên egzotîk bi bîr bixe jî piranîya van ger û geştan ji seyahetên keyfê yên li welatên cîran pêk tê. Xisleta pêşketina mezin ya tûrîzma navneteweyî – ku ji sala 1950î û vir ve bi 29 caran ji hejmara welatîyan bi lêztir zêde bû – newekhevîya belavbûna mirovan di navbera herêman de û kombûna hejmareke zêde li herêmeke tenê ye. Lê bêlê di van deh salên dawî de bazareke taybet bi pêş dikeve, ku piranîya caran mişterîyên Bakur bi wargehên li Başûr re têkîldar dikin: tûrîzma seksê.

Nimûneyeke din: nimûneya forfeya hefteyeke ger û geşta li çiyê ya li çiyayên Atlas ên Fasê, bi balefira ***Airfrance***ê û ji alîyê şirketeke ger û geştê ya fransî ve hatî firotin. ji 950 euroyî 540 euro nagihîjin Fasê. Berevajîyê Tunisê, îxracatên ku divê ji bo tûrîstan bên kirin, pir kêm in, berhêma "meşên peya" zêdetir xwe dispêrin çavkaniyên navxweyî : lê belê belakirina hatinîyê gelekî newekhev e: 370 euro wê bi kêrî aborîya Fasê bên (para şirketa herêmî, şeveke li hoteleke li cihê cih, mînîbusek, meaşê rehber, kirrînên erzaq ji bo cihên kampîngê) û bi tenê 40 euro wê bigihîjin destê karkerên herêmî (karkerên mitbexê û qantirajoyan). Di dawiyê de kêmtirî % 5ê pereyên tûrîst mesref dikin diçe herêma diçinê.

Ango piranîya welatên Bakur pir kêm sûdê ji turîzma navneteweyî werdigirin – ev yek bêyî ku para têra xwe mezin ya ku olîgarşîya aborî û siyayî ya herêmî ji xwe re vediqetîne, were hesibandin pêktê. Herçî welatên dewlemend in, ev endustrî li wan deveran ji asteke bilind ya kombûna tûrîstan sûdê werdigire, lê li welatên bi pêş dikevin bazarên tûrîstîk bi awayekî parçe parçe hatin avakirin. Di van şert û mercan de şirketeke ger û geştê ya Bakur dikare reqabetê di nava xizmetên li herêmekê de bi kar bîne yan jî reqabetê di nava gelek herêmên welatekî de bike û bi vî rengî dikare piranîya nirxê lêzêdekirî bi dest bixe.

Wergera ji fransî: Luqman Guldivê

Bi hejmaran

Kî diçe ger û geştê?

Hejmara mirovên li cîhanê xwedî heqê betlaneya bi meaş in: 4 milyar.
Hejmara kesên ku herî kêm salê carekê diçin ger û geşteke tûrîstîk ya navneteweyî :

- 200 ta 250 milyon mirovî, ango ji 30 kesên li ser rûyê erdê 1.
- Ji sedî 26ê welatîyên Yekîtîya Ewropayê
- Ji sedî 50 heta 60yê welatîyên Danîmarka, Holanda, Norwêc û Awusturya
- Bêhtirî ji sedî 40ê welatîyên Almanya û Belçîkayê
- Kêmtirî ji sedî 20ê welatîyên Fransa, Îtalya û Spanyayê

Li Fransayê tevî ku ew bi tenê ji sedî 7ê welatîyan pêktînin, kadroyên payebilind û xwedîyên karên serbest ji sedî 22ê wan kesên diçin ger û geştên li derveyî welêt, pêktînin.

Çavkanî; Buroya navnetewî ya kar. Rêxistina Cîhanî ya Tûrîzmê; Eurostat2008 ; rêveberîya turîzmê (2005)

Yek ji endustrîyên herî mezin ên dinyayê

(Bihaya îtxalatan bi milyar dolaran)

- Enerjî 1 800.
- Berhemên kîmyayî : 1 450.
- Ekîpmanên pîşeyî û telekomunîkasyonê:1 300.
- Berhemên cotkarîyê:1 150.
- Tûrîzm:1 032 (lêçûnên tûrîstîk ên navneteweyî yên ger û geştan).
- Endustrîya erebeyan: 850.
- Endustrîya tekstîlê: 530.

Bi tevahî, tûrîzma neteweyî yan jî navneteweyî bi awayekî yekser yan jî ne yekser ji sedî 9ê Hilberandina Hundir a Nesafî (HHN) ya cîhanê pêk tîne û li cîhanê 250 milyon kesan îstîxdam dike.

Çavkanî:World Travel & Tourism Council (WTTC).

www.kurdishglobal.org

Wexta çînî kêfa betlaneyê kifş dikin

Pál Nyíri *

Ew demeke dirêj nikarîbûn biçin derveyî welêt, karkerên çinî di betlaneya xwe de li welatê xwe digerin an jî diçin welatên xerîb.

Li Çînê êdî adet e xwendekarek yan jî sekretereke birêveberîyê, salê çend caran biçe tahtîlê. Li Hong Kongê li ber dikanan aliqî dimînin, xwe berdidin nav gazînoyên Asyaya Başûrrojavayê, çentê wan li ser pişta wan diçin gerên peya, li Mançûrî tahtîla berfê û kaşûnê dikin, yan jî tevlî gereke ji alîyê ajanseke tûrê ve organîze kirî dibin û diçin kifşa "çiya û çemên bi nav û deng"…ewqas çalakî li ber destê çîna navîn a bajarî hene ku herdiçe qelebalixtir û rengîntir dibe. Êdî hejmareke her diçe zêdetir a şênîyên gund jî carinan tevli gerên rojekê dibin û diçin serdana perestgehekê yan jî diçin dikevin germavê. Di dema cejna biharê de, hejmara yên ku diçin tahtîlê ewqasî zêde bû ku êdî adeta gelêrî ya bihevrebûna malbatan ji bo pîrozkirina sersala çînî (piranî di meha sibatê de) êdî xira bûye.

Bêyî ku bi awayekî eşkere doza tahtîlê bê kirin, dem û dirêjahîya tahtîlê ji alîyê patronan ve tê diyarkirin, karker bi hêsanî li daxwaza xwe ya salê gelek caran çûyîna tahtîlê mikur tên. Wisa xuya ye ku yên herî xizan û patronên piçûk (ku êşa ferzkirina rîtmeke hilberînê li gorî reqabetê dikşînin) li derveyî vê civaka nû ya kêfê ne û neçar dimînin bi tenê bi hevdîtinên malbatî yên dema pîrozbahîyên biharê îdare bikin.

Tevî ku berîya bi panzdeh salan, ji piranîya gel re fikra çûyîna tahtîlê *(dujia)* bi xwe weke tiştekî ecêb dihat hesibandin, îro çînî piranîya mişterîyên sektora neteweyî ya turîzmê pêk tînin. Berevajîyê Yekîtîya Sovyetê, Çîna komunîst ya pêncî salên pêşî tu siyaseta reklama turîzmê bi kar neanî. Diviyabû li hêvîya rêzek reformên aborî yên sala 1978ê bimîne daku hukûmet bernameya bipêşxistina duwanzdeh cihên tahtîlê qebûl bike. Wê demê ev cîh ji bo bala dovîzên biyanî yên çînîyên ku li Honkong û li derveyî welêt dijîn bikşînin ser xwe hatibûn damezrandin.

Bi bilindbûna kalîteya jiyanê re, di dawîya salên 1990î de, turîzma navneteweyî derdikeve holê. Vê yekê pêşî bi serdanên ji memûrên dewletê re organîzekirî dest pê kir. Lê kêmbûna wextê betal (ji xeynî cejna biharê û yekşemê) û nexwestina hukûmetê (hin birêveber ji pêşketina fuhûşê û lîstikên qumarê ditirsiyan), ji bo demeke dirêj pêşî li çûyîna tatîlê bi tena serê xwe girt. Di salên 1900î de di navbera du hezar yan jî du hezar û pêncsed lûnapark, ku piranîya wan adetên çandî û folklorîk derdixistin ser dikê, di nav bajaran de bi destûra desthilatdarîyê hatin bicihkirin. Wan di vê de derfeta xurtkirina hestên welaparêzîyê didît.

Sîteyên dîrokî ku di nav lîsteya UNESCOyê de cih digirin û zozanên Tîbetê gelekî balê dikşînin ser xwe

Xistina dewrê ya siyaseteke reklamkirina turîzmê sala 1998ê ji bo jinûve geşkirina berxwurîyê destpêka vê guhertinê nîşan dide. Hema sala piştre, heqê betlaneya sê hefteyan li seranserê welêt hat bicihkirin û li gorî cejnên 1ê çiriya pêşî, 1ê gulanê û li gorî cejna biharê ev betlane hatin eyar kirin; çînên navîn yên bajarî tucar ji vê derfeta çûyîna tatîlê namînin, ew ger û geştê dikin parçeyek ji jiyana xwe – sêsed û du milyon serdanên ku ji alîyê wezareta turîzmê ve di dema "hefteya zêrîn" a 1ê çiriya pêşî (1) de hatin tesbîtkirin, îspata vê yekê ne. Hejmarên (yên dawî çapkirî) ku zehmet e mirov wan şîrove bike, lê dîsa jî ew ji hejmarên sala 2008ê du caran zêdetir in. Tevî ku ciwanên bajarî yên çînî zêdetir çentêyê wan li ser pişta wan gerên peyayî tercîh dikin, piranîya çîniyan zêdetir ji tatîlên ji alîyê patronekî, firmayekê yan jî komek hevalan organîzekirî hezdikin. Di rewşa heyî de mirov dikare pêşbibîne ku ev şiklên tahtîlê wê demeke dirêj kêfa çînîyan bînin, lewra yên ku cara pêşî diçin tahtîlê hez ji wan dikin û piranîya bazarê pêk tînin. Cîhên ku zêdetir diçin wan perestgeh, çiya û bi giştî deverên dîrokî ne. Ji ber ku bûdîzm ji nûve balê dikşîne ser xwe, ev serdan destûrê didin ku gel têkilîyên xwe bi rîtuela pêxistina bixurê ji bo xwedêyan ji nûve geş bike. Tevî ku welatê Çînê xwedî sîstemeke qeydkirina dewlemendîyên xwe yên dîrokî nîne jî, cihên ku gelekî tên ecibandin hene weke wargehên xwezayîyên ku nû derxistin pêş, wargehên girêdayî tûrîzma etnîk (nexasim li Başur-Rojavayê welêt li nava Tîbetîyan, Daîyan, Dongan, Miaoan, hwd) û kevnebajarên di şoreşa çandî de xirabkirî û jinûve sazkirî. Warên ku di lîsteya UNESCOyê de cih digirin elaqeyeke taybet dibînin û bi saya helwesta jidil ya hukûmetê hejmara wan her sal bêhtir dibe.

Ev israra hukûmetê ne tiştekî balkêş e lewra piranîya van wargehên dîrokî li rojavayê welêt in. Ev herêm jî cihê herî xizan e ku têde xwegihandina deverekê gelekî zehmet e: desthilatdarî ji tûrîzmê hêmanekî sereke yê stratejîya xwe ya ji bo bipêşxistina herêmê çê dike. Di gelek warên li Başûr-Rojava de, Tibet jî di navê de, aborîya ku xwe dispêre kêf û tahtîlê bûye yekem çavkanîya hatinîyê. Ev jî dibe sedem ku desthilatdarî ji nû ve qîmetê bide derdorê, bipêşketina daîmî ya hawîrdorê û parastina mîrateya çandî, dîrokî û xwezayî. Bi vî rengî, zozanên Jiuzhaigou (ser bi Sichuanê) ku di lîsteya mîrateya cihanê ya UNESCOyê de ne û bi tenê çend hezar tîbetî lê dijin, her sal bi milyonan tûrîst ber bi xwe ve dikşîne û xwedî çil û çar hotelên mezin û bi prestîj ên weke Sheraton, InterContinental û Marriott e.

Ev warên tûrîstîk, yên kevn û yên nû, bi piranî derdora wan bi awayekî eşkere sînordarkirî ye û carinan çend gund xwedî lewheyên rengîn in û avahîyên mezin dihewînin. Piştî ku heqê ketina hundur dan, komên turîstan li gel rehberên xwe dikarin bi heyranî li derdorê binêrin û tevlî pîrozbahîyên bi nîşandana reqsên gelêrî bibin. Lêgerîna wekexwebûn û otantîkbûnê ku parçeyek ji tûrîzma rojavayî ye, li vir rastî komên turîstên neteweyî ku hez ji gerên peya dikin û beşek ji gelê herêmê tê ku dewlemend û bipêşketî ne – rastî wan kesan tên ku li ser çiyayan xwedî xanîyên tahtîlê yên luks in ku ji alîyê mîmarên bi nav û deng ve hatibûn sêwirandin. Tevî ku çînî hez ji ber tavê [xwe bronzkirin] nakin jî, tahtîlên li ber perê deryayê jî êdî karê tînin, lê serdanên demdirêj nayên organîzekirin.

Herçî serdana welatên xerîb e, qat bi qat zêde dibe. Şirketên balafirê yên erzan xwe di welêt de bi cih kirin û welatên cîran biryara hêsankirina vîzeyan dan ku piştî mirov xwe gihand erdê wan tên dayîn. Bi vî rengî di sala 2011ê de şêst û pênc milyon çînî derketin derveyî welatê xwe: hejmareke ku ji ya sala 1997ê sêzdeh caran bilindtir e. Lê herçiqasî çûyinên ber bi Ewropa, Afrîka û warên din yên dinyayê her diçe zêdetir bibe jî, ciwanên bajarî hez ji derbaskirina dawîya hefteya xwe li Hongkongê dikin û hin ji wan diçin Asyaya Başûr-Rojhilat (Laos, Kamboçya, Vîetnam, Tayland…) da ku şêwazê tatîla bi çenteyê li ser piştê û gera peya, kifş bikin.

* Profesor, dersdarê dîroka giştî li gorî perspektîfeke antropolojîk li Zanîngeha Azad a Amsterdamê ye.

(1) Hefteyek betlaneya jibo bibîranîna avakirina Komara Gel (1 çiriya pêşîna 1949ê).

Wergera ji fransî: Feryal Guladawiya

Ahmet Karabulak: **Rêzewêneyên ji Guernîcayê heta Halebçê**, qîr-kolaj li ser tuwalê, 50 x 70 cm

Krîza aborî li Yewnanîstanê du bîranînên kevin zindî kirin. Pêşî ya Almanyayê, ku di dema salên reş û tarî yên Şerê Cîhanê yê Duyem de Yewnanîstan dagir kir, lê komkujî pêk anîn û talan kir. Piştre destwerdana Hêzên Hevgirtî weke ya sala 1944ê dema Meliktîya Yekbûyî tercîh kir berxwedana herêmî bişkîne û hevkarîyê bike bi milîsên rasta tundrew re li şûna ku qebûl bike welat ji bin serdestîya wê xelas be.

Sala 1944ê Churchill berxwedana helenî şikand

“Divê em Atînayê di dest xwe de bigirin û lê serdest bin”

Joëlle Fontaine *

Hûn berpirsiyar in ji parastina nîzamê li Atînayê û divê hûn tevahîya cerdên EAM-ELAS [Bereya Neteweyî ya Azadiyê – Artêşa Gel a Azadiya Neteweyî] *yên ku wê nêzî bajêr bibin yan bêtesîr bikin yan jî tune bikin. Tevahîya tedbîrên ku li gorî we bikêrhatî ne ji bo misogerkirina kontrola rêyan û dorgirtina li tevahîya komên xiraker, bigirin.* (...) *Bêguman wê baştir be heke hin hukûmetên yewnanî fermanên we mohr bikin.* (...) *Di vê navberê de qet dudilî nebin, weke ku hûn li bajarekî fetihkirî bin û lê raperîneke herêmî dest pê kiribe, tevbigerin.* (...) *Divê em Atînayê di destê xwe de bigirin û lê serdest bin. Ji bo we ev ê tiştekî mezin be ku hûn vî karî heke mumkin e, bêyî rijandina xwînê bibin serî. Lê heke çare têde nîne hingê jî bi rijandina xwînê.*”(1)

Mirovê ku ev rêz nivîsandî serokwezîrê brîtanî **Winston Churchill** bi xwe ye. Hingê dem kanûna 1944ê ye; eskerên nazîyan hê li dijî Hêzên Hevgirtî li ber xwe didin, Hêzên Hevgirtî bi xwe ji ber êrîşa dawî ya Wehrmachtê [artêşa Almanya ya dema Şerê Cîhanê yê Duyem û berîya wê] li Îtalyayê hew dikarin bi pêş ve biçin û ji Ardenan jî vedikişin. Dîsa jî “cerdên” ku Churchill li vir ji xwe re kirine hedef komên hevkarê nazîyan nînin, lê belê partîzanên Bereya Neteweyî ya Azadîyê ya mezin in, vê bereyê sê salan li dijî dagirkerîya nazîyan berxwedaneke mezin kir.

Di sedsala 19ê de rojhilatê Deryaspî di navbera Rûsya û Meliktîya Hevgirtî de navenda dijberî û dijminatîyê bû. Şoreşa Bolşevîk a çirîya paşîna 1917ê dawî li îxtîrasên Rûsyayê anîn. Di destpêka salên 1940î de herêm bi awayekî şik jê neyê kirin di bin bandora Londonê de ye. Li wir Yewnanîstan xwedîyê cihekî stratejîk e.

Li vî welatî bipêşketina berxwedaneke ku komunîstan û partîyên piçûk ên bi meylên sosyalîst dike hevgirên hev, bi lez û bez kir ku Foreign Office (Wezareta Karên Derve) fikaran bike, lewra ditirsîya “rûs” bikevin qada Deryaspî. Monarşî şerma xelkê bû û hevgirê dîktatorîya faşîst a general Ioanîs Metaxas (1936-1941) bû, Churchill ev monarşî weke yekane hêza dikarî dewama serdestiya brîtanî misoger bike, didît.

Hevgirên Londonê hiştin ku London li gora dilê xwe di vî karî de tevbigere. Tevî rêûresma wilsonî ya ku bi awayekî fermî dijberê herêmên bandorê ye, nexasim dema ku ew herêm ketina hundir a bazirgan û sermayeya amerîkî asteng dike, dîsa jî Franklin D. Roosevelt pişta Churchill girt. Herçî Joseph Staline e, ew dawîanîna li şerî li pêşîya hertiştî digire û dixwaze rê bigire li ber xistina tehlûkê ya “hevgirtineke mezin” a hesas a bi Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê û bi Melîktîya Yekbûyî re. Dema Churchill ji gulana 1944ê ve pêre li ser lihevkirineke li Balkanan dipeyive, dema ku muxetabê wî Romanya û Bulgaristanê ji wî re dihêle, ew jî daxwazên Churchill bi hêsanî qebûl dike.

Tevahîya şer, Churchill mabû li ber destê “*kul û kesera yewnan*”. Ji adara 1941ê ve, dema ku tehlûkeya almanan li ser Balkanan berçav bû, wî ferman da Biryargeha xwe ya Giştî ya Rojhilatê Nêzîk da ku pêncî hezar eskerî ji bo şandina Yewnanîstanê amade bikin. Ev înîsiyatîf, êrîşa brîtanîyan a serketî ya li Lîbyayê nîvçe dihêle, lê belê dîsa jê nayê ku pêşîyê li Wehrmachtê bigire ku mehekê piştre bi riya deryayê, eskeran li ser erdên *helen* deyne. Qralê Yewnanîstanê, Georgesê Duyem tevî hukûmeta xwe ya ku rengê dîktatorîya Metaksas hê jî li ser pirranîya wê ye, mişextî Londonê dibe. Beşek ji hêzên wî yên çekdar li Misirê ji nû ve hatin avakirin û li kêleka brîtanîyan şer dikin, brîtanî jî wan ji nêz ve dişopînin: ya rastî esker li ber radibin ku pirranîyeke efserên qralparêz li ser serên wan bimînin.

Li welêt berxwedaneke girseyî bi bayê bezê bi pêş dikeve. Bereya Neteweyî ya Azadîyê EAM îlona 1941ê tê damezrandin. Ew xwepêşandanên bi heybet li bajarên mezin organîze dike û bihara 1942yê dest bi damezrandina bereyeke çiyayî di bin birêveberîya artêşa wê ya gel ELASê de dike. Di heman demê de ajanên brîtanî yên *Special Operations Executive*ê (SOE) ku Churchill sala 1940î damezrand da ku bi hevkarîya tevgerên berxwedanê ya welatê dagirkirî li pişt bereya dijmin sabotajan bikin, diçin Yewnanistanê; ev ajan çalakîyên xwe di nava xweserîyeke nisbî de pêk tînin. Ew bi awayekî neserketî hewl didin rêxistinên reqîbê EAMyê derxin pêş – yan jî damezrînin. Lê belê birêveberên partîyên din zêde dilê xwe nabijînin berxwedana çalak. Di warê eskerî de EAM/ELAS bi gelekî li pêşîya yên din rêxistina sereke û dest jê nabe, dimîne. Di berdêla tevlîbûna wê ya operasyonên brîtanîyan erê kirî de nûnerên wê Tîrmeha 1943yê li Qahîreyê hatin qebûlkirin bi armanca bi hukûmeta li derveyî welêt re li hev bikin .

Brîtanî bi xêra vê rasthatinê grîngîya EAMê bi dest xistî û mezinahîya daxwaza guherînê ya di nava gel de dipîvin. Di heman dema Konferansa Québecê (17-24 Tîrmeh 1943) de tevî Roosevelt, Churchill jî hêvîyên xwe yên dawî yên danîna hêzên deryayî yên Hêzên Hevgirtî li Yewnanistanê ji dest dide, tevî ku êdî qet guman nîne ku Artêşa Sor ji sînorên URSSê û wêde bi pêş dikeve. Hingê ew bi xwe bi meseleyê re elaqedar dibe, pêşîyê li tevahîya îhtîmala hevdîtinan digire tevî ku şêwirmendên wî dudilî ne û heyetên EAMê vedigerîne Yewnanistanê, pêre jî peyamekê ji Fermandarîya xwe ya Giştî re dişîne ku wê bibûya sêwirandina destpêkê ya plana Manna: tê de behsa şandina Yewnanistanê ya mufrezeyeke seferê dike, dema ku eskerên alman vekişin.

Jê û pêve wezîfeya ajanên brîtanî bi tevahîya navgînên heyî acizkirina ELASê ye. Ew hewl didin bi rêya banknotên-zêr – ev sedemeke bawerîya mirovan bi xwe dianî bû di van demên hîperînflasyonê de ku sterlînek êdî gihîştibû wê astê ku bi 2 milyon draxmîyan bû - partîzanên ber bi xwe ve bikişînin. Yên ku navê “neteweyî” li xwe dikin û di rastiyê de hevkarên almanan in jî di navê de, ew rêxistinên piçûk ên reqîb fînanse dikin. Ew zilamên xwe di nava hukûmeta hevkar û tabûrên ewlekarîyê yên Atînayê damezrandî de bi cih dikin. Ev milîs tevlî operasyonên eskerên nazî dibin, yên ku gelek komkujî kirine û gund şewitandine. Li bajaran ew di *blokoy*ên kevîyên bajaran de cihê xwe digirin, nîvê şevê dorê li taxê digirin, têde bi sîxûrên serê xwe bi kumên paltoyan nuximandî cihê partîzanan diyar dikin û hema li wê derê, wê kêlîyê wan didin ber guleyan. Lîstika dualî ya brîtanîyan, ya ku kir ku lîderên milîsan ji xwe re herweha bibêjin ew di xizmeta wan û a qrêl de ne, di zivistana 1943-1944ê de tovên şerê navxweyî reşandin.

Di vê navberê de ji EAM/ELASê hat ku beşeke mezin a welêt rizgar bike. Ew sazîyên gel ên ku dij-dewletekê pêk tînin, ava dike. Tirs û fikara brîtanîyan adara 1944ê gihîşte asta herî jor, dema ku “hukûmeteke çiyê” ya hilbijartinan li dar dixe, hat damezrandin. Ev yek dibe sedema kelecaneke mezin di nava hêzên çekdar ên yewnan ên li Misirê de, ew tavilê dixwazin ku berxwedan di nava hukûmeta derveyî welêt de were bicihkirin. Churchill bi zor û zexteke bêrehm bersiv da. Ew kesên“serhildêr” dişîne wargehên li Afrîkayê û lîwayeke eskerên elît çêdike ku amade ye tevî qrêl û eskerên brîtanî ji bo rizgarîyê bikeve Yewnanistanê.

Ji ber ku ew hêza wan nîne ku bi darê zorê li Yewnanistanê bi xwe EAMyê tune bikin, brîtanî serî li manevrayên siyasî didin, birêveberên çiyê yên di vî warî de bêtecrûbe bi zorê dikarin xwe li ber van manevrayan bigirin. Di nava stratejîya xwe ya yekîtîyê û bîrbirina xwe ya tehlûkeya derbeke hêzê ya ji rastgiran û brîtanîyan de mane û ew destûrê didin ku li konferanseke bi dîqet li Libnanê Tîrmeha 1944ê hatî amadekirin, werin xapandin; piştî demeke dirêj a dudilîyê wan qebûl kir bi awayekî pirr hindikahî di nava hukûmeteke yekîtîya neteweyî de cih bigirin ya ku zilamê Churchill, Georges Papandrêû (bapîrê kevneserokwezîrê sosyalîst ê bi heman navî, yê ku neçar ma sala 2011ê îstîfa bike) wê bi rê ve dibe. Birêveberên EAMê ewqasî bi nav de diçin ku meha piştre, ew otorîteya walîyekî eskerî yê brîtanî Ronald Scobie qebûl dikin, ku divê ji bo Rizgarîyê bihata Yewnanistanê.

Ji bo pêkanîna plana Manna ya berîya bi salekê hatibû plankirin, her tişt amade ye. Êrîşa serketî ya Artêşa Sor li Bulgaristanê di îlona 1944ê de Wehrmachtê neçar dike ji Yewnanîstanê di bin êrîşên partîzanên ELASê de vekişe. Hê nû piştî vê vekişînê mufrezeya seferê ya brîtanî tevî Papandrêû û Scobie tên Yewnanistanê. Herdu 18ê çirîya pêşi li paytextê bi cih dibin û doza çekdanînê li ELASê dikin, pêre jî çekdanîna lîwaya li Misirê avakirî ya ku destpêka çirîya paşîn veguhestin Atînayê jî red dikin. Li dijî hevkaran tu doz nayê destpêkirin û milîsên çekdar bêyî ku werin cezakirin li paytextê digerin û zilmê li yên di nava refê berxwedanê de dikin. Endamên lîwaya ewlekarîyê di qişleyan de tên asêkirin, lê belê li wir şert û mercên wan yên jiyanê baş in û bi awayekî birêkûpêk tên perwerdekirin. Piştî ku tevahîya meha çirîya paşîn garantîyan bistînin, wezîrên EAMê îstîfa dikin. 3yê kanûnê li meydana Syntagmayê xwepêşandaneke pir mezin pêk tê û daxwaz jî îstîfaya Papandrêû û avakirina hukûmeteke nû ye. Komkujîya li pey vê diqewime – polîs guleyan li welatîyên bêçek direşîne, bîst kes tên kuştin û bêhtirî sed kesî jî birîndar dibin – raperîna xelkê Atînayê dide destpêkirin: ev bahaneya Churchill lê digerîya bû ji bo ku karibe berxwedanê bişkîne.

Ew fermanê dide Scobie da ku serhildêran bitepisîne. Sîleh, balefir û esker ên her ku diçe hejmara wan zêde dibe (heta ku gihîşte heftê û pênc hezar eskerî) ji sînorên îtalî vekişandin Yewnanistanê. Pêşniyazên EAMê ji bo hevdîtinan hatin redkirin. “*Armanc zelal e: têkbirina EAMê. Rawestandina şeran girêdayî vê yekê ye.* (...) *Niha hê ku doza xwînî ya bi rastî bi dawî nebûyî, ya pêwîst biryardarî ye, giranî ye, ne hevhembêzkirineke bêwext e, lewra pirsgirêk çareser nebûye.*” (2) Churchil li hember çapemenîya brîtanî û ya navneteweyî, belê herweha parlemanterên komunan ên ku di dema nîqaşên bi kelecan de doza ravekirinê dikin ji ya xwe nayê xwarê û di helwesta xwe de bi israr e.

Partîzanên EAMyê yên Atîna û Pîrê yên ku çekên wan nebaş, baş nannexwarî, para bêhtir gelekî ciwan in, li hemberî eskerên brîtanî – û endamên lîwaya ewlekarîyê yên ku bi vê rasthatinê ji qişleyan derketin û hatin çekdarîkirin – sî û sê rojan xwe li ber vê tofana ji êgir digirin. Churchill dawîya kanûnê bi xwe diçe Atînayê û qebûl kir ku li ser qral Georgesê Duyem ê hê jî li Londonê ye, ferz bike ku naîbiyekê qebûl bike. Lê belê der barê garantîyên din de yên ku EAM dixwaze, ew ji ya xwe nehat xwarê. Tevî ku ELAS hê jî li her deverî hebû jî, birêveberên wê dudilî ne ku ji nû ve li ser xelkê xwe yê ji taqet ketî û birçî ezmûneke din ferz bikin: 1770 gund hatibûn şewitandin, bêhtirî milyonek mirovî bê mal in, hilberandina dexl % 40 kêm bû. Û alîkarîya Hêzên Hevgirtî bi tenê digihêje kesên ku bi wan re hevkarîyê dikin. Bi peymana Varkîza ya 12ê sibata 1945ê hat mohrkirin, ELAS qebûl dike yekalî çekên xwe deyne. Heman rojê Churchill li Yaltayê bi awayekî merasîmane tevî Roosevelt û Staline “*mafê hilbijartina hukûmeta xwe ya tevahîya gelan*” li Ewropaya rizgarbûyî ragihand...

Lê belê EAM hê ji holê ranebûye. Ew hewl dide bi tevahî li gorî qanûnan armanca xwe ya reformên kûr pêk bîne û di rewşeke wiha de ye ku di hilbijartinan de pirranîyê bi dest bixe. Li hemberî vê tehlûkeyê hukûmeta Partîya Karker a brîtanî a ku tîrmeha 1945ê şûna Churchill girt, yekîneyeke eskerî ya dagirkerîyê ya têra xwe mezin li Yewnanistanê bicihkirî dihêle û xwe disipêre zilamên hevkarî kirin û di komkujîyên li dijî berxwedanê de cih girtin – xwe disipêre polîs û artêşa ku bi alîkarîya eskerên brîtanî ji nû ve hatin avakirin. Partîzanên EAMê tên girtin, ceza li wan tê birrîn û li derveyî bajaran rastî teroreke berê nedîtî tên.

Di vê çarçoveyê de hilbiajrtinên durist ne mumkin e pêk werin. Lê belê ne xem e: Wezîrê Karên Derve yê brîtanî Ernest Bevin dixwaze resmekî hêja bide welêt da ku li Neteweyên Yekbûyî nîşan bide, ji bo vê yekê fermanê dide ku hilbijartin di adara 1946ê de pêk werin. EAM û tevahîya demokratan red dikin ku beşdarî hilbijartinan bibin. Pirranîya rastgir a ku di hilbijartinan de bi ser ket, ji xwe diviyabû wisa be, bi tenê diviya bû ji bo îlona bê referandûma ku vegera qrêl misoger dike, organîze bike.

Vê carê armanca brîtanîyan pêk hat. Lê belê di vê navberê de gelek partîzanên kevin ji nû ve derketin çiyê da ku ji zextan xwe rizgar bikin, û Meliktîya Yekbûyî êdî nikare saxmayîna – û ji xwe hê kêmtir serketina – partîyeke rastgir misoger bike ku wê bi awayekî lihevçêkirî kir desthilatdar. Ji bo ku şûna wê di vê wezîfeyê de bigire, serokê amerîkayê Harry Truman wê 12ê adara 1947ê ji Kongreyê doza fonên pêwîst bikira da ku “alîkarîyê bide” Yewnanistaneke ku pêşenga “pêşîgirtina li komunîzmê” ye.

Bi şikandina berxwedana yewnanan, brîtanî bûn sedem ku welat bikeve nava şerekî navxweyî yê ku wê eşkere yan jî veşartî sî salan dewam bikira – bi arambûneke demkurt a di navbera 1963 û 1965ê de. Dema ku sala 1974ê dawî li dîktatorîya mîralayan hat, hê nû şer bi dawî bû. Ev “darbeya eskerî ya Atînayê” bi bîr dixe ku Yewnanistana modern di tevahîya dîroka xwe de bi tenê bûye xwedîya serwerîyeke pir sînordarkirî, çawa ku îro jî bi êş û jan heman neserwerbûnê tecrûbe dike.

* Nivîskarê berhema *De la Résistance à la guerre civile en Grèce, 1941-1946 / Ji berxwedanê ber bi şerê navxweyî li Yewnanîstanê, 1941-1946,* La Fabrique, Parîs, 2012.

(1) Winston Churchill, *Mémoires sur la seconde guerre mondiale / Bibîranînên li ser Şerê Cîhanê yê Duyemîn* (duwanzdeh berg), Plon, Parîs, 1948-1954.

(2) *Heman berhema li jor navbirî.*

Wergera ji fransî: Luqman Guldivê

www.arsivakurdi.org

KANÛN 1998

Bi Sûrîye û Îtalyayê re alozîya ji ber Kurdistanê

Gavên bê serî yên artêşa tirkî*

Rêveberê PKKê (Partîya Karkerên Kurdistanê) Abdullah Ocalan çirîya paşîn gihişte Romayê, daxwaza xwe ya peydakirina çareserîyeke pasîf ji bo pirsgirêka kurd di çarçoveya Tirkiyeyê de careke din îfade kir. Desthilatdarîya li Enqereyê xwe li van bangan kerr dike, doza dersînorkirina wî dike û gefan li Îtalyayê dixwe ku mueyîdeyan li dijî wê bi kar bîne. Ji ber ku eskerê tirk red dike ku nasnameya kurdî qebûl bike – qedexekirina perwerdeya zimên, çalakîyên siyasî û hwd.– ji bo şerekî ku ev panzdeh sal in dewam dike, timî li derve li çareserîyan digere. Vê stratejîyê havîna bihurî ew bi Sûrîyê re xist nav krîzeke demdirêj.

Hikûmeta tirk ku Meclîsa Neteweyî ya Mezin û piranîya raya giştî bi awayekî biryardar li gel, di mehên îlon û çirîya pêşîn ên sala 1999ê de êrîşên xwe yên li dijî Sûrîyê zêde kirin; serokkomar Suleyman Demirel Sûrîyeyê weha gunehbar kir: "*Destekê dide terorîzma cidaxwaz* (...) *vê jî bi lojîstika dide çeteyan* [û] *hewandina serokê çeteyan li Şamê.*" (1) Serokwezîr Mesut Yilmaz ji alîyê xwe ve behsa hişyarkirina şideteke kêmdîtî kir: "*Sûrîye divê daxwazên me pêk bîne. Yan na dinya hemû wê bi serê wê de bê xwarê. Sûrîye divê biaqil be, yan na em ê çavên wê birijînin*!" (2)

Birêveberên Şamê timî her şewaz alîkarîya eskerî ya Partîya Karkerên Kurdistanê (PKK) û hebûna serokê wê Abdullah Ocaman li welatê xwe înkar kir. Tevî ku ev yek hatibû piştrast kirin û gelek berpirsîyarên siyasî yên alman, yewnan, ermenî û rojnamevanên tirk, kurd û nexasim jî bîyanî ew li Şamê, yan jî Gelîyê Bekaayê yê di kontrola Sûrîyê de dîtibûn.

Sedemên ku rejîma Enqerê derdixe pêş, çapemenîya tirkî wan belav dike û destekê didiyê (3), yên der barê esl û cewherê alozîya tirk û sûrîyeyî de bi her halî bi serê xwe têrê nakin. Ya rastî desthilat difikire ku pirsgirêka kurdî bi awayekî eskerî çareser bike, tevî ku wê tevahîya riyên pasîf jî girtine. Du partîyên siyasî –Partîya Kedê ya Gel (HEP) û Partîya Demokrasîyê (DEP),– yên ku doza qebûlkirina nasnameya kurdî dikin, ji sala 1989ê ve ji alîyê Dadgeha Destûra Bingehîn ve hatin qedexe kirin û girtin. Di nav wan de Leyla Zana jî li çar parlemanterên ku pê razî bûn ku fikra xwe li ser pirsgirêkê ji raya giştî re bi awayekî vekirî û eşkere derbibirin, cezayên giran hatin birîn. Gelek weqf û komeleyên siyasî, yan jî çandî yên kurd ji alîyê polês, an jî dadgehan ve hatin qedexe kirin. Çapemenîya kurdî bi gelek tacîz û zextan re rûbirû hat hiştin.

Ji sala 1925ê ve hukûmetên tirkî ên li pey hev hatin her û her hebûna kurdan bi xwe jî mandel kirin: "*pirsgirêka kurdî nîne, lewra kurd nînin.*" Li gor qanûnên di meriyetê de (xala 312ê ya qanûna ceza yan jî xalên 6,7 û 8 ên qanûna dijterorê) bilêvkirin, an jî nivîsandina peyva "Kurdistanê" wek "*kirina propagandaya cidaxwaz a terorîst*" îfade dike. Divê mirov krîza bi Sûrîyê re ya ku herî kêm sê alîyên wê hene, di vê çarçoveyê de fêm bike: Alîyê yekem dualî ye, yê duyem elaqedarî têkilîyên di navbera kurd û tirkan de ye; yê dawîyê jî zehmetîyên navxweyî yên rejîma Enqerê dihewîne.

"*Di dema Şerê Cîhanê yê Yekem û Şerê Serxwebûnê* [1919-1923] *de ereban ji pişt ve xencer li me da*", "*ereb qirêj in*", "*Sûrîye di serdema osmanîyan de bi tenê eyaleteke piçûk bû*", "*ereb hereketên îslamî li Tirkiyeyê gij dikin û cesaretê didin wan*": ev çendek ji wan dogmayan in ku birêveberên kemalîst belav kirin û di bîra kolektîf de bi awayekî hişk cihê xwe girtine. Tirkiyê di qebûlkirina serxwebûna Sûrîyê de zehmetî kişand; ew bawer dike ku Şam dixwaze aborîya wê sabote bike û pêşîyê lê digire ku bi rola xwe ya hêza herêmî rabe. Hevgirtina di navbera Tirkiye û Îsraîlê de rewşê hêsantir nake. Sefîrê Îsraîlê yê li Enqerê Uri Bar-Ner weha rave kir: "*Tirkiye û Îsraîlê bi palpiştîya Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê hevgirtineke hêzê ya girîng pêk anîn.*" (4)

Serhildana bîstûheftemîn

Du pevçûnên din li van alozîyan zêde dibin. Tirkiye Sûrîyê bi çavberdana wilayeta Antîyoxê gunehbar dike (Antakya navçeya navendî ya wilayeta Hatayê) –, Fransayê sala 1939ê bi dest Enqerê ve berda. Ev herêma berê ya Skenderûnê ku piranîya şênîyên wê ereb in, li ser nexşeyên Şam wan diweşîne weke parçeyekî erdê Sûrîyê tê nîşan dan. Li alîyê din rejîma baasîst a ku Iraq jî destekê didiyê, difikire ku birêvebirin û bikaranîna avên Firat û Dîcleyê divê herweha erka wê jî be. Peymana navneteweyî ya li ser çemên di welatan re derbas dibin, a ku Neteweyên Yekbûyî 21ê gulana 1997ê qebûl kir jî Şamê (û Bexdayê) mafdar dike. (5)

"Fikra sabît a kurd" alîyekî din ê krîza heyî ye. Serokê komarê Demîrel da zanîn ku Tirkiyeyê bîstûşeş serhildanên cidaxwaz tepisandine û ji wê tê ku ya bîstûheftemîn ango ya ku PKK ji Tîrmeha 1984ê ve bi rê ve dibe jî bişkîne. Jixwe Sûrîye ji 1925ê (dema yekemîn serhildana mezin a kurd a Şêx Seîd birêvebirî) ve welatek bû ku întelektuel û muxalifên penaber dihewandin. (6)

Devera ku kurd navê "başûrê piçûk" lê dikin ango Kurdistana Sûrîye (Başûr jî bakurê Iraqê ye) ji şerîdeke 600 kîlometroyan dirêj û 30-40 kîlometroyan fireh pêk tê, li ser vî erdî qederê mîlyonek kurd dimînin. Nasnameya piranîya wan nîne û Şam wan weke hindikayîya etnîk, yan jî neteweyî jî qebûl nake. Li hemberî vê ew li parlemanê ku bi tenê sazîyeke qeydî û erêkirinê ye, tên temsîlkirin –zimanê kurdî ne qedexe ye û kurd bi ereban re bi awayekî pasîfîk bi hev re dijîn. (7)

Partîya Demokratîk a Kurdistanê (PDK) ya ku Mesûd Barzanî wê bi rê ve dibe ya ku beşeke mezin a bakurê Iraqê kontrol dike, 18ê îlona 1998ê bi Yekîtîya Nîştimanî Kurdistanê (YNK) re peymaneke aştîyê mohr kir. Celal Talabanî serokatîya YNKê dike û ev partî beşeke piçûk a başûrê bakurê Iraqê kontrol dike û hevgira Îranê ye. Enqere li ber vê peymanê rabû ku di bin parazvanîya Washingtonê de hat mohr kirin (li gor vê peymanê divê PKK jî ji bakurê Iraqê were derxistin), lewra ditirse ku li bakurê Iraqê dewleteke serbixwe ya kurdî ava bibe.

Sala 1978ê 12 xwendekaran PKK damezirand, vê PKKyê ji şerê çekdarî –sala 1984ê bi dused milîtanên li wargehên filistînî Corc Hebeş û Nayef Hawatmeh perwerdebûyî dest pê kir– tewereya xwe ya têkoşîna

Ahmet Karabulak: **Organîzekirina şûnewarê**, performans

www.kurdi.org

li dijî "*dewleta tirk a dagirker*" çêkir. Ew doza federasyoneke kurd û tirk dike, bêyî ku sînorên neteweyî biguhere. Ji "duyemîn artêşa mezin a NATOyê" a ku ne xwedîya tecrûbeya şerê dijgerîla bû, nehat ku şerê wan ên heta bi sala 1992yê ji wan re digot "*çend eşqîya*" bike. Rêbazên ku desthilatdarîya navendî pêk anîn (gund û gundikên vala, kuştin, êşkence, qedexeyên tevahîya xwepêşandanên pasîfîk, û hwd.) hêza PKKê zêde kirin: Sala 1992yê wezîrê karê hundir ê Tirkiyê lê mikur hat ku 15 000 milîtanên PKKê û 100 000 milîsên wê hene.

Buhayê şer giran e. Aborîzan nikarin mesrefên şer tam hesab bikin (lewra "fonên" neqeydkirî û nepenî hene yên ku ne di kontrola parlemanê de ne), lê belê bêhtirî ji pênc paran sisiyên budceyê jê re hatine veqetandin. (8) Ji ber vê yekê jî înflasyoneke salane ya ku ji 1991ê û vir ve % 80yê dibihure heye û ew her weha krîzeke aborî û civakî jî xirabtir dike.

Ya rastî PKKyê piştî sala 1992yê dest pê kir ku hêza xwe ji dest bide. Li alîyekî artêşê taktîka xwe bi pêş xist; li alîyê din ji PKKya ku cotkarên piçûk seferber kirin, lê belê ji xwe re digot marksîst û neteweparêz, nehat ku serketinên xwe yên eskerî li qadên civakî, siyasî û gel de veguherîne destketîyan. Rêbazên wê yên bi şidet (êrîşên li dijî gundên cerdevanên alîgirên hukûmetê, kuştina jin û zarokan, êrîşên bombeyî li bajarên mezin), ên ku heta bi dawîya sala 1992yê jî belav bûn, desteka gel a li pişta wê kêm kirin. Li hemberî vê înîsîyatîfên wê yên dîplomatîk, gelek bangên wê yên ji bo agirbestê û hevdîtinan ji bo birêveberên eskerî û siyasî yên li Enqerê bûn serêşên bi rastî.

Di bin bandora PKKyê de serok Mandela gulana 1992yê red kir ku xelata mezin a aştîyê ya Ataturk werbigire. Bi ser de jî wî protesto kir lewra sala berîya wê ev xelat dabûn general Kenan Evren ku bi xwe berpirsîyarê sereke yê darbeya eskerî ya 12ê îlona 1980yê bû, serokê cuntaya eskerî (1980-1983) û kevne-serokkomar (1980-1989) bû. Li bêhtirî çil dewletan, û li pênc parzemînan (ji Washingtonê heta bi Sydneyê, ji Ottowayê heta bi Johannesburgê, ji Havanayê heta bi Almaatayê, ji Parîsê heta Yêrîwanê...) buroyên agahdarkirinê yên PKKê li parlemanan û li cem hukûmetan çalak in. Parlemana Kurdistanê ya li Derveyî Welat a li Brukselê ji sala 1995ê ve, li cîhûwarên fermî yên gelek welatan (Belçîka, Awusturya, Hollanda, Rûsya, Îtalya) civînan organîze dike. Van kampanyayan tenêmana jixwe têra xwe mezin a Tirkiyeyê zêdetir kir, û daxwaza wê ya endametîya Yekîtîya Ewropî jî di dema civîna bilind a ewropî ya kanûna 1997ê ya li Luksembûrgê de li ber çavan nehat girtin.

PKK îlhamê ji mînakên Bakurê Îrlandayê, Filistîn û van demên dawîyê ji Kolombîyayê digire, û 1ê îlona 1998ê bi awayekî yekalî ji bo cara duyem agirbest îlan kir, lê belê Enqerê ev pêşnîyaz bi awayekî vekirî red kir. Beşeke mezin a artêşê li dijî her şêwazê çareserîyeke siyasî ye, lewra ew berjewendîya xwe tê de dibîne ku vî şerî dewam bike da ku nufûza xwe ya li ser civakê xurttir bike. Şer veguherî sedema hebûnê ya hin beşên civakê: Birêveberên artêşê û bazirganên sîlehan, cendirme û polêsên li Rojhilat û Başûrrojhilat wezîfeyê dikin, bazirganên dewletî û ferdî yên narkotîkê, cerdevanên alîgirên hukûmetê û burokratên li herêmên rewşa awarte, hwd. Hêza neteweperestên tundrew bi zêdebûna hejmara tabûtên esker û polêsan re yên ku ji herêmên kurdan tên, zêde dibe.

Bipêşketina îslamîzmê

Bipêşketina îslama siyasî ji bo artêşê pirsgirêkeke din e. Tevî zextên piralî ên desthilatdarîyê (qedexekirina Partîya Refahê ji alîyê Dadgeha Destûra Bingehîn ve, dadgehkirina birêveberên wê, cezakirina serokên şaredarîyên Stenbol û Kayseriyê, sansura weşanên kanalên îslamîst, eşkerekirina agahîyan li dijî karsazan, hwd.) hêza herî mezin a siyasî ya welêt a ku % 21.7ê dengan bi dest xistî, hê jî bi pêş dikeve. Derket holê ku şerê artêşê yê li dijî îslamîzmê yê bi rêbazên polîsî tê bi rê ve birin, pir bêkêr e, li alîyê din skandal û hetîketîyên çîna siyasî û artêşê jî zêde dibin. Ji van skandalan a ku jê re Susurluk (9) tê gotin, ya ku piştî qezayeke wesaîtan eşkere bû, hebûna têkilî û hevkarîyên di navbera memûrên payebilind ên hukûmetê, di navê de wezîr û berpirsîyarê polêsan jî, mafyayê û kujerên ku dewletê ji bo kuştina milîtanên ermenî, yan jî kurd bi kar anine, nîşan da.

Cureyekî darbeyeka eskerî ya nepenî hukûmeta Refahê ya Necmettin Erbakan hezîrana 1997ê ji desthilatdarîyê xistibû. Koalîsyona di parlemanê de hindikahî ya hukûmetê (du partîyên rastgir ên ji rêûresmê û partîyeke piçûk a çepgir a neteweperest) ya ku kete şûna hukûmeta Refahê ji bo birêvebirina welêt, ne di nav xwe de li hev dikir û ne jî xwedîya stratejîyeke hevgirtî bû. Li hemberî xitimîna siyasî Meclîsa Neteweyî ya Mezin biryar da 18ê nîsana 1999ê hilbijartinên giştî li dar bixe. Lê belê partîya nû Fezîlet a ku kopîya tam a kevne-partîya Refahê ye ji serketina xwe piştrast e. Tevî muxalefeta artêşê û piranîya çapemenîya belav, jê hat ku 11ê çirîya pêşîn bêhtirî du mîlyon mirovan seferber bike, li bîstûpênc bajaran û "zincîreke azadîyê" organîze bike da ku qedexekirina sergirtina îslamî protesto bike. Bi xwe gijkirina li dijî Sûrîyê artêş hêvî dike ku pêşîyê li serketina wê ya ragihandî bigire.

Tevî ku weha dîyar e krîza bi Sûrîyê re halê hazir bi awayekî demî çareser bûbe jî, piştî peymana ji alîyê herdu dewletan ve çirîya paşîn hat mohr kirin û tevî ku Şamê dîyar e qebûl kiriye ku alîkarîya xwe ya ji bo PKKê rawestîne, îhtîmala wê pir kêm e ku ev yek alîkar be ji bo çareserkirina nakokîyên ku Tirkiyeyê li nav hev dixin. Krîza ku Enqere û Îtalyayê li ser mijara radestkirina Abdullah Ocalan tîne hember hev, piştrast dike ku artêş hê jî fêm nake ku kokên drama kurdî di nav rejîma tirk bi xwe de ne.

* Le Monde diplomatique — weşana çapkirî — kanûna 1998 — rûpel 20. Nivîskarê gotarê entellektuelekî tirk e û navê xwe nedaye aşkere kirin.

(1) Axaftina serokkomar di dema merasîma vekirina parlemana tirk de, 1 çirîya pêşîn 1998, li Enqerê.

(2) *Hürriyet,* Stenbol, 7-8 çirîya pêşîn 1998.

(3) Çapemenîya tirk mijara despêka krîza Sûrîyê bi awayekî bêsînor bi pêş dixe. Li jêr manşetên şeş rojnameyên mezin ên neteweyî hene yên ku di navbera 2 û 6ê çirîya pêşîn de hatin weşandin: *Sabah* (populer, lîberala rastgir) "Serê Margîsk" (tevî wêneyekî serokdewlet Esed); *Akşam* (neteweperesta rastgir): "Em dikarin we hemûyan têk bibin!" (li dijî Sûrîyê, cîhana ereb û Yewnanîstanê); *Milliyet* (populer, navend): "Artêş li benda fermanan e"; *Radikal* (çepgira nerm): "Bayên şerî"; *Yenî Yüzyil* (lîberal): "Apo bidin me!" (banga li Şamê ye: Apo navê Abdullah Ocalan e); *Hürriyet* (populer, neteweperest): "em ê ji bakur bikevinê û ji başûr derkevin" (gefxwarineke eskerî ya li Şamê hatî kirin); *Sabah* (populer, lîberala rastgir): "Em ê piştî nîvrojê bigihêjin Şamê".

(4) *Cumhuriyet,* Stenbol, 29 hezîran 1998.

(5) Bixwîne Alain Gresh, "Souffles guerriers sur le Proche-Orient / Bayên şerî li ser Rojhilatê Nêzîk", *Le Monde diplomatique,* kanûna 1997.

(6) Li ser vê mijarê mirov dikare bêhtir agahîyan di pirtûkên bibîranînên întelektuelên kurd ên weke Musa Anter, Celadet Bedirxan, Nurettin Zaza, Cigerxwîn de bibîne.

(7) Nivîskarê vê gotarê deh rojan li Sûrîyê ma di adara 1994ê de da ku hevpeyvînekê pêk bîne li ser pirsgirêka kurd.

(8) Taylan Dogan, *Savas Ekonomisi* ("Aborîya şer"), Avesta, Stenbol, 1988.

(9) Bixwîne Martin A. Lee, "Les liaisons dangereuses de la police turque /têkilîyên bi tehlûke yên polêsê tirk", *Le Monde diplomatique,* adar 1997 û Kendal Nezan, "La Turquie, plaque tournante du trafic de drogue / Tirkiye, plaka her li xwe didewire ya bazirganîya narkotîkê", *Le Monde diplomatique,* tîrmeh 1998.

Wergera ji fransî: Luqman Guldivê

Ahmet Karabulak: **Organîzekirina şûnewarê**, performans

Wênesazê vê hejmarê



Ahmet Karabulak

1971ê de li navçeya Kanîreşê ya Çewligê ji dayik bû. 1998ê de li Zanîngeha **19 Mayis** ji beşa wênesazîyê xelas kir.

2008ê de li Mersînê dezgeha hevbeş **depoART** û Platforma Însîyatîfa Huner a Mersînê hat damezrandin. Hunermend Karabulak yek ji damezrênerên vê platformê ye. Heta niha li gelek bajarên Tirkîyeyê beşdarî bi dehan pêşangeh û projeyan bûye.

Hunermend Karabulak yek ji amadekarên projeya "Veguhêrîna Bajaran/Destnîşankirina Xesarê" ye. Hunermend li gel wêneyan, enstlasyon û performansan jî çêdike.

Di vê heyamê de hunermendên wesfdar û zanyar ji mijarên wek cinsîyetparêzîya civakî, pirsgirêkên ekolojîyê û pirsgirêkên etnîkî ku ji sedema rewşa sosyolojîk û newekhevîya civakî pêk tên, haydar in û di berhemên xwe de van mijaran bi kar tînin. Ev rewş ji bo hinek hunermendan rewşeke dijwar be jî, ji bo hunermendên zanyar dibe pêvajojoya hilberandineke nû. Hunermend Karabulut jî di berhemên xwe de vê pêşveçûnê bi hostetî bi kar tîne.

Hunermend Karabulak têkilîya xwe ya bi hunerê re bi van gotinan formule dike: "Wek pirsgirêkeke kesane têkilîya min a bi hunerê re li ser rageşîyê hatiye avakirin." Karabulut dema berhemdarîya xwe pêşkeşî civakê dike taybetmendîya xwe û rengê xwe jî bi serkeftî tev li berhemên xwe dike.

Di projeyên hunermend de xaleke ku balê dikşîne jî "tekstên mijarê" ne. Ev tekstên ku bi naverokeke derûnî û felsefî dagirtîne, tenê bi sere xwe hêjayî xwendin û nirxandinê ne. Hunermend bi van tekstên xwe têkilîya di navbeyna huner û civakê de bi serkeftî destnîşan dike. Hunermend di berhemên xwe de mijarên wategiranên derûnî û civakî bi kar tîne, lê li gel vê yekê ev mijarên giran bêyî ku mirov aciz bike, bi mîzah û îronî digihîje temaşevanan.

www.arsivakurd.org

Wan çima gule nereşandin? Ji bo çi Konseya Bilind a Hêzên Çekdar (KBHÇ) piştî ku demeke dirêj dudilî ma qebûl kir ku birêveberekî Birayên Misilman weke serokkomar were hilbijartin? Lewma Misira piştî 25ê çileya 2011ê ji binî ve guherî û lewma vegereke li nîzama kevin êdî ne mumkin e. Lê belê têkoşîn dewam dike û di derbasbûna demdirêj a ji dema dawî hatina li desthilatdarîya serokkomar Husnî Mubarek û vir ve destpêkirî de dengdan bi tenê qonaxek e.

Yên ku dema îmtîyazên xwe wenda dikin

Di navbera şoreş û dij şoreşê de Misir

Alain Gresh

Tevahîya rojeke dawî lê nayê û mirovan difetisîne, di nava hewayeke giran de Misirê bêhna xwe girt û li benda ragihandina encamên tûra duyem ên hilbijartinên serokkomarîyê ma. Dem her dereng dibû, saetekê û paşê saeteke din. Di rojeke weke risasê giran de, hilbijêran li gel zehmetîyan, bi nîzam û di bin kontrola dadgeran de, wekî tûra yekem dengên xwe avêtin sindoqan. Lokalên hilbijartinê 17ê hezîranê heta saet 22yê vekirî man da ku herkes wezîfeya xwe pêk bîne. Kêm bûyer qewimîbûn. Namzedê serketî diviyabû roja çarşemê ango 20ê hezîranê bihata eşkerekirin. Û encamên bi şev hatin eşkerekirin piştrast kirin ku namzedê Birayên Misilman, **Muhemed Morsî** yê ku gelek hêzên şoreşê destek didanê, bi ser ketiye. Komeleya serbixwe "dadger ji bo Misirê" ya ku çavdêriya dengdanê kir (1), serketina wî piştrast kir.

Dîsa jî hewa bi carekê girantir bû. Reqîbê Morsî, general **Ahmed Şefîq** giliyê xwe bir ber destê Komîteya Bilind a Çavdêriya Hilbijartinên serokkomariyê, wê jî biryar da ku weşana encaman paşve bixe. Pêre jî çapemenîya ku mirovên serdema **Husnî Mubarek** wê bi rê ve dibin, dest bi gotegot û dezînformasyonan kirin û gotin Birayên Misilman sindoq xirakirine, ew di hilbijartinan de têk çûne û serhildaneke çekdarî amade dikin! Di rastîyê de biryar êdî ne di destê hilbijêran de ye û ne jî di destê xwedêgiravî Komîteya Çavdêriyê de ye, lê belê bi tenê di destê KBHÇê de ye; wê jî dixwest encamên serketineke ku wê xwestibû pêşiyê lê bigire, bipîve. Wê bi tevahîya hêza xwe piştgirîya general **Ahmed Şefîq** kir, Şefîq serokwezîrê dawî yê Husnî Mubarek bû. Ev esker ji klîka karsaz û efseran e ku ji du dehsalan û vir ve desthilatdarîya welêt di destê wan de ye – 2yê adara 2011ê, di dema guftûgoyeke di bîra mirovan mayî de ya di navbera serokwezîr Şefîq û nivîskar Alaa Al-Aswanî, nivîskarê *Avahiya Yaqûbî* ya muhteşem de, Al-Aswanî gelek belge deranîn ku bertîlxurîya Şefîq piştrast dikirin û bi vî rengî li ser wî ferz kir ku îstîfa bike. Weke nûnerê rejîma kevin ku yek ji wan ên mirov li vir ji wan re dibêje *fûlûl* ango "bermahî" yên rejîma kevin, ango çawa di dema şoreşa fransî de dihat gotin *ci-devant*, li dora xwe "dewleta kûr" civandîye, dewleta ku piştî jitextxistina dîktatorî êdî zêde derneketibû pêş û niha ji bo jinûve bidestxistina imtiyazên xwe bi kelecan têdikoşe. Hemûyên ku tu tişt ji bîr nekirin û fêrî tu tiştî nebûn.

Di dawiyê de piştî dudilîyeke demdirêj KBHÇê serê xwe xwar kir û 24ê hezîranê Morsî weke namzedê serketî hat ragihandin; **wî îstîfaya xwe ya ji cemaetê û Partîya Azadî û Dadê (PAD) eşkere kir û daxwaza xwe ya ji bo bibe serokkomarê tevahîya misiriyan da zanîn**. Di dîroka komara Misirê de ev cara pêşî ye ku sivîlek dibe serokkomar. Ji bo mirov li vê heyamê serwext bibe, têrê dike ku mirov li kolanên Qahîreyê bigere û guhê xwe bide misirîyan, nexasim jî ciwanan: tercîha wan çi dibe bila bibe, ew êdî naxwazin ku desthilatdarî were desteserkirin, ew dixwazin gotina xwe jî bibêjin, ew hez dikin ku fikra wan jî were hesabkirin. Ev nifşê şoreşê ye li tevahîya bajar, heta gundan seferber dibe. Dema dîktatorîyên eskerî bihurî. Ev ciwanên ku serketina Morsî pîroz dikin, yên ku carinan maskeyên *Anonymous* li ber rûyê xwe datînin, li ber rîtmên zindî direqisin, pesnê *kiptî*yekî didin ê ku xaça xwe ya mezin diavêje ser milê xwe û kêfxweş e ji têkbirina generalê rejîma berê; ev ciwan kêm dişibin komên mirovên bi reh yên ku amade ne bi ser cîhana medenî de biçin.

Lê dîsa jî serketina Morsî, -li hemberî namzedekî ku nûnerîya nîzama berê dikir, nîzama berê ya ku di destpêka sala 2011ê de gel li dijî wê serê xwe rakir-, bi ferqeke kêm bû, bi zorê milyonek deng zêdetir bi dest xistin. Ev yek li ser redkirina ku Birayên Misilman dibin sedem a di nava beşeke xelkê welêt de gelek tiştan dibêje û her weha li ser nakokîyên dema derbasbûnê yên dewam dikin de jî.

Encamên tûra yekem a hilbijartinên serokkomarîyê di nava hêzên şoreşger de bû sedema peydabûna şokekê. Rêjeya deng a her yekî ji wan stendî nêzî hev bû, lê belê heryekî qederê ji çar paran yekê dengan wergirtibû. Namzedê Birayên Misilman **Morsî** û general **Şefîq** bi hindikî li pêş bûn. Namzedê kêm dihat nasîn ê meyla nasirî **Hemdîn Sebbahî** bêhtirî ji % 20ê dengan stend – li vir mirov dibîne tu tişt hêsan nîne, Sebbahî û partîya wî di hilbijartinên parlemanê de bi Birayên Misilman re hev girtibûn. Namzedê çarem **Abûl Fûtûh** bû wî ji % 17.5ê dengan bi dest xist. Li ser hev namzedên nêzî şoreşê, ango Sebbahî, Abûl Fûtûh û çendekên din nêzî ji % 40ê dengan bi dest xistin, lê belê di tûra yekem de bi ser neketin û nikaribûn di tûra duyem de cihê xwe bigirin.

Mirov çawa bike? Mirov di tûra duyem de çi bike? Ji bo nivîskar Al-Aswanî ku rexnegirekî xurt ê dîndarên hişk e, tercîh zelal e: "*em ne bi Morsî re ne, em destekê didin şoreşê.*" Helwesteke ku edîtorîya Mustafa Alî bi eşkereyî ragihandibû (2): "*Bi awayekî trajîk hin hêzên alîgirê şoreşê bi awayekî şaş rêxistineke muhafezekar û bi ber bayê dikeve, yekê weke Birayên Misilman, ku gelek caran xiyanet kirin bi armancên şoreşê re (û dibe ku siberojê jî vê dîsa bikin)weke faşîstên dînî bi nav dikin. Û bi vî rengî vê hêza ku bi awayekî oportunîst bi rejîma kevin re li hev kiriye asîmîleyî rejîma niha dikin ku hewl dide tevahiya şoreşê tine bike.*"

Xeyala dewleteke teokratîk a ku Birayên Misilman ferz dikin bela xwe ji hin kesan venake. Dîsa jî ji bo piranîya hêzên şoreşger artêş û rejîma kevin ên ku kontrola qeraseyên sereke yên desthilatdarîyê di destê xwe de digirin, ew hêz in ku divê werin têkbirin, yên ku li dijî wan 22yê hezîranê bereyek hat damezrandin. Morsî, li dora wî partîyên di şoreşê de çalak, fîgurên sembolîk ên mîna Wael Xonîm yan jî Al-Aswanî di platformeke hevpar a têkoşîna li dijî KBHÇê û nexasim biryarên wê yên di hefteyên berîya hilbijartinê de hatin cem hev.

"*Dema ku serokkomar Mubarek ji desthilatdarîyê hat xistin, me şaşîyeke mezin kir me desthilatdarî da destê KBHÇê.*" Roj 14ê hezîranê ye û namzedê di hilbijartinên serokkomarîyê de binketî Abûl Fûtûh hê nû bi tiştekî dihise: Dadgeha Bilind a Destûra Bingehîn qanûna ku destûra hilbijartina parlemanê da, neqanûnî îlan kir, ev jî dibe sedema betalkirina wê. Bi ser de jî wê qanûna ku li kesayetên rejîma kevin di hilbijartinan de namzedbûyinê qedexe dikir jî hê nû betal dikir û destûr dida general Şefîq di tûra duyem a hilbijartinên serokkomarîyê ya 16 û 17ê hezîranê de bibe namzed.

Me got, li Misirê tu tişt hêsan nîne. Di van rojên krîzê de Hemdîn Sebbahî ji bo umreyê çûye Mekeyê û bi dîqqet bêdeng dimîne; helwesta xwe ya alîgirîya ji herdu namzedan yekî diyar nake û li derveyî qada lîstikê xwe digire. Ji ber îdeolojiya xwe ya nasirî, hîletê wî ji rexnekirina artêşê diçe.

Li hemberî vê, birêveberekî kevin ê Birayên Misilman Abûl Fûtûh, hewl dide ku bereyeke fereh li dijî eskeran pêk bîne. Temenî wî li derdora şêstî ye (di çarçoveya siyasetê ya li herêmê de ya ku kal tê de serdest in, ew ciwan tê hesibandin) , karîzmatîk e, enerjîya wî di ser re diçe. Ew demeke dirêj serokê sendîkaya bijîşkan bû, gelek caran hat girtin û bi salan di girtîgehê de ma. Birayên Misilman ew pir lîberal dîtin û marjînal kirin. Ji serî heta binî bi awayekî çalak beşdarî dema efsaneya Tehrîrê bû û di navê de otorîteyeke mezin bi dest xist, nexasim jî li cem endamên Birayên Misilman ên ciwan. Wî pir zû ragihand ku ew ê di hilbijartinên serokkomarîyê de bibe namzed û li bernameyeke reformên demokratîk a welêt xwedî derket; dewleteke sivîl, wekhevîya jin û mêran, wekhevîyeke welatîyan ku wê destûrê bide ku kiptîyek jî karibe weke serokkomar were hilbijartin. Wî li dora xwe koalîsyoneke mezin a meylan û şexsan civand – yek ji şêwirmendên wî yên aborîyê marksîst e – û bi vî awayî di tûra yekem de desteka mirov matmayî hişt a selefîyan bi dest xist, lewra selefî ji hegemonyayeke Birayên Misilman a li ser dika siyasetê ditirsin. Li Misirê tu tişt hêsan nîne.

Ji bo Abûl Fûtûh û ji bo gelek hêzên din, tercîha tûra duyem zelal bû: yan vegera rejîma kevin bi general Şefîq, yan jî bi hilbijartina namzedê sivîl gavek ber bi pêş ve di têkoşîna ji bo "*hilweşandina desthilatdarîya eskerî*".

Di hefteyên berîya hilbijartinên serokkomarîyê de KBHÇyê ji bo sexlemkirina desteserkirina xwe ya sazûmanî êrîşek da destpêkirin. 4ê hezîranê, wezareta dadê mafê eskeran ê girtin û dadgehkirina sivîlan erê kir. Piştî bereeta di doza Mubarek de, kadroyên girîng ên wezareta karên hundir, berpirsiyarên kuştina bi sedan xwepêşandêrî û gelek polîsên bi gulebarandina li xwepêşandêran dihatin gunehbarkirin, ji guneh hatin şûştin.

Di encama biryara dadgehê ya 14ê hezîranê de, KBHÇê hêza qanûnçêkerîyê ji nû ve kir destên xwe, wê ev hêz berê dabû parlemanê, wê herweha danezaneke destûrî ya lêzêdekirî qebûl kir ku pê artêşê jitevahîya "destwerdanên" sivîl diparêze û hêza desthilatdarîyê ya serokkomarê siberojê sînordar dike. Wê mafekî çavdêrîya nivîsandina destûra bingehîn a siberojê jî da xwe.

Bi vê re jî, dewleta kûr çalakbûna xwe weke alîgirê general Şefîq dewam kir, ji bo vê tevahîya navgînên di destên wê de mayî seferber kirin û ev navgîn gelek in: Çapemenîya alîgir û girêdayî – gelek caran yên ku weke serbixwe tên dîtin, lê belê di destên karsazên girêdayî derdorên desthilatdarîyê de ne –, întelektuelên rejîma kevin, mirovên fikrê yên "lîberal" ên ku li dijî dîktatorîya îslamî seferber bûne lê belê dengê xwe ji dîktatorîya eskerî re dernaxin. Tevahîya derewên herî ecêb ji bo bawerîya bi îslamîstan kêm bikin û bişkînin baş bûn: li parlemana tûnisî qaşo wan zewaca bi pir jinan re qanûnî kiriye; Morsî qaşo biryar daye ku şirketa Kanala Suezê taybetî bike, kanal ji dema serokkomar Abdel Nasir sala 1956ê ve ew dewletî kirî ve sembola serxwebûna Misirê ye; Birayên Misilman qaşo sîleh kom kirine, dixwazin artêşê li gorî modela Îranê veguherînin, ew ê qaşo bacên taybet (*cizye*) li ser kiptîyan ferz bikin, ew ê qaşo sînema û şanogehan bigirin û hwd. Yek ji çîrokên herî balkêş ku li dinyayê gerîya ev e: parleman qaşo dixwaze qanûnekê erê bike ku destûrê dide mêrekî ku di nava şeş saetên piştî mirina wê de têkilîya cinsî bi jina xwe ya mirî re deyne. Weke di dema Mubarek yan jî dîktatorên din ên ereb de, "yan em yan jî îslamîst" her slogana tevahîya *ci-devant*an [di dema şoreşa fransî de navê li bermahîyên rejîma kevin dihat kirin; nota wergêr] e, ku hewl didin bergiriya nîzama heyî bikin.

Divê mirov qebûl bike ku ev propaganda bi kêr hat: bêhtirî duwanzdeh milyon misirî di tûra duyem de dengê xwe dan namzedekî rejîma kevin, tevî ku ne hemû, heta pirranîya wan, ne alîgirê vegereke ber bi paş ve ne. Birayên Misilman jî di vê yekê de xwedî berpirsiyarî ne, çawa ku mirov ji encamên dengdanê lê serwext dibe: Morsî di tûra yekem de 5.7 milyon deng wergirtin, tevî ku partîya wî di hilbijartinên parlemanê yên dawîya 2011ê û destpêka 2012ê hema hema du caran li vê hejmarê deng wergirtibûn.

Birayên Misilman berdêla şaşîyên xwe û yên di navbera şoreş û artêşê de didin. Ji ber ku rejîma Mubarek ew pir dijwar tepisandibûn, wan hê nû ji 28ê çileya 2011ê û pêve cihê xwe di nav xwepêşandanan de girt, ango sê rojan piştî ku dest pê kirin, tevî ku milîtanên herî ciwan ji destpêkê ve xwe nîşan dan jî. Ew di şerê gel de yê ku li kolanan gel û Mubarak anîn dijberî hev bi roleke çalak rabûn û bi rêxistinbûna xwe para wan pir e di berxwendana li hember êrîşa polîsan de.

Piştî ku *reîs* ji desthilatdarîyê hat xistin, vê rêxistina ku di meylên xwe de ji binî ve muhafezekar e, hewl da ku qadeke lihevkirinê bi KBHÇê re peyda bike. Ew ji ciwanên xwepêşandar di çiriya paşîn a 2011ê de qut bû, dema ku pevçûnên bi artêşê re li Qahîreyê bûn sedema mirina qederê çil kesî. Birayên Misilman ên ku dixwestin hilbijartinên parlemanê berdêla wê çi dibe bila bibe pêk werin, gilîyê "*tevlîhevîyên bêberpirsiyarî*" kirin û gelek ciwan ji ber vê yekê li wan nebihurîn.

Piranîyeke mezin di parlemanê de bi dest xistin û pê daxwaza xwe ya hegemonîk piştrast kirin, vê jî kir ku gelek sempatîya ji bo wan hebû ji wan sil û dûr bibe. Û tevî angajmana wan a berê, biryara wan a yekser cihgirtina di hilbijartinên serokkomarîyê de tirs û guman zindî kirin. Edîtorekî rêz jê re tê girtin ê îslamî **Fehmî Howeydî** yê ku gotarên wî li seranserê cîhana ereb digerin, bi awayekî cidî ev ketina nav şerê serokkomarîyê rexne kir. Lê belê li gora wî berpirsiyarîyên xetimînên dema derbasbûyî ya gelek alîyan bi hev re ye: "*li parlemanê lîberal û partîyên din tevahîya pêşniyazên Birayên Misilman a serokatîya komîsyonan red kirin. Wan bi kişikê lîst tevî ku meclîsê tedbîrên erênî jî girtin: reforma dîplomeya lîseyê, veguherandina rewşa 700 000 karkerên statuya wan nesaxlem, diyarkirina sînorê mûçeyê herî zêde û hwd.*" Ji bo wî şerê li Misirê ne tenê laîk û dîndaran tîne dijberê hev, belê rejîma kevin û demokrasîyê tîne dijberê hev.

Birayên Misilman 22yê hezîranê qebûl kirin ku bereyekê bi hêzên şoreşger re damezrînin û bi tecrîdbûna xwe hisiyan. Wan biryar da ku şerê desthilatdarîya eskerî bikin, nexasim jî dema daxwaza betalkirina danezana destûrî ya lêzêdekirî û vegera parlemana hilbijartî kirin. Niha, piştî ku namzedê wan hat hilbijartin, gelo ew ê hewl nedin ku bi KBHÇê re li hev bikin? Modalîteyên nivîsandina destûreke bingehîn a nû wê çi bin? Ev pirs bêbersiv li naverastê ne, lê belê çi dibe bila bibe, 24ê hezîranê mohra xwe wê li qonaxeke girîng a dîroka Misirê û dawîanîna li nîzama kevin – nexasim dawîanîna li desteserkarîya li ser aborîyê ya klîkeke bertîlxwur –bixe.

(1) Ahramonline, 20ê hezîrana 2012ê. http://english.ahram.org.eg/NewsContent/36/122/45678/Presidential-elections-/Presidential-elections-news/After-vote-count,-Judges-for-Egypt-corroborate-Mur.aspx

(2) "Last Call: Will the revolution or the counter-revolution write Egypt history / Banga dawî: gelo şoreş yan dij-şoreş wê dîroka Misrê binivîsînin", Ahramonline, 22ê hezîrana 2012ê. http://english.ahram.org.eg/News/45847.aspx

Wergera ji fransî: Luqman Guldivê

www.lemondekurdi.org

Piştî gelek tevlîhevî û kef-teleftê, Tîmor-Leste ber bi demokrasiyê ve gavan diavêje. Welatê ku sûd ji alîkariyên Neteweyên Yek-bûyî girtin, tevî ku beşeke mezin jê hat hebakirin jî, êdî dikare hatina ji petrolê bi kar bîne. Di encama hil-bijartinên giştî yên 7ê tîr-mehê de Dili divê dest bi qonaxeke nû bike, tevî ku sê çaryekên şeniyên welêt li gundan di nava şert û mercên zehmet de dijîn.

Pêvajoyên hilbijartinan li welatekî brîndar

Li Tîmor-Leste jinûveavakirineke hesas

Frédéric Durand *

Welatê Tîmor-Leste weke welatekî "biqasî nokekê piçûk" (1) were terîfkirin jî, ew dîsa ji Lubnan yan jî Jamaîkayê mezintir e û serjimara wê (1.2 milyon) biqasî ya Qibris yan jî ya Estonyayê gelek e. Fikreke din a sabît jî di mijara aborîyê de heye, lewre tevî ku salê milyarek dolarî ji hilberîn û firotina petrol û gaza xwezayî bi dest dixe jî, ew bi piranî weke "welatê herî xizan ê Asyayê" tê nasîn. Heta ku sala 2011ê pêşniyaz kir ku beşekê ji deynê Portekîzê bikire…

Meha Nîsanê welêt hilbijartina sêyem a serokkomarîyê li dar xist. Di dema serxwebûnê de, di sala 2002ê de, birêz **Xanana Gusmão** serokê berxwedana neteweyî ku jê re digotin «Nelson Mandela yê Tîmora rojhilat» û îro serokwezîr e, hingê bûbû serokkomar. Piştî **José Ramos-Horta** (sala 1996ê Xelata Nobelê ya Aştîyê wergirt), kevnegerîla **José Maria de Vasconcelos** ku bi navê **Taur Matan Ruak** dihat nasîn di hilbijartinên sala 2007ê de ji % 61ê dengan bi dest xist û bi ser ket. Reqîbê wî **Francisco Guterres** bû ku bi navê **Lú-Olo** dihat nasîn, namzedê Bereya Şoreşger a Tîmor-Leste ya serbixwe bû. Ew jî partîya serxwebûnê bû.

Li vî welatê ku ji ber şerekî navxweyî sala 1975ê kavilbûyî, piştre jî bîst û pênc salan di bin dagirkerîya Endonezyayê de ma, pirengîya siyasî heqê xwe bi dest xist: di dewra yekem ya hilbijartinan de 4 namzedan ji % 17ê bêhtir deng bi dest xistin. Lê belê rola serokkomar bêhtir a nunêrîyê ye; ya ku biryaran dide parleman e. Lewra hilbijartinên giştî yên 7ê hezîranê girîng bûn. Herçiqasî namzedê bi **navê Gusmão**, ku endamê Kongreya Neteweyî ya Jinûve Avakirina Tîmorê (KNAT) ye, li pêş xuya bike jî, mirov nikare misoger bike ku wê partîyek bi tenê karibe piraniya dengan bi dest bixe.

Wêranîya encama dagirkirinê û siyaseta şewitandina erdên vî welatî ya ku arteşa Endonezyayê û mîlîsên wê piştî referandûma serxwebûnê ya 1999ê dimeşandin, hê jî didome. Ji xwe dema derbasbûnê ku heta gulana 2002ê ji alîyê Rêxistina Neteweyên Yekbûyî (RNY) ve hatibû birêvebirin û weke serketinekê dihat terîfkirin, êdî bûye mijara rexneyan. (2) Ji dawîya 1999ê heta destpêka 2006ê, 2 milyar dolar weke alîkarîyeke navneteweyî ji Tîmor-Leste re hat şandin, lê ji % 80yê vê hejmarê li derveyî welatê Tîmorê hat bikaranîn, nexasim ji bo fînansekirina leşkerên RNYyê. Ji % 15ê wê jî, ji "pisporên"biyanî re hatin veqetandin ên ku hatinîya wan a salê dikaribû ji 400 000 dolarî bibihure (3), bêyî ku ew karibin kadroyên hêremî perwerde bikin. Sedema wê jî bêkêrîya wan di warê zimannasîyê û di warê fêmkirina çarçoveya herêmê de bû. (4)

Bi ser de jî yekem plana pêşvebirinê ku di sala 2002ê de, li gorî pêşniyarên van pisporan hatibû amadekirin, daxwazên neolîberalan dubare dikirin: taybetîkirina aborîyê, vekirina wê li veberhênanên ji derveyî welêt, xurtkirina sektora fînansê, hêsankirina karûbarên îdarî, handana hêzeke kar a "bi dîsîplîn bûyî" (5)…hin kadroyên RNYyê êdî li xwe mikur tên ku ev tedbîr ne li gorî pêdivîya welêt bûn û bûne sedema gurbûna nerazîbûnê tevî ku meaş û alikarîyên aborî ku soza wan hatibû dayîn nehatin razandin, di sektora taybet de û herweha di ya dewlêtê de kêm derfetên kar hatin afirandin. Li welatekî wêranbûyî ku hêvîyên mezin ji serxwebûnê dikirin, ev bibinketin bû sedema derketina holê ya krîzeke siyasî. Krîza siyasî bi komkirina îmzeyan ji alîyê beşeke arteşê ve ku bi eslê xwe ji rojavayê welêt bûn, destpêkir. Li gorî leşkerên ku bi eslê xwe ji rojhilatê welêt in, wan xwe weke mexdûrên newekhevîyê hîs dikir. Ev alozî bi gewde bû, li welêt belav bû û desthilatî neçar kir ku di nîsana 2006ê de bang li hêzên navneteweyî bike daku vegerin Tîmorê. Ev alozî di sibata 2008ê de, piştî cot-darbeya biserneketî bi dawî bû; grûba îmze kom dikirin ev cot-darbe li dijî serokkomar **Ramos-Horta** û serokwezir **Gusmão** pêkanîbû.

Ber bi aşbûneke bi Îndonezyayê re

Vê rewşê kir ku di sala 2011ê de, enstîtuya amerîkî ***The Fund for Peace*** welatê Tîmor-Leste bixe lîsteya xwe ya welatên binketî (Failed States), Tîmor-Leste piştî Koreya Bakur (6) di rêza 23yê de cîh digire lêbelê tu eleqeya wê bi Koreyê re tuneye. Ew ne tenê welatekî xwedî pirhejmara partîyan e, bi ser de jî jin ji % 32yê parlemana wê pêktînin, ev rewşeke ku ji piraniya welatên cîhanê baştir e. Di navbera 1999 û 2010ê de dirêjîya temenê navînî ku 56 sal bû, gihişt 62,5 salan û rejêya xwendebûnê ya ji % 40 bû, bû ji % 50. Hilberandina Hundir a Nesafî (HHN) ya ku serê şexs 330 dolar bû gihişt 5300 dolarî. Li gorî statîstîkên navneteweyî ji sedî 40 heta ji sedî 50yê welatiyên wê di bin sînorê xizanîyê de dijîn, lê mirov dikare bi hêsanî li ber vê hejmarê rabe, lewra ji ¾ welatîyên wê debara xwe bi awayê cotkarîyeke bê pere dikin ku têrî wan dike. Bi ser de jî, dewlet hewl dide bi subvansi-yonan piştigirtiyê bide hilberandi-na berhemên bingehîn, perwerde û tendûrûstiyê, nexasim bi saya dibistana belaş û bi avakirina şe-bekeyeke dîspanseran [cihê mirov dikare belaş muayene bibe, tedavî bibe û aşî bibe; nota wergêr].

Gihiştina armancê zehmet e, lewra hejmara welatîyên wê di sala 2050yê de wê bêhtirî du qatan zêdetir bibe. Hukûmeta Gusmão di sala 2011ê de planeke bipêşketinê ku divê di sala 2030ê de bi dawî bibe, da destpêkirin da ku karibe li hemberî vê guhertina mezin piştrast bisekine. Bi saya hatinîya ji petrolê, fonek hat avakirin ku di sala 2012ê de bi qasî 10 milyar dolar berhev kirin. Lebelê rezervên petrolê yên tesbîtkirî biqasî 40 salan emrê wan heye, ev jî dibe sedema pêdivîya bi cihêrengkirina aborîyê ku heta niha ji sedî 90ê xwe dispêre petrol û gaza xwezayî. Tevî ku çavkanîyên wê bala Awustralya û ya Çînê dikşînin jî, da ku ku bigihîje vê armancê, wê lazim be welat xwe di nav aborîya cihanê de bi cîh bike.

Tevî ku dagirkerê kevin yê Tîmorê li ciddîyeta jirêderketinên xwe mi-kur nehat û rêxistinên navneteweyî hê jî daxwaza xwe ya avakirina da-dgeheke navneteweyî didomînin, têkîliyên wê bi Endonezyayê re aş bûne. (7) Komisiyoneke bi navê "ya rastî û dostanîyê" di sala 2008ê de ev têkîlî aş kirin. Piştgirtiya ku Îndonezya dide daxwaza Tîmor-Leste ya endametiya Rêxistina Welatên Asyaya Başûr-Rojhilat (Asean) û tevlîbûna serokkomarên Endonezyayê û Portekîzê li bîranî-na dehem salvegera serxwebûna Timorê, nîşanên erênî ne.

* Dersdar e li Zanîngeha Toulouse-Le Mirail, endamê Enstîtuya Lêkolînên Asyayî, nivîskarê *Timor-Leste, premier Etat du 3e millénaire / Tîmor-Leste, yekem dewleta hezarsala sêyem*, Belin, coll. "Asie plurielle", Parîs, 2011.

1 AFP, 16 nîsana 2012ê.

2 Geoffrey Gunn û Reyko Huang, *New Nation : United Nations Peace-Building in East Timor / Neteweke nû: Li Tîmora Rojava Avakirina Aşitîyê ji alîyê Netewên Yekbûyî ve),* Tipografia, Macao, 2006.

3 The Australian /Awustralyayî), 20ê gulana 2009ê, di *Courrier International*de, hejmar 968.

4 *Timor-Leste en quête de repères, perspectives économico-politiques 1999-2050 / Tîmor-Leste li îstîqrarê digere, perspektîfên aborî û siyasî 1999-2050*, Irasec- Arkuiris, Bangkok-Toulouse, 2008.

5 Planning Commission, *East Timor National Plan / Plana neteweyî ya Timora Rojava,* 2002.

6 www.fundforpeace.org/global/

7 Nivîsa li jêr bixwîne; Angela Robson, "Au Timor, des amnisties qui divisent / li Tîmor, efûyên ku parçe parçe dikin", *Le Monde diplomatique,* décembre 2008.

Wergera ji fransî: Feryal Guladawiya

PÊŞANGEH

Hemû hunerhez vexwendî ne !

Tabloyên Hasan Hüseyin Deveci û wênesazên din dê bêne pêşkêş kirin !

12 Tebax 2012

www.hhdeveci.de

www.galeriebb.de

Axaftina vekirinê : Dîrokzanê hunêr û kûrator: Dr.Angelika Euchner

Cîh: Galerie Berlin – Baku, Gr0ßgörschenstrasse 7, 10827 Berlin

Veguhêzî: U-Bahn:U7 Kleistpark – S-Bahn:Yorckstraße – Bus:M48, 106, 187, 204, M19

Tarîx: 12ê Tebaxê saet 18:00, Pêşangeh dê ji 12ê Tebaxê heta 9ê Êlûnê berdewam bike.

Tevî daxuyaniyên serketinê jî, Lîbya hê pirr dûr e ji jiyana rojên aram. Bi tenê hilberandina petrolê ya ku şirketên biyanî misoger dikin, gihiştiye asta xwe ya beriya bombebaranê. Meclîsa Damezrêner a ku 7 Tîrmehê hat hilbijartin wê di nava hewayekê de bixebite ya ku şerên di navbera eşîran de û zexmkirina hêz û desthilatdariya mezinên eşîran mohra xwe lê dixin.

Neh mehên şerê navxweyî yê nepenî

Hilbijartinên Libyayê li ser hîmê alozîyê

Patrick Haimzadeh *

Di 20ê hezîranê de, milîsên ***Zîntan*** û ***Meşaşîya*** li derdora bajarê ***Şegîgayê*** (*Cheguiga*) li herêma Lîbya Cebel Nefûsayê ji sê rojan û vir ve şerê hev dikin. Milîsên Zîntan endamên eşîrekê ne ku li dijî Muamer Qedafî serhildanê bi rê ve bir, milîsên *Meşaşîya* bi xwe destek didan lîderê ku di çiriya pêşî ya 2011ê de hat qetilkirin. Serekeşîrê karîzmatîk ê Zîntanan **Muxtar el-Exder** kelecanên şer ji nû ve hîs dike. (1) Tevî ku bi awayekî sivik birîndar e jî, wî wezîfeya xwe ya weke serfermandar ji nû ve bi cih kir.

Li benda dawî ya êrîşê, li gundê piçûk ê bi navê El-Ewînîye yê ku şênîyên wê yên meşaşî ew terikandine, riya ber bi bajêr ve hatiye girtin. Bi tenê destûra şervanên Zîntan û ***pick-up***ên wan ên bi topên dijbalafir an jî roketavêjan bi sîlehên giran gurçûpêçkirî ne, dikarin bibihurin; ew jî di ber ambulansan re dibuhirin ku birîndaran ji bajêr derxin. Sedema şer zêde zelal nîne. Zîntanî Meşaşîyan bi kuştina zilamekî xwe di kemînekê de ku bi alîkariya kevne-efserên qedafîparêz hatiye danîn gunehbar dikin. Birîndarên bereya dijber ên li nexweşxaneya Xariyan îdîa dikin ku ew mexdûrên operasyonekê ne ku armanca wê ew e ku wan ji ser erdên wan bikin der, çawa ku di Tîrmeha 2011ê de anîn serê Tawurxa; hingê çil hezar şênîyên bajêr, ên ku şênîyên Misrata ew weke alîkarên eskerên qedafîparêz didîtin, ji bajêr hatin derxistin û xanîyên wan bi awayekî sîstematîk hatin rûxandin.

Wezîrê parastinê **Ûsama el-Cuweylî** û fermandarê herêma eskerî ya Rojava mîralay **Muxtar el-Fernana** li devera operasyonan amade ne, ev jî dikare bike ku mirov bawer bike ku tevlîbûneke rayedarên fermî yên Lîbyayê ji bo çareserkirina ixtîlafê heye. Lê belê ev efser berîya her tiştî ji Zîntanan in: ango ew hem dadger in û hem jî alî. Li gorî senaryoyeke baş bicihkirî, awayê fermî yê ku çapemenîya Trablusê jî weşandî, wê bibe operasyoneke dilsozên rejîma kevin yan jî endamên "stûneke pêncan" a li dijî şoreşa 17ê sibatê birêvebirî. Piştî şerê heşt rojan weke her car dîsa heyetên rûsipî û zaneyên bajarên din (Misrata, Sîrenaîk) wê karibin agirbestekê pêk bînin**.** Bîlançoya demî di ser sed kuştî û pêncsed birîndarî re ye. Bi ser de jî di navbera herdu eşîran de hê tu tişt safî nebûye, nehatîye çareserkirin, ango mirov nikare bibêje ku bûyerên şîddetê wê careke din rû nedin.

Dawîya şerê navxweyî bi fermî 23yê çirîya pêşîn a 2011ê ye, bi rasthatina wê rojê hingê serokkomarê fransî **Nicolas Sarkozy** û serokwezîrê brîtanî **David Cameron** daxuyanîyên serketinê dabûn, ji bo herduyan jî destwerdaneke eskerî ya di bin hamîtîya Rêxistina Peymana Bakurê Atlantîkê (NATO) yekane rê bû ji bo parastina xelkê sivîl û çareserkirina krîza li Lîbyayê. Ji hingê ve şerên di navbera milîs û eşîran de li herêma Trablûsê û başûrê welêt qet nesekinîn. Li deverên bejahî û gundan sedem bi giştî alozîyên di navbera eşîran de ne ku koka wan gelek caran heta bi serdema osmanî diçe. Qedafî di tevahîya serdema hukmê xwe de xwe sipart van dijminahîyan da ku desthilatdarîya xwe bi cih bike, ji bo vê bike jî carinan hiyerarşîyên ji rêûresmê serûbinîhev kirin bi riya ku erd yan jî hêz da eşîrên piçûk ên xizantir yan jî xwedîyê prestîjeke kêmtir: Meşaşîyên ku di destpêkê de li herêma çolî ya başurê welêt bûn, sala 1978ê anîn ser erdên zozan ên ku berê yên Zîntanan bûn.

Qelşa di navbera alîgir û dijberên Qedafî di çarçoveyekê de dide der ku tê de alî hemû zêde çekdarî ne û êdî dewletek nîne ku karibe îxtîlafan çareser bike. Li bajar û herêmên li ser sînor, gelek caran şer diqewimin li ser kontrola qaçaxçîtiya her tiştî, ku ji ber nebûna avahîya dewletekê niha geş dibe. Tehlûke mezin e ku ji bo demeke dirêj aborîyeke mafyawarî li wir bi cih bibe, ev aborîya mafyawarî di dema şerê navxweyî de bi pêş ket û bi xwe jî dewama şîddetê teşwîq dike.

Riya du saetan ji wir dûr, xuya ye şerên li ***Şegîgayê*** ne xema şênîyên Trablûsê ne, şerên din ên ji destpêka hezîranê li Kufraya 1500 kîlometreyan dûrî paytextê – her ji nû ve diqewimin – jî. Pankartên milîsên ku paytext feth kirin, li kêleka karîkatûrên "rêberê" rehmetî û nivîsên ser dîwaran bangê li welatîyan dikin ku 7ê tîrmehê tevlî yekem hilbijartinên Lîbyayê bibin.

Armanca sembolîk a dixwazin bigihêjinê mezin e: Mesele hilbijartina Meclîseke Damezrêner a bi dused endaman e, ya ku wê şûna Konseya Neteweyî ya Demî (KND) weke sazîya nûnerîya gelê Lîbyayê bigire. Ev meclîs wê hukûmeta nû hilbijêre û destûra bingehîn a siberojê binivîse û ev destûr wê paşê ji bo erêkirinê bikeve ber referandûmê. Xelkê welêt bêsebir li benda vê dengdanê ye, welatî xwe bi awayekî girseyî li lîsteyên hilbijêran qeyd dikin (2.7 milyon kesî xwe li lîsteyan qeyd kir, ji 3.4 milyon kesên ku temenê wan têra dengdanê dike).

Herçî plana lojîstîkê ye bi xwe, xuya ye rewş baş e. Kartên hilbijêran hatin belavkirin û buroyên dengdanê bi alîkarîya pisporên Neteweyên Yekbûyî hatin organîzekirin. Encamên hilbijartinê yên ku bi awayekî fermî li ser bingehê serjimara dawî ya sala 2006ê hat amadekirin, heta niha ji bilî xelkê Sîrenaîkê kes li ber ranebûye; xelkê Sîrenaîkê herêma xwe weke mexdûr dibîne.

Di Meclîsa Damezrêner de divê sed û bîst parlementerên serbixwe hebin, ku wê ji nava çar hezar namzetên ketina wan a hilbijartinan hatîye diyarkirin, werin bijartin. Û heştê parlementerên din jî wê ji nava lîsteyekê bi rêya sîstema hilbijartina proporsiyonel [her partî hejmarek namzet ên li ser lîsteyekê qeydkirî li gorî hejmara dengan a ku partîyê bi dest xistiye, dixe parlemanê; nota wergêr] werin hilbijartin û qederê sêsed û heftê partîyên fermî ketine reqabeta hilbijartinê ev lîste amade kirine. Tewazûna hêzê di warê rêxistin, navgîn û bîrewerbûna siyasî de meyildarê partîyên nêzî Birayên Misilman e, û nexasim ji nav wan nêzî diduyan e: Partiya Dad û Avahiyê (*hizb ul-edale we-l- bîna*) ya **Muhemed Hesen Sawan** ê ku di dema rejîma berê de ji ber endametiya Birayên Misilman bi girtîgehê hatibû cezakirin û Partîya Netewe (*hizb ul-weten*) ya ku cîhadperestê poşman Abdilhekîm Belhac – di Tîrmeha 2011ê de walîyê xwe bi xwe wezîfedarkirî yê Trablûsê bû – yek ji endamên wê yê damezrêner e. Tê gotin ku ew alîkarîyeke malî û rêxistinî ya girîng ji Qetarê werdigire.

Li vir partîyên sereke yên ne îslamî weke "lîberal" – maneya wê qet jî ne ew e ku yên din li ber îdeolojîya aborî ya neolîberal radibin a ku herkes li welêt qebûl dike. Ya herî navdar *Hevgirtina Hêzên Neteweyî* (*tahalûf el-quwwe el-weteniyye*) ya **Mahmûd Cibrîl** e. Kevne-hevkarê **Seyf el-Îslam Qedafî** ango kurê duyem ê dîktator e, para wî heye di lîberalkirina aborîya welêt a salên 2000î de. Ev karsazê dewlemend bi yek ji endamên damezrêner ê KNDê Mustefa Abdilcelîl re bû. Mustefa Abdilcelîl di dema şerê navxweyî de yek ji muxatebên bi îmtiyaz ên Nicolas Sarkozy û Bernard-Henri Lévy bû. Mirov herweha ji bo herêma rojhilat hebûna Partîya Bereya Neteweyî (*hizb el-cebhe el-weteniyye*) jî dibîne, ev navê nû yê Partiya Bereya Neteweyî ya Silametê ye ku sala 1981ê li Meliktiya Yekbûyî li derveyî welêt ji alîyê Muhemed Yûsif Mexeriyef ve hatibû damezrandin.

Erê piranîyeke welatîyên Lîbyayê (bêyî ku heta beriya hilbijartinan bi du hefteyan haya wan ji nasnameya namzetên li herêma wan a hilbijartinê hebe) elaqedarî vê dengdanê ne, lê belê zilamên ku li her bajarî, di nava her eşîr yan jî taxa paytextê de xwedîyê hêza sîlehan in, naxwazin tu perpirsiyarîyê bigirin ser xwe. Encama dengdanê çi dibe bila bibe, tehlûke heye ku desthilatdarîya bi rastî di destê xwedîyên yekdestdarîya şîddetê de be û ev jiyana siyasî ya nû pêk tê jî qet ne li gorî berjewendîya wan e. Di nava wan de kevne-efserên artêşê yên weke mîralay Salim Coha li Misratayê yan jî mîralay Waar Benî Walid kevne-berpirsiyarên rejîma kevin ên ku zû di nava refên şoreşê de cihê xwe girtin, yên weke Abdelmecîd Miliqta li Trablûsê û kevne-sivîlên di dema şer de bi şervanîyê derketin pêş hene.

Li sêyem bajarê mezin ê welêt Misratayê ku lê ne kêmtirî dused û pêncî komên milîs hene û nufûsa wî çarsed û pêncî hezar e, mirovê herî zêde rêz jêre tê girtin û bi îhtîmaleke mezin yê herî zêde xwedî bandor Coha ye. Di dema şer de wî konseya eskerî ya bajêr bi rê ve dibir. Tevî ku bi awayekî fermî wî ji tevahîya erk û wezîfeyên fermî îstîfa jî kiriye, mêvanên xwe li lokalên luks ên Konseya Herêmî ya bajêr pêşwazî dike.

Mozaîkeke herêm û eşîran a ji herdemê bêhtir parçebûyî

Ew ji hingê ve ji bo ji nû ve wezîfedarkirina sîh hezar milîsên Misratayê dixebite, ku hin ji wan wê di bin fermana Konseya Bilind a Ewlekariyê ya bajêr de ku bi awayekî teorîk girêdayî wezareta karê hundir e û yên din jî wê di bin fermana baskên leka eskerî ya "mertalê Lîbyayê" (*Deraa Lîbya*) de werin wezîfedarkirin; "mertalê Lîbyayê – qet nebe li ser qaxetê girêdayî wezareta parastinê ye. Dema pirsa dildarîyên wî yên siyasî jê tê kirin, îdîa dike ku ew hez dike ji nû ve bibe "*welatiyekî Lîbyayê weke yên din, bi hewaya dikişîne hinavên xwe, ava vedixwe û gezek nanê dixwe ew razî ye.*" Coha ji bo van zilamên nû yên hêzdar ên ku di asta neteweyî de şansê wan kêm bû xwe ferz bikin, lê belê wê xwediyê rewabûn û hêzeke reel bin ku bi gelekî ji ya teknokratên nayên nasîn ên li gorî pîvanên rûmeta nîşandayî û jêhatîbûna wan di warê birêveberîyê de hatî hilbiajrtin, bêhtir e.

Ji bo ku desthilatdarîya xwe rewa bikin, ev lîderên şer ên herêmî hemû bûne serekên yekîtîyên ku yekane xala wan a hevpar bikaranîna peyva efsûnî *thûwar* (pirhejmara *tha'îr* ku maneya wê "şoreşger" e) e. Li tevahîya bajarên mezin mirov rastî pir zêde yekîtî, civat, koalîsyon, konsey, komeleyan tê ku bi dengekî bilind dibêjin armanca wan bergirîya tevahîya *thûwar*ên Lîbyayê ye, lê belê di rastîyê de ew bi tenê nûnerîya yên bajarê xwe heta weke li Trablûsê ya çend taxan dikin.

Ji bo el-Exdar ê ku endamê Civata *Thouwar*ên Lîbyayê (*tecemmû thûwar Lîbya*) ye, çêtir e mirov serhildêrên bi rastî, yên destpêkê yên ku bi xwe di nava xwe de li şervan û neşervanan dabeş dibin û yên paşê ku navê "*thûwar*ên spreyê" (*thûwar el-baxaxa*) li wan tê kirin ji hev cihê bike, lewra rola wan bi tenê ew bû ku dema Trablûs ket, sloganên şoreşgerî li ser dîwaran xêz bikin. Li gorî wan ev "bergirîya şoreşê" ye; di rastîyê de ev ji xwe çêkirina hêzeke dijberê saziyên ku wê di encama hilbijartinan de derkevin holê ye.

Tevî ku KNDê lihevbihurîn û lihevkirina neteweyî kire yek ji sloganên xwe jî, diyar e ku ev yek zehmet e. Tecrûbeya girtîgehê ya modela Misratayê tevî ku di asta neteweyî de bûye dîrok jî hêja ye ku mirov behsa wê bike. Li vî bajarê ku kulta şehîdan pêk tîne û bi piranî tevahîya fikra lêborînê red dike, birêveberê girtîgehê **Fethî Abdesselam Dard** pê serfiraz e ku projeya xwe ya rehabîlîtasyonê bi îslama dijminên berê nîşanî mêvanên xwe bide. Bi awayekî eşkere dibêje ew selefîst e û tesîra *wehabîyan* li ser e, ew bi awayekî serbilind rîya (ridên) xwe ya dirêj nîşan dide û ji mêvanan tu tiştê girtîgeha xwe venaşêre. Di vê girtîgehê de heftsed û bîst û heşt kes hene, para bêhtir kevne-şervanên qedafîparêz in. Hema hema rîya hemûyan dirêj e û porê wan kurkirî ye. Ew pesnê birêveberê girtîgeha xwe didin, ew jî henekan bi hemûyan re dike û qet dudilî nabe û guh dide gazinên wan ên li ser filan û bêvan aliyê madî. Berevajî Birayên Misilman, bêyî dildariyên siyasî yên nîşandayî, selefî newekhevbûna xwe û cîhadîstan nîşan didin, cîhadîstên ku berpirsiyarîya êrîşên van hefteyên dawîyê li dijî berjewendiyên biyanî li rojhilatê welêt, lê belê her weha li Misratayê pêk hatin, girtin ser xwe.

Li pişt resmê fermî yê Lîbyayeke yekgirtî ya li ser rêya dewlemendî û demokrasiyê, yê ku KND û herweha serokwezîr û serokomarên welatên rojavayî yên di şer de cihê xwe girtin derdixin pêş, rastîyeke veşartî ye ku bêhtir fikaran bi mirovan re çêdike. A rastî, hê tu carî mozaîka herêman ewqasî parçebûyî xuya nedikir, li ewqas entîteyên feodal parçebûyî xuya dike û ev entîte xwediyê mezinê xwe û hêzên xwe yên eskerî yên xweser in. Heke pirsa avakirina dewletê û girêdana herêman bi netewe ve li navenda pirsgirêkê bin, hingê hê tu kes nabîne ka ev avahî wê çawa bi gewde bibe. Tehlûke heye ku ev rewşa "ne aştî, ne şerê navxweyî" bi asteke şîddeta ji ber mayî ya bilind dewam bike – bêguman ev ast wê ji ya li Iraqê ji dagirkerîya Amerîkayê ya sala 2003yê û vir ve dayî der kêmtir be, lê belê ji bo siberojê ewqasî dibe sedema fikaran.

Bazara jinûveavakirina welêt a ku li gorî texmînan di nava bîst salan de 200 milyar dolar wê lê biçin, dibe ku ji bo şirketên biyanî ji ya dihat texmînkirin zehmettir be. Wekî din şirketên petrolê yên ku dest bi îstîfadekirina ji îmtiyazên berîya şer dayî wan kirin, şirketên ewlekarîyê û yên eskerî yên taybet – ji wan bêhtirî dehan bi tenê ji bo Fransayê, ji niha ve hazir in – xwedîyê perspektîfên karên girîng in. Vê hemûyê jî bi pereyên "gelê Lîbyayê" yê ku NATOyê li ser navê wî şer kir, dikin.

* Kevnedîplomatê fransî li Trablûsê (2001-2004), nivîskarê berhema bi navê *Au coeur de la Libye de Kadhafi / Di nava Lîbyaya Qedafî de,* Jean-Claude Lattès, Parîs, 2011.

(1) Gotara "Qui a gagné la guerre en Libye? / Kî di şerê li Lîbayayê de bi ser ket", *Le Monde diplomatique,* kanûna 2011ê.

Wergera ji fransî: Luqman Guldivê



AGNÈS STIENNE

Li Urdunê qralîyeteke her ku diçe bêhtir li ber tê rabûn

Hana Jaber *

Li Ammanê jî gotin azad dibe. Li taxa Lweibdeh, Nadir ê ku xwedîyê tavernayekê ye, loqantevanekî asayî nîne: ew şanogerekî qebûlbûyî ye. "*Binêrin rewşa çandê li vir ev e: ez servîsa coşarî* [xwarineke gelêrî ya Misirî ye] *dikim da ku karibim şanogeriyê bikim.*" Di şanoyê de kelecan û zindîtî heye. Di nava mijarên guftûgoyê de lîstika şanoyê ya ku henekê xwe bi axaftinên kevne-serokdewletê Tûnisê **Zeynel Abidîn Bin Elî** dike ya bi navê *êdî min ji we fêm kir* heye. Qral Abdullahê duyem bi xwe jî lê temaşe kir. Ji Nadir re dibêjin "*wî vexwîne xwarina coşarîyekê, hingê tu dikarî wî qaneh bikî!*"

Dijberên desthilatdarîya Haşimî yên herî wiredar hez dikin pêş bibînin ku "*qraltîyê bi Abdullah dest pê kir û wê bi Abdullah bi dawî bibe*" (1), tevî ku zivistana 1999ê wan bûyerên girîng ên tacîdarbûna Abdullahê Duyem yê Urdunê piştî mirina bavê wî qral Huseyîn şopandin. Ev peyva jor çêl li kuştina damezrênerê qraltîya Abdullahê Yekem bavê Huseyîn a di sala 1951ê de dike. Di vê dema şoreşên ereb de ev peyv weke pêşdîtineke xirab tê bilêvkirin, tevî ku civak bi dehsalan di nava kaoseke têra xwe mezin de bû, hevgirtina xwe parast.

Divê mirov bibêje dîroka Qral Abdullahê Duyem bi gelê wî re dîroka ji hev heznekirineke ragihandî ye. Ji tacîdarkirina wî û vir ve, ya ku mirov dibînin bi tenê perwerdeya wî ya zêde brîtanî, nêzîknebûna wî ya bi gel re, axaftinên wî yên ji netewe re texlîtên yên Bankeya Cîhanê yan jî Qesra Spî ne... Helwestên wî yên alîgirê şer û gava wî ya li ser şopa gava George W. Bush a dema şerê li Iraqê yê sala 2003yê, hewldanên wî yên nêzîkbûna bi gelê wî re heba kirin. Li her deverî mirov dibihîse ku tê gotin "*Ev qral qet nizane ji me re, ji xelkê vî welatî re bipeyive; bi riya me ji amerîkîyan re dipeyive*".

Tesîra sloganên yekkir yên ku desthilatdarî wan derdixe pêş ên weke "Pêşî Urdun" û "Em hemû Urdun in" bi kêra qral nayên. Ji vê û wêdetir, gotegotên herî zirzop hene li ser bengînîya wî ya ji bo lîstikên qumarê û deynên wî yên pir zêde. Çi rast û çi şaş, ev gotegot ewqasî hatin gotin ku êdî civak wan weke rastîyê qebûl dike.

Nerehetî bi xwe ji şexsê qral û wê de diçe. Ji damezrandina qraltîyê ve dîrok her xwe dugîsnî dike: şerekî herêmî, şokeke demografîk, herikîneke nufûsê. Ev pêvajo sala 1948ê qewimî, bi şerê yekem ê îsraîlo-ereb, paşê bi dagirkirina Şerîaya Rojava û Rojhilatê Qudsê. Ev pêvajo sala 1967ê jî qewimî, dema ku Îsraîlê erdên wê dagir kir, wê erdên xwe ji dest dan û bi sedhezaran filistînî xwe avêtin Urdunê. Ev yek careke din qewimî dema ku sala 1990-1991ê Iraqê Kuwêyt dagir kir, şer qewimî û Mîrnişînên Erebî sedhezaran filistînî kirin der, ew jî revîyan. Û dema dagirkerîya amerîkî ya Iraqê ya sala 2003yê jî ev yek dîsa qewimî, lewra bi sedhezaran iraqî xwe spartin qraltiya Urdunê. Divê mirov "bûyerên" salên 1970-1971ê jî ji bîr neke, di van bûyeran de desthilatdarîya haşimî û berxwedana filistînî hatin dijberî hev. Her carê heman qeraseyên adaptasyonê hatin seferberkirin: ji jor ve bi alîkarîyên navneteweyî yên rojavayî yan jî ji Kendavê yên ku ji bo saxmayîna qraltîyê hewce; û ji jêr ve bi riya hevgirtinên malbatî û tevnên civakîbûnê û nêzîkatîya cografî ji bo mijîn û bêtesîrkirina bandorên rojane yên van rastîyên nû. Bi vî rengî peymana civakî jî roj bi roj tê nivîsandin di navbera tebeqeyên cihê yên xelkê welêt li alîyekî û li alîyê din di navbera civakê û desthilatdarîyê de.

Îro ev qerase asê mane. Ranta navneteweyî ya ku destûr dida qral Huseyîn ku bi cudatî û qelşên di nava xelkê welêt de bilîze, nexasim yên di nava hêmanên filistînî û urdunî de û pêşîyê li nerazîbûnên li başûrê welêt bigire, êdî zuwa bûye. Ranta ji petrolê ya ku ji bo beşeke mezin a civakê – ango ji bo filistînîyan – alîkarîyên koçberên çûyî Kendavê misoger dikir êdî nema, lewra li şûna karkerên ereb ên asyayî tên xebitandin. Arizîkirina bêsînor, nexasim a sektorên avê, telekomunîkasyonê û elektrîkê, afirandina qadên serbest li gelek herêmên welêt kirin ku jiyan buhatir bibe, hêza kar a herêmî ji cihê xwe were kirin û li şûna wê karkerên biyanî yên heqdestê kêmtir didan wan hatin bicihkirin. Ji 2003yê ve herikîna nekontrolkirî ya sermayeyên li milk – ê ku buhayên wê her zêde dibin – razandî kir ku çîna navîn were perçiqandin, derdora paytextê were marjînalkirin da ku bi kêrî paytexteke zêdeyî hedê xwe mezinbûyî were.

Gewdeyê civakê ji gelek parçeyan pêk tê. Û nerazîbûn û nerehetî li benda bihara erebî nema ji bo ku belav bibe yan jî xwe îfade bike. Sala 1989ê raperîneke li Maanê rûdayî û li seranserê welêt belavbûyî kir ku qanûna şer betal bibe û hilbijartinên giştî û herêmî werin organîzekirin. Dîsa ev heman nerehetî ye ku ji çend salan û vir ve û tevî sansurê, dike ku bi awayekî birêkûpêk bûyerên bertîlxwarinê eşkere bibin. Ya herî nû – hukûmetê erdên Hajaya yên ku bi awayekî kolektîf milkê eşîra bi heman navî ne, desteser kirin û li ser navê karmendên qrêl qeydkirin ji bo "hêsankirina ji nû ve veberhênanê" – her dîwana qrêl aciz kir û bû sedema rabûna hêrsa gel.

Başûrê welêt, nexasim jî sêgoşeya Tafileh-Kerak-Maanê dema desthilatdarîya haşimî ew stend veguherî kelema çavê wê. Du kolektîfên sereke, Meclîsa 36 eşîran û Înîsiyatîfa Neteweyî li wir çalak in: civîn, xwepêşandan, pevçûnên bi hêzên nîzamê re, bi girtîgehê cezakirina sûcê heqareta li qrêl... Doza sereke ya Meclîsa 36 eşîran a ku ji dewletê dixwaze erdên Hajayayê li xwedîyê wan vegerîne; bersiveke li dîwana qrêl layiqî wan tê dîtin muameleyeke rûmetşikên a bi eşîran re ye; çalakgerekî ji Tafilehê weha şîrove dike: "*Îro, ji bo gilîyekî, serekeşîrek divê li dîwanê bikeve dorê. Di dema qral Huseyîn de ew bi piçûkxistinên bi vî rengî re rûbirû nedima*."

Li alîyê xwe Înîsîyatîfa Neteweyî, mîrasgira neteweperestîya erebî, xwe disipêre sloganên civakî û daxwazên zêdekirina mûçeyan: grevên dersdaran, karmendên posteyê û hwd. Li dijî siyasetên neolîberal, karkerên Şirketa Kaliyûmkarbonatê ya Derya Mirî seferber dibin da pêşîyê lê bigirin ku fabrîkeya wan bifiroşin kanadayîyan; parêzer û endamê kollektîfê Waddah dibêje: "*Qada serbest a Aqabayê diviyabû bi kêrî me bihata: hîç jî bi kêrî me nehat. Niha dixwazin vê devera ku –tevî artêşê – cihê navendî yê kar e ji bo şênîyên Kêrakê, bi buhayekî erzan ji destê xwe derxin. Ma kî wê pêşîyê li fabrîkeya kanadayî bigire ku li şûna yên me karkerên asyayî bigire kar?*"

Li bakur, hêrsa eşîran û dijminatiya dîrokî ya beşeke ji malbatên urdunî li hemberî haşimîyan li giranîya Birayên Misilman û ya xelkê filistînî zêde dibe.

Bûyereke balkêş e, taxên xizan ên ku piranîya şênîyên wan filistînî ne û nexasim jî wargehên penaberan aram in. Jinek di nava axaftinê de kurt û kurmancî dibêje: "*Qet nebe carekê urdunî di nava xwe de bi hev diçin û tu elaqeya vê bi filistînîyan re nîne*". Li vir mirov temaşevanên dîrokekê ne ku ne ya wan e. Ji nêz ve, pirdîqet, rexnegir lêbelê serî jêre tewandî ew wê dişopînin. Dema zexta li Sûrîyê li ber zextên îsraîlî yên li Xezayê digirin, ew bi wekaletên li Tûnis û Misrê xwe serketî his dikin. Hêrsa **Abû Anas** radibe: "*ev xirabtir e: Beşar miletê xwe bi xwe qetil dike*"; birayê wî Abû Omar bixwe di nava vê serûbinîhevbûnê de li destê veşartî yê Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê digere: "*ev çi ye, ev şoreş yan jî muxalefet desteka Qetarê distîne û fermanên ji Washingtonê?*"

Dîsa jî mesafeyek dikeve navbera xelkê û rêxistinên siyasî yên serdest. Mirov henekê xwe dikin bi tevahî guhertina fikrê ya birêveberê Hamasa filistînî Xalid Meşaal a der barê raperîna li Sûrîyeyê de. Wî pêşî dilsozîya xwe ya bi rejîma Sûrîyeyê re dabû zanîn, çawa gihişte Qetarê xwe ji rejîmê dûr xist û hate ser xeta Birayên Misilman. Bi heman awayî, piştî serdana qral Haşimî ya Washingtonê, çileya 2012ê hevdîtina di navbera Meşaal, wezîfedarekî taybet ê Qetarê û qral Abdullahê Duyem de dibe sedema spekulasyonên li ser bicihkirineke vebirrî ya penaberên filistînî li Urdunê, ya ku wê vê yekê fînanse jî bike wê Doha be; Abû Omar vê dipirsê "*ma mirov wê hêvîya çi ji lîderekî siyasî bike yê ku piştî hevdîtina bi emîrê Qetarê û qralê Urdunê re, ji Sûrîyeyê veqetîya da ku vegere Xezayê?*".

Birayên Misilman li alîyê xwe hewl didin nerazîbûna li kolanan bigirin da ku weke aktorên siyasî yên dest ji wan nabe cih ji xwe re diyar bikin, ev jî bêyî pevçûn nabe û ev pevçûn ne bi tenê bi hukûmetê re ye, lê belê herweha bi eşîran (pevçûna kanûna 2011ê li Mafraqê bi eşîra Benî Hesen re) û kolektîfên din ên muxalif re ye jî. Hêrsa rojnamevanê nêzî kolektîfa Înîsîyatîfa Neteweyî yê bi navê Xelîl radibe: "*Ev ne mirovên bawerî bi wan bêne. Ew radihêjin daxwazên gel û li ser navê gel dipeyivin, paşê bernameyeke cuda li ser wî ferz dikin. Em civîneke protestoyî li pêşîya wezareta karên hundir organîze dikin: ew heman rojê li pêşîya sefareta Sûrîyê civînekê organîze dikin... Dema dixwazin tevgera nerazîbûnê bikin malê xwe, ew wê hildiweşînin. Û bi ser de jî, heke sedem ew e ku îslamîst bibin desthilatdar, na me navê, mala we ava!*" Parêzerekî qederê çil salî ye Assem, ew bi xwe bi awirekî din li rewşê dinêre: "*Ez îslamîstan baş nas dikim: bavê min yek ji wan bû. Li Urdunê dîroka wan ne weke ya li welatên din e. Ew timî girêdayî desthilatdarîyê bûn, wê jî xwe disipart wan; û girîngîyeke wan a herêmî û navneteweyî heye, ya muxalefeta lîberal bi xwe nîne. Bi ser de jî ew neçar in ji gelek beşan pêk werin. Heke pêk neyînin û bi ser nexin hingê mirov wê wan bike der; ma pirsgirêk di ku dera vê de heye?*"

Lê belê coş û peroşa giştî û nîqaşên li ser paşerojê dikarin dudilîyan veşêrin. Diyar e, kolektîfa Monarşîya Destûrî ye ya ku herî zêde bîra tehlûkeya herî mezin a li pêşîya qraltîyê dibe: tehlûkeya jihevdeketinê. Cemal endamekî wê yê damezrêner e tevî sê eskerên paye bilind; ji çend salan û vir ve di navbera wî û rejîmê de gelek devjenî û pevçûnan rûda. Ew li seranserê qraltîyê gerîya, hevdîtin çêkirin bi tevahîya kolektîfan, serekeşîran, aktorên xwedî bandor yên di qada siyasî ya neteweyî û heta navneteweyî de da ku wan li ser fikra ji nû ve nivîsandina destûra bingehîn li gorî modela monarşîya brîtanî bike yek; li gorî vê modelê parleman hukûmetê diyar dike û ne qral. "*Ji bo parastina welêt tu riyên din nînin. Divê mirov derfetê bide xelkê da ku li ser çarenûsa xwe biryarê bide. Paşê pirsên din wê bên. Her çareserîya din wê pir buha be û berdêla wê giran be. Li gorî ku êdî hez ji haşimîyan jî nayê kirin û li gorî ku wî dora xwe ji malbata xwe xalî jî kiriye, di rastîyê de hema hema ne mumkin e ku birayekî wî bikeve şûna wî... Komarek, ji bo çi? Fikra jiyana li qraltîyekê dilê xelkê welêt rehet û ewle dike. Berê xwe bidinê, binêrin li komaran çi diqewime, li Sûrîye û li Yemenê...*"

Di vê navberê de qral bi xwe diyar e haya wî ji girîngîya rewşê nîne. Ew dereng dimîne di bicihanîna reformên soza wan dayî de, bi awayekî birêkûpêk serokwezîr diguherîne û dema vê dike jî der barê mijara rahiştina dosyaya bertîlxwarinê de ya ku hukûmet, parleman û dadgerî ji hev re diavêjin, yê berîya wî bi bêkêrî û nejêhatîbûnê gunehbar dike. Ew demê dirêj dike û li xwe dibihurîne, dema vê dike jî bi serê çavan jî her lê dinêre ka wê çarenûsa rejîma Sûrîyeyê bibe çi. Di vê demê de buhayê benzîn û elektrîkê jî pir zêde dibe.

Di dema xwepêşandanên pêşî de qehwe didan xwepêşandêran, êdî ev nema: niha êdî bersiv a hêzên ewlekarîyê ye. 25ê adara 2011ê li Amanê, hêzên nîzamê protestovan dan ber derbên copan û heta bi nava nexweşxaneyan dan dû wan. Di çiriya paşîn a 2011ê de bûyer li Ramthayê qewimîn; zor û zext dijwar in. Ji hingê ve navgînên destwerdanê tuntir in. Behsa mezinkirineke zêde ya hejmara cendermeyan tê kirin, sedema wê jî tepisandina protesto û pevçûnan e. Manevrayên eskerî yên gulana derbasbûyî yên bi Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê û panzdeh neteweyên din re yên bi navê Eager Lion nîşandaneke hêzê ya lêzêdekirî ye. Mirov herweha behsa cihêkirinên bingehîn di navbera artêşê û îstîxbarata giştî de dike, ev jî bi kêrî guhertinekê tên. Mirov dipeyivin û dipeyivin... Lê belê gelo hê nehatîye fêmkirin ku soz di demeke nêz de êdî wê bawerîyê bi xwe neyînin?

* Lêkolînera girêdayî kursîya Dîroka Roja me ya Cîhana Erebî li Collège de France, Parîs.

(1) Haşimî malbatek e ku ji Hîcazê hatiye û brîtaniyan ew piştî Şerê Cîhanê yê Yekemîn li Urdun û li Iraqê li ser text rûnand, wê li wir qraltîyek damezrand (1929-1958).

Wergera ji fransî: Luqman Guldivê

Gulana 1946ê. Dawîya mandaya brîtanî. Serxwebûna qraletîya Haşimî ya Urdunê. Abdullah weke qral hat îlankirin.

1948. Fetihkirina Şerîa Rojava, ev dever wê îlhaqî qraltîyê bibûya. Penaberên filistînî pêl bi pêl hatin.

1967. Şerê Îsraîl û Ereban ê hezîranê. Îsraîlê Şerîa Rojava fetih kir û bû sedema pêleke din a penaberan ber bi qraletîyê ve.

1970-1971. "Îlona Reş": pelixandin û paşê jî derxistina der a tevgerên çekdarî yên filistînî.

1989. Raperîna li Maanê ya meha nîsanê. Li tevahiya welêt belav dibe. Ceribandina azadîya siyasî.

1990-1991. Iraq Kuweytê dagir dike. Qral Huseyîn destekê dide Sedam Huseyin. Mîrnişînên Ereb filistînîyan dikin der; filistînî li Urdunê bi cih dibin.

1999. Qral Huseyin dimire. Kurê wî Abdullahê Duyem weke xelefê wî dikeve şûna wî.

2003. Abdullahê Duyem destekê dide dagirkirina Iraqê bi destê Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê.

2011. Ji sibatê ve muxalefet banga xwepêşandanan dike. Li Amanê destpêka zextên li dijî xwepêşandanan, adarê dest pê dikin.

www.kurdishmonde.org

Haîtîya di navbera Xwedê û NGOyan de

Christophe Wargny *

Balafirgeha navneteweyî Toussaint Louverture hate ser xwe. Paqij e û hema hema mêvanperwer xuya dike. Nêrdevanên wê yên jixweber hildikişin û dadikevin û dikanên wê yên ji barê bacê azad, hene. Holên wê yên seyyar hene ku mirovan yekser heta bi nava balafiran dibin, ev holên seyyar berê qet tunebûn. Mirov bi van dîtinan hêvî dike ku jinûveavakirinê dest pê kir, ew dest pê dike, milyarên ku hatin danezan di dawiyê de êdî digihin hedefên xwe yên pêşî. Mirov ji buldozer, greyder û kamyonên avahîsazîyan ên li ser kar difikire. Mirov dest pê dike difikire ku ev kar vê *blokus*ê rave dikin, ango vê xetimîna çûnûhatina ´erebeyan ku şifêrê taksiyê di cîh de weke tiştekî misêwa da zanîn.

Lê belê rastî ne ev e. Tamîrkirina balafirgehê, digel şûştin û paqijkirina rahên sereke, projeyên tenê ne ku di nava duwanzdeh mehan de pêk hatin : jinûveavakirinê dest pê nekiriye. Berevajî avahîsazîyên herî zexm yên paytexteke îroj wêran, kontrola çîna siyasî û elîtên ku vî welatî ji du sed salan û vir ve difetisînin xwe li ber erdheja 12ê çileya 2010ê girtin, heta bi peyvan jî didizin û peyva "jinûvedamezirandinê" jî kirin ya xwe, ku projeya tevgera civakî ya jinûveavakirina sazî û avahiyên dewletê pêk tîne ... û wateya wê jî şûştin. Di rewşa heyî de "jinûvedamezirandin" berdewam û sereqetî ye.

Em bi hesabên vê felaketê dizanin, ku tiralî (an bêhişî) ya texlîdeke dewletan - ji avahî, navgîn û siyaseta rewa bêpar -felaket xirabtir kiriye. Bi xêra alozîya bajarî, nebûna binesazîyên li gora bajêr, bi qasî bi xêra tevgeraqaşûlên erdê, ev hesabê bobelatê derdikeve pêşiya me : sê sed hezar mirî, ewqas jî birîndar û seqet, bêhtirî milyoneke mirovên koçber ku piranîya wan di sedan wargehên li dora paytextê de bi cîh bûne.

Dîmenên Port-au-Princeyê yên di televîzyonê de – ku li dîmenên herî xirab digere – dikirin ku mirov li bajarekî ji binî ve hilweşiyayî bifikire. Bilindbûna dîmenên felaketê bêhtir bala temaşevanan dikişand. Rastî tiştekî din bû ; ew jî ewqasî trajîk bû. Çend komên avahîyên pirqat, nemaze avahîyên dewletê yên pirqat bi tevahî hilweşiyan. Li taxên kevin ên navenda bajêr û li rojavayê bajêr serê çar xanîyan sisiyan kêm û zêde xwe li ber erdhejê girt. Dema ku mirov bi girên xizanîyê yên derdorê (bilindahîyên cografîk kêm û zêde bi çînên civakî re li hev dikin) ve hildikişe, zirar û ziyan kêmtir e. Karekî ku bi sedan muhendisên ji Haîtîyê û biyanî bi bayê bezê kirî ango bi rengan nîşankirina avahiyan jî vê yekê piştrast dike : kesk (mirov dikare têde bimîne), porteqalî (divê were tamîrkirin) û sor (divê were xirakirin). Em çiqasî bi van bilindahîyan ve hildikişin, ewqasî kesk zêde dibe ... Li jêr sor zêde ye, yan jî wargeh zêde ne.

Çawa mirov digihêje Haîtîyê, mirov wan dibîne, mirov bi wan dihese, lewma li devera nêzî balafirgehê li ser erdên rast ên Croix des Bouquets'ê, ên Tabarê û li ser tevahiya deşta Cul de Sacê gelek wargeh hene. Kontrola bêrmên lastîkî yên ku ba li wan dixe, pêlên mezin ên şîn û spî di ava wan de çêdike, carinan hin rengên nepayî yên maddeyên din ên parastinê jî li van rengan zêde dibin. Wargehên ku doh li taxên li ber perê deryayê yan jî girên herî zêde kaş – taxên xizan ên xanîkên ji tenekeyan ku ji dehsalan û vir ve bêyî westan fereh dibin - dihatin tercîhkirin, êdî dest pê dikin û dişibin wan.

Konên ku li rex hev hatine rêzkirin, ewqasî bi hev ve ne ku mirov bi zorê dikare maseyeke plastîk bixe navbera didu ji wan. Di qadeke pir teng de bihevrejiyan, şert û mercên jiyanê di demsala baranê de (ji hezîranê heta çirîya paşî) di navbera ranegirtin û rezaletêde tê û diçe. Û tevî alîkarîyeke ji derve ya "*lezgîn*" û "*gelek*" jî ev yek diqewime.

Qada golfê ya Pêtyonvîlê, deverek e ku berê hin kes pir diçûnê. Sîh hezar kes tê de disitirîn. Li gorî wargehên din rewşa wê baştir e : mîmarên bexçeyan ku fikaran derbarê rehetîya lîstikvanên golfê de dikin, siyên gelekî baş çêkirin – gelekî bi kêr tê bo ku mexdûrên li qadê nû bi cîh bûne, ji roja di navbera du reşeşiyên baranê de tîrên xwe diweşîne, biparêze – û herweha rêyên fireh ku çûnûhatinê hêsan dikin jî çêkirin, li deverên din bi xwe kaos serdest e. Şiverêbi kîsên xîzê hatine dîwarkirin daku rê bide ber ava baranê ya xiraker. Û wekî din li Pêtyonvîlê çend sinifên dersan ên demî bi derfetên heyî hatine çêkirin, klînîkeke ji bo zarokan, têra xwe nuqteyên avê ji bo herkesî, hin rojan di qadeke kolektîf de kafeyeke înternetê heye û penaber ne pir dûrî deverên xwe yên berê, hatine bicîhkirin.

Saziyên derveyî hikûmetê (SDH-NGO) peydakirina ava vexwarinê û paqijîyê misoger dikin, avdestxaneyên seyyar vala dikin û kaniyên seyyar tedarîk dikin. Weke li deverên din Mîsyona Neteweyên Yekbûyî ji bo Biîstîqrarkirina Haîtîyê (Minustah) – piştî ku bi destwerdana Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê û Fransayê dawî li desthilatdarîya serokdewlet Jean-Bertrand Aristide hat anîn, hate welêt – li wir e. Lê belê,weke li deverên din,tu tişt ji dewleta Haîtîyê diyar nîne! Penaberekî di konseya wargehê de weha vê yekê piştrast dike "*wezîrek, li vir ? Min tu carî nedît. Dibe ku ji nerazîbûnan bitirsin...*"

Pêtyonvîl îstîsnayek e : Bextê wargehan hemûyan ewqasî xweş nîne. Bi ser de jî ban zêde xwe li ber bahozan nagrin. Di wargehan de kelmêş, cird û heywanên din ên parazît jî dihewin. Lewma jiyan – yan jî wateya ji mirinê xilasbûnê – bi lez bi ser dikeve, dikanên piçûk bi pêş dikevin – qamîşên teze, coca, *clairin*(vexwarineke bi alkol e ku ji qamîşê şekir tê çêkirin), sabûn – çawa ku kantîn û hêdî hêdî hewldana avakirina îşekariyê jî bi pêş dikeve. Bi heman rengî seranserî kolanên tengik ên bêhngenî, firotina malên qaçax ên piçûk zindî dibe.

Dema hewa şilî nebe û zuwa be, li her deverî di nav zerreyên hewayê, pîsî ya sereke ye. Qirêj jî basîlên kolerayê dihewîne, ev basîlên kolerayê piştî sedsalekê ji nû ve vegeriyan giravê. Ev nexweşîya ku nisbî bi hêsanî pêşî lê tê girtin – derfetên mirov hebin ku paqijîyê peyda bike û karibe destê xwe bişo, tehlûkeya nexweşîyê sînordar dibe – li vir jiyana mirovan dide ber xwe û wêran dike. Heta nîvê meha kanûnê sed hezar mirov bi vê nexweşiyê ketin, sîh û çar hezar ji wan li nexweşxaneyê hatin razandin. Heta nîvê meha kanûnê hejmara miriyan a hatî jimartin bêhtirî du hezar û du sedî ye. Bager û bahoza bi navê Tomas ku 5ê çirîya paşî girav da ber xwe, bû sebeb ku bakterî bi leztir belav bibin. Li her deverî kanalîzasyon servekirî diherikin û qirêja xwe tevlî çop û sergoyên ku bahozan bi xwe re anîne, dikin. Bi sarincên ava boş û çopa di nava wan de, wargeh dibin sergoyên mezin ên ku weke qurbanî li ber rehma vibriyoyên kolerayê ne.

Lê belê dirindeyên din jî nermetingî li deverê diçin û tên : Xwedîyên erdan. Li ser qada golfê, gefxwarin û çavtirsandin bi kar anîn û koçberên ji cih û warên xwe bûyî û li ser erdên bi yên wan ve bicihbûyî, dan revandin. Pevçûn her ku diçe zêde dibin :Erdên vala ji hingê ve weke zêr bi nirx in. Spekulasyon rêya xwe xweş dikudîne, û buhayê erd û milkan, ku carekê bilind dibin, destekê didin vê şêlê. Di erdhejê de tunebûna arşîvan, neewlebûna derbarê mijara ka kî xwedîyê milkekî ye û li seranserê welêt nebûna kadastroyê dibe sedema pirsgirêkên bê hejmar.

Kirê ? Kirê sê caran ji berê bihatir bûne. Mantiqê vê rewşê heye, lewre ku êşbiyaza xanîyên bi kirê kêm bû û daxwaza kirêkirina xanîyan bi careke bilind bû. Rewşa lezgînSDH neçar kirin û tu riyên li ber wan nema. Dewlemendên nû peyda dibin. Ên berê ango rêvebirên olîgarşîyan xwe zexm û xurt dikin. Wekî ku doktorek bi kurtî dibêje : "*destbiratîya rojên berê êdî nema, hilweşîya. Em niha gihiştin encameke nepayî : Newekhevî bêhtir dibe!*" Ji niha ve li nîvê rojavayê dinyaya me, newekhevîyên herî zêde li Haîtîyê ne.

Armanca sereke paqijkirina xirbeyan e. Komên ku endamên wan t-şortên bi rengên SDyan li xwe kirine, bi lodên xirbeyên avahîyan ketine, alavên di destê wan de bêr û melkês in ku şûna wînc û buldozeran digirin. Sîsîfoyên (1) tropîkal, bi şev tiştên ku baranên tropîkal ji hev bela dikin, bi rojê didin hev. Wateya vê ew e ku mirov bêje berdarî kêm e jî hîn hindik e. Çop çî di bîdonan de û çi jî belawela be, zikçûnên herî xirab peyda dike. Herkes vê dubare dike : Bi leza kamyonan a niha, wê deh sal jî ji bo veguhestina xîz û kevirên xirbeyan têrê nekin.

Ku mirov ji konan derbasî xanîyên demî (dema xwegirtinê pêşdîtî ji bo van xanîyan, sisê heta pênc salan e) yên ji dar, plastîk û tenekeyan bibûyana, vê yekê wê destûr bida ku hîmê jiyaneke ewletir deynin. Avakirina sed û çil hezar xanîkên bi vî rengî – stargehên T – tê plankirin û heta tê fînanskirin jî. Xanîkekî panzdeh metrokare 1 500 euro ye. Lê belê li ku? Li ser kîjan erdî? Û çawa tên bi dest xistin û desteserkirin? Bi dizî, bi qaçaxî tên kirîn? Li Haîtîyê "siyaseta xanîyan" di nava pênc wezaretên cihê de tê koordînekirin. Ji koordînasyonê bêhtir tevlihevî û sergêjî ye. Di rastîyê de siyaseta xanîyan nîne. Encam jî ev e ku, tevî zextê jî, di nav yanzdeh mehan de bi tenê yanzdeh hezar avahî hatin lêkirin! Ta ku xanîyên herî dawiyê hatin çêkirin, êdî yên pêşî wê hew bi kêr werin... Bi ser de jî hejmara "kesên di konan de" kêm nabe.

Çileyê bihorî, felaket bû sedema reva ji bajêr. Deverên derdorê yên derveyî bajêr hingê nêzî nîv milyon mirov hewandin û hewl dan ku bi alîkariya SDHên li deverê amade û şaredarîyan (derfetên wan bi xwe nebûn), dibistanan, xanîyan û xizmetên tenduristîyê bidin, belavkirina nan, zad û qût, avahîsazî û dermankirina derûnî organîze bikin. Malbatan pişta hev girt daku xizmên xwe bihewînin. Carinan gihişt wê astê ku abora wan hemû di ber de çû. Encamên vê yekê jî, xizanbûna derdorên derveyî bajêr û nekarîna rêlibergirtina pirsgirêkeke mezin a kevin, ango navendparêzîyeke hîper bûn.

Di dawîya çend mehan de, % 80yê mirovên ku ji paytextê veqetiyabûn û berê xwe dabûn derdorên derveyî bajêr, berepaş vegeriyan. Kêm jî be, mirov pê dizane ku li paytextê hin xizmet peyda dibin – wargehên mexdûrên felaketê jî di nav de – ji hawîrdoreke holikeke neewle ya li derveyî bajêr biqîmettir in: Dibistanên baştir, alîkarîya çêtir, şansên başti r(heta yên ku ji xwe re li hev bên jî) yên peydakirina karekî, û hwd. Koçberîya nav welêt vegeriya ser seyra xwe ya berê û leza xwe ya zêde. Wargeh wê hê demeke dirêjtir jî hebin.

Ji mêj ve ye ji bo piranîya xelkê Haîtîyê navenda xizmeta gelemperî ne dewlet e: SDH bûne navenda xizmeta gelemperî. Berî erdhejê, Bernameya Zad û Qût a Dinyayê (BZD) nêzî du milyon welatîyên Haîtîyê xwedî dikir û dîasporayê jî Xwedê dizane ewqas mirov xwedî dikirin (2). Erdhejê ev girêdan bi tenê xurttir kirin. Me bivê û nevê jî, li Port-au-Princeyê hebûna SDHyan ji bo dewamkirina jiyanê *şert* e.

Di nava buroyên Rêxistina Neteweyên Yekbûyî (RNY) (3) de ji seranserê dinyayê deh hezar komeleyên piştgiriyê alîkarîyê didin Haîtîyê. Bêhtirî hezarî ji wan li cîhê cîh karê xwe dimeşînin. Dewlet nîvê wan nas nake, lê belê welatîyên Haîtîyê hemû logo û nîşanên wan nas dikin.

Hêzên ku, weke dagîrkerênberê, ji her du alîyên Atlantîkê, angoBakurê Amerîkayê û Yekîtiya Ewrûpayê hatin, di pratîkê de li ser tevahîya erdê welêt hene. Parka luks a maşînan, lojîstîka buha ku para xwe li pêkhatina *blokus* hatiye ber felcbûnê zêde dike, bêhtirî sed hezar welatî xirbeyan paqij dikin, yên ku "karên wan ên bi mûçe" misoger dikin ew in. Heqdestê rojane 200 gourde (bi zor 4 euro dikin) e. Ev heqdest kaneke zêrî pêk tîne. Serokdewlet Prevalsala 2009ê ev heqdest weke zêde buha ji bo aboriya Haîtîyê bi nav kiribû û piştî têkoşîn û şerekî civakî yê demdirêj red kiribû ku vî heqdestî bide. Lê belê li Haîtîyê SDH ji dewletê bihêztir in.

Sala 2009ê alîkarîya insanî ji sê paran pareke Hilberîna Hundir a Brut (HHB) pêk dianî. Bi sed hezaran mirov bi xêra wê debara xwe dikin: Ne bi tenê muçegir, malbatên wan jî. Jixwe jiyana hin kesên *blan* (spiyan) – bi zimanê Haîtîyê (Kreol) wateya wê biyanî ye – gelekî baş e: Welatiyên Haîtîyê dikarin vê li aşxane û sergoyên Pêtiyonvilê bipîvin, ev aşxane û sergo hê têra xwe dewlemend in ku bikaribin yên herî xizan jî xwedî bikin. Wekî din daxwaza tevahîya welatîyên Haîtîyê yên zanîngeh xwendî ew e ku derkevin derveyî welatê xwe (4), yan jî di SDHyekê de kar bikin. Sala 2009ê piştî salên "alîkarîyê" diviyabû destekê bide pêşketina wê, ji bo ku karibe butçeya xwe ya normal li hev derxe, dewleta Haîtîyê hê jî % 60 girêdayî sazîyên navneteweyî bû. Herçend pêşketin hebe jî, divê mirov lê mikur were ku hatinên ji bacê hê jî gelek jê li bertîlê û bertîlxwarinê diçin. Di navbera 2008 û 2009ê de 300 milyon dolarên Venezuelayê bi erzanfirotinê di çarçoveya peymana bi Petrocaribeyê re dayî ji holê winda bûn. Hema hema ewqas pereyê din jî di bazarên karên gelemperîyê yên di navbera du alîyan de yên li derveyî bazara fermî jî ji holê winda bûne.

Ji bilî komeleyan, dêr jî qat bi qat zêde dibin (ew bi xwe jî carinan yên SDHyan in). Wa´iz, pentekostal û komên mirovan ên ku ji nebûna dewletê sûdê werdigrin, îroj bi ser dikevin.

Îroj piştî nîvrojê bi hezaran bawermend li taxa kevîya Port-au-Princeyê Carrefourê civiyan. Hoparlor muzîkeke rîtmîk ji xwe dide der ku popstarên amerîkî tîne bîra mirovan û tevahîya taxê bivê nevê jê sûdê werdigre. Girse çend gavên dansê diavêje. Sê wa´izên keşeyên amerîkî yên ku tên wergerandin ji bo zimanê giravê (Kreol) stran, dîmenên cejnê, xwendin û şîrovekirina Incîlê ji aliyê keşeyên herêmî ve, yên ku herî kêm ji salekê û vir ve hatine perwerdekirin, pêk tên. Mirov destê xwe didin nexweşan û nexweş pir in. "Mûcîze" diqewimin. Berî her tiştî ji bo nanê ku bi rêya van milîtanên merd ên xêr digihêje wan, ji Xwedê re şikir dikin: "*bawer bikin û hûnê werin rizgarkirin.*"

Şahidên Yehova û kesên din yên ku pê bawer in ku wê Îsa Mesîh vegere ser rûyê erdê yên roja heftan jî li waiz û pentekostalan zêde dibin. Jixwe, em nûnerên bawerîyên xwe bi xwe destnîşankirî jî najimêrin. Her bîstikekê yên nû li wan zêde dibin. Artêşa buhiştê bi rola pêşengtîyê û komîserên dînî radibe: "*divê mirov kesên bi derewan tobekirî, keşeyên xirab eşkere bike. Xwedê mezin e.*" Heta ku pê bêhna xwe berdin mirov pir car dubare dikin: "*Bila holên stûnan* [perestgehên pûtperestan] *nemînin, bila ev cîh û warê şeytanperestan nemînin.*" Gelo welê ji xwe re li hev hat ku Xwedê li avahîyên dewletê û katedralan xist û metran li mala wî ji pencerê kire xwarê?

Katolîktî êdî hindikahî ye. Sosyologê dînan Laenec Hurbon hizir dike ku katolîktî êdî bi tenê dînê % 45ê nifusa welêt e (berî çend salan ev rêje % 75 bû). Efsûngerî, pêkanîna mûcîzeyan, awayên nû yên tobeyê û protestantî tevnên piştgirîyê yên ji dêra katolîk hevgirtîtir pêşkêş dikin. Dêra katolîk bi xwe ne di nav labîrentên bajarbûneke bi liv û tevger û hov de, lê belê di çêkirina elîtan de bikêrhatîtir e. Li vir ciwanên tu siberoja wan nîne yek tiştî dibînin; xuyabûneke modern. Ev yek jî çi serhildêrîya heyî bêmoral dike û tevahîya derfetên jinûvesazkirina

www.kurdishmonde.com

siyasî ya civaka Haîtîyê bi dawî tîne. Armancên mîsyoneran çi ne ? Ji xeyalan mertalekî li dijî rastiyê çêbikin: Terbiyekirina hestan, dawîlêanîna hizirînê. Di nava sîh salan de em ji derketina holê ya ola azadiyê – ku bi Jean-Bertrand Aristide bi gewde bû, Aristide sala 1991ê, di navebra 1994 û 1996ê de û paşê di navbera 2001 û 2004ê de serokdewlet bû – derbasî îlahiyateke sertewandinê bûn.

Dema rewşa lezgîn bi dawî tê; lê kolera, rewşa lezgîn xirabtir dike. Wê pişta xwe bi Komîsyona Navneteweyî ya Jinûveavakirina Haîtîyê (CIRH) rast kiribû. Nûnerê taybet ê RNYyê li Haîtîyê William Clinton û serokwezîrê Haîtîyê Jean-Max Bellerive hevserokatiya CIRH yê dikin daku berdewamîya jinûveavakirinên li Haîtîyê misoger bikin. Encamên ku hêviyê bi mirov re nahêlin derdikevin holê: Di nav deh mehan de sê civîn, hindik projeyên qebûlbûyî, koordînasyoneke xirab a kesên milkên xwe bi kirê didin, dana alî ya civaka sivîl a Haîtîyê, nebûna daxwaza dewletê ya bicihanîna sozan, û "bicîhkirina" şîrketên xwe de jêhatîbûna birêvebirên dewletê mirovan heyranî xwe dike. Xuya ye 10 yan jî 15 milyar dolarên soza wan hatî dayîn gelekî dûr in. Bi tenê % 10ê beşa soza wê hatî dayîn hate komkirin. Di van şert û mercan de, ji kadastro heta bi perwerdekirina hostayan, ji alîkarîya ji bo çandinê heta bi nexweşxaneyan, proje bi tenê qismî tên fînanskirin. Û kêm caran heta dawîyê bi cîh tên.

Hilbijartin? Xelkê welêt bi tiştên din mijûl e : Starek, *djobek* (karek) û paqijî. Bere bere jî, hîsa ku Haîtî welatekî ne bi destê xwe ye peyda bûye. Siberoj bixwe, *"se blan ki desid (biyanî biryarê didin)"*. Jinûveavakirin, jinûveafirandin, jinû? Mirov dikare bêhtir navê pînekirî li siberojê bike, heta rewşa "pînekirî" ya pergala kevin: Mirov dewleteke ku xebitîna wê bi rengê strukturel nexweş û kêm e, çawa dikare bi hêz bike ? Kîjan derfetan bide sîstemeke siyasî ya ku xwe disipêre kurtêlxwurîyê, ya ku garantîya civakeke ji du çînan (dewlemend û xizan) e? Mirov di *blokusekê* de asê bimîne, bes e ku mirov çavdêriyê bike: Cîpên 4xên bi klîma û camên wan reşkirî û *smartphone s*ji bo hin kesan in, peyatî û kaşkaşk ji bo yên din. Çîna asî, ji bilî çend hêmanên modernîteyê, naguhere. Weha xuya ye ku erdhejê xanî hejandine, lê belê hê hîmên civaka Haîtîyê nehejandine.

* Rojnamevan, nûçegihanê taybet yê LMd

(1) Jêrenota wergêr: Fîgurê mîtolojiya yewnan e ku li ser hatiye ferzkirin latekî derxe serê çiyayekî û dîsa berde jêr û heta hetayê vî karî bike.

(2) Budçeya dawî ya dewletê bi zor ji du milyar dolaran dibihurî, ango bi qasî lêçûna pênc rojên şerê li Iraqê yên salên 2000ê. Li gorî daneyên Banqaya Navamerîkî ya Pêşketinê (BNP), para dîasporayê di Hilberîna Hundir a Brut (HHB) de % 16 e.

(3) Bernameya Neteweyên Yekbûyî ji bo Pêşketinê (UNDP), Rêkxistina Neteweyên Yekbûyî ya ji bo Perwerde, Zanist û Çandê (UNESCO), Fona Neteweyên Yekbûyî ji bo Zarokan (UNICEF), Rêkxistina Neteweyên Yekbûyî ya ji bo Zad, Qût û Çandinê (FAOUN), BZD, Fona Neteweyên Yekbûyî ya ji bo Serjimarê (UNFPA).

(4) Li gorî raporeke Konferansa Neteweyên Yekbûyî ya li ser Bazirganî û Pêşketinê (UNCTAD) heta ku mirov li Haîtîyê dîplomayan dide 100 xwendekaran, 80 kesên dîplome berê stendî koçber dibin û ya rastî diçin Bakurê Amerîkayê.

Wergera ji fransî: Luqman Guldivê

Dîrokeke du sed û bîst salî

Haîtî, dîrokeke azadî û êşê

Christophe Wargny

Dîroka Haîtîyê bi şoreşekê dest pê nekir û bi erdhejekê jî bi dawî nehat. Welat berîya hingê jî hebû û wê paşê jî hebe. Dîroka durr a giravên Antîlê – navê wê yê sedsala 18ê ye – îlhamê dide nivîskar û lêkolîneran. Bi vî rengî Eliane Seuran bîografîyek diyarî Vincent Oge (1) kir ku qedrê wî pir nehatiye zanîn. Hîn berî serhildana koleyan, ev "mirovê rengîn" – li gorî pênasên hingê ev nav lê hatibû kirin – li dijî pêşhukmên ku ew jî mexdûrê wan bû, têdikoşîya. Çîroka Seuran alîkarîya me dike ku em bikevin nav jiyana jibîrbûyî ya vî melezê azad û têgihiştî yê ku fikrên şoreşa Fransayê ew heyranî xwe hiştine. Lê belê Oge pêşengek e, tekûz e û tepişkor e ku spîyan wê ew sala 1791ê ji holê rakira.

Aktorekî din ê giravê yê ku qedr û qîmetê wî nayê zanîn Etienne de Polverel e. Sala 1792ê komara ciwan a Fransayê du komserên pir erkdar şandin Saint-Domingueyê. Leger-Felicite Sonthonax ê weke êgir û bizotê ji Polvérel baştir tê nasîn. François Blancpain ji bo me serpêhatiya jiyana wan nivîsiye. (2) Hîletê xwedîyê erdan ji wan diçû. Wan şerê li dijî Spanya û Ingilîstanê bi rê ve dibir. Wan pîvaneke radîkal ya ku bi gelekî ji erkên wan û wê de bû qebûl kir: Ji bo herkesî azadî. Vê lihevhatinê wê pişt re li tevahiyê koloniyan dawî li koledariyê bianiya.

Lê belê Polverel baş dizane ka azadiya li ser hatiye lihevkirin, bêyî reformên aborî çiqasî êmê xapandinê ye. Mirov çawa kesekî ji nû ve azad bike ku mirovî ew bi tu rengî ji bo azadiyê, ji bo bibe welatîyek û hilberînereke bîrbir amade nekiriye? Ew li zevî û erdan difikirî ku bi destê xwedîyan (yan jî bi destê dewleta ku dikeve şûna koçberan) û koleyên berê yên ku bûn cotkar bi hev re tên birêvebirin. Polverel weha dinivîse: "*Sîstemeke ku vegera ber bi koledarîya berê ve û derbasbûna xizmetkarîya dildarî nemumkin bike, wê wekhevîyê bigihîne asta herî jor* (...) *û bi rêya vê sazîyê tevahîya çînên welatîyan wê rêzê ji heman berjewendîyan re bigirin, zevîyan û berhemên çandinê biparêzin.* (...) *Mirov civakê bi awayekî bi rêxistin bike ku dabeşkirina newekhev a dewlemendiyê heta mumkin e kêm zirarê li Azadî û Wekhevîyê bikin.*" Tu birêvebirên dawîyê yên Haîtiyê wê nedane ser şopa fikirên Polverel. Hema bêje hemû xwe weke mîlîtarîzmeke cotkarîyê nîşan didin, ku heta bi radeya vegera ber bi koledarîyeke navê wê nayê bilêvkirin e.

Aime Cesaire ê ku sala 2008ê mir, ji welatê Toussaint Louverture heta mirov bêje bes hez dikir: Ji bo wî, ew der objeyeke xeyalan û efsûnê bû. (3) "*Ji dawîya salên 1950'î û vir ve Haîtî veguherî ser welatekî qedexekirî... ne mumkin e ku ez biçimê: Heke biçim wê weha xuya bike ku ez li ser navê reşbûnê piştgirîya rejîma Haîtîy dikim.*" Rejîma malbata Duvalier, ango ya herî xirab. (4) Lilian Pestre de Ameida peywendîyên nivîskar û siyasetmedarên martînîkî bi Haîtîyê re analîz dike: Jin û mêrek, efsaneyek, helbestek. Ceribandina wê ji me re behsa vê hevdîtina tovrind dike, behsa vê dildarîya ji bo welatekî dike ku lê koleyan serî hildan. Gelo îroj pêdivîya Haîtîyê bi hin Cesaire'ên din heye? (5)

Herçend weke romannivîs serpêhatîyeke piştî erdhejê jî pêşkêşî me dike, Yannick Lahens (6) bi vî rolî ranabe. Ev jina romannivîs xwe dûrî rastîyên eşkerebûyî digre, bi kêfxweşî behsa jiyana rojane ya ku şopa piştgiriyê li ser e dike û derbarê welatekî şikestî de pirsan ji xwe dike. Ew bawer dike, yan jî hez dike bawer bike ku welat dikare vejî. Herçend em nizanibin jî ka ev yek wê çawa pêk were: *"ango em veguherîn esrarkêşan, mubtelayên kokaînê, mubtelayên narkotîkê ku navê wê alîkarîya navneteweyî ye. Ji bo jinûveavakirina bi rastî divê kalîte jî pê re hebe, kalîteya ji bo dermankirinê bi rêya ji jehrêpaqijkirinê tevî êş û azarên jêcihêbûnê yên berîya rêya dirêj a ber bi xweserîyê ve. Em jê dûr in.*"

(1) Eliane Seuran, *Le métis aux yeux clairs ou l'histoire d'un « homme de couleur » à Saint-Domingue (1789-1791) [Soryazê çavkal yan jî serhatiya "mirovekî rengî" li Saint-Domingue'ê],* Frison-Roche, Parîs, 2010, 155 rûpel, 14 euro.

(2) François Blancpain, *Etienne de Polvérel, libérateur des esclaves de Saint-Domingue [Etienne de Polverel, azadkerê koleyên Saint-Domingue'ê]*, Les Perséides, Bécherel, 2010, 235 rûpel, 19,90 euro.

(3) Lilian Pestre de Ameida, *Aimé Césaire, une saison en Haïti [Aime Cesaire,demsalek li Haîtiyê]*, Mémoire d'encrier, Montreal, 2010, 238 rûpel.

(4) Bixwîne, Evelyne Trouillot, *La mémoire aux abois (Bibîranîna pêsîrtengîyê)*, Hoëlbeke, Parîs, 2010, 188 rûpel, 18 euro.

(5) Her weha binêrin li « Conversations sur Haïti avec Césaire » [bi Cesaire'î re axaftinên li ser Haîtiyê], *Monde-diplomatique.fr*, 19ê nîsana 2008'an.

(6) Yannick Lahens, *Failles [derzên erdê]*, Sabine Wespieser (edîtor), Parîs, 2010, 160 rûpel, 15 euro.

Wergera ji fransî: Luqman Guldivê

Avakirina Haîtîyeke nû koma hizirîn û çalakîya ji bo Haîtîyeke nû*

Mirov çawa ne bi tenê herêma Port-au-Prince, belê tevahîya Haîtîyê ji nû ve ava bike ? Bi sedan mirovên zanîngehan û kesên bispor ji bo bersivdana vê pirsê hewl da: Jinûveavakirina vî welatê, ku yê gelekan ji wan e. Nivîskarên Koma Lêkolîn û Çalakîyan ji bo Haîtîyeke nû (GRAHN) di nava deh beşên mezin de planeke hevgirtî ya ji bo bîst salan pêşniyar dikin. Xebata wan ji rewşa heyî ya dramatîk dide rê – berhem tu tiştî nehênî nahêle – û ne ji dema erdhejê mayê. Ne bi tenê ew pêşniyaran dikin. Lê ya wan, ji destpêkê ve tu berjewendîyên wan ên ferdî yan jî eşîrî nînin ku divê biparêzin.

Ji analîza xelekên li xwe didewirin yên girêdan û pirsgirêkên nasnameyî, civakî û hawirdorê, herî kêm sê daxwaz derdikevin holê: Perwerde, pêşketin û starbûn. Ev li dora dewleteke parêzvan, stratejîst û bê alî ya ku qet di dîrokê de pêk nehatiye çêdibe û nivîskar hewl didin vê dewleta ku berevajî ya heyî ye, bidin nasîn: "*Bêîstîqraîya siyasî, lawazîya jêrxaneyê, zehmetiyên peydakirina fînanskirinê, bêkêrîya îdareya dewletê, nebûna mirovên jêhatî û bisporan,* (...) *şîddet, bertîlxwarin, redkirina dewleta huqûqê ...*" GRAHN amade ye ku tevahîya plankeran re kar bike û pêşniyar dike ku çavdêrîyeke alîkarîya biyanî jî organîze bike. Dema mirov bûyerên ku berê nayên dîtin, yan jî hevnegirtina alîkarîya navneteweyî li ber çavan bigire, hingê ev kar bivê nevê hewce ye.

Karekî zêde mezin ê jinûveavakirinê ye, ev berhem divê serê pêşî nîqaşek û têkoşînek be ku hê jê re maye mirov wê bi ser bixe.

C.W.

* Weşanên *Presses internationales Polytechnique*, Montreal, 2010, 617 rûpel, 50 euro.

Wergera ji fransî: Luqman Guldivê

Ahmet Karabulak: **Rêzewêneyên ji Guernîcayê heta Halebçê**, qîr li ser mûşembeyê, 155 x 420 cm

Bi Frantz Fanon re civan

Salima Ghezali *

Kêm pirtûkên weke “Les Damnés de la terre/lanetiyên ser rûyê erdê” ya sala 1961ê wê karibin evqasî mohra xwe li nifşekî intelektuelan bixin. Jean-Paul Sartre pêşnivîsa vê pirtûkê nivîsîbû û têde pesnê şîddeta bindestan dida. Fikra Frantz Fanon, a ku têde ezmûna psîkyatrê angaje diyarker e, hêja ye mirov ji nû ve li ber rohnîya serxwebûnan û şerê navxweyî yê tirsnak ê ku Cezayîr salên 1990î da ber xwe, lê binêre.

Gelo dibe ku mirov çend gotinan li ser pênceh salîya mirina Frantz Fanon binivîse, piştî ku Cezayirîyên 17ê çirîya pêşîn a sala 1961ê avêtin çemê Seinê hatin bibîranîn û hinekî berîya pîrozkirina serxwebûnê, ya ku herkes teqez li bendê bû? Çend gotin wê têrê nekin. Gelek gotin jî wê têrê nekin. Ji bo vê beşeke dikare were qebûlkirin a nakokîyan hebe ya ku jê tê jiyan û hebûnan zindî bike. Di vê zorê de jî jixwe hinek şîddet heye ku em ê der barê Fanon de gelekî behsa wê bikin. Lewra pêşî “zor” e ya ku dike guftûgoyên serhildêr derkevin ser dikeke cîhanî ya ku têde ji destpêkê ve mirov bi rêya şerên “sifir kuştî” qayilkirî ne”. Di nava balefireke bêpîlot de cihê Fanon nîne. Û li çiyayên Afganistan û çolên Sahelê, yê şaş ne ew e. Çawa ku romannûs û helbestvan Mouloud Mammeri di “Nameya ji Jérome re” *[Jean Sénac]* (1) çirîya paşîn a sala 1956ê dinivîse, şîddet e ya ku her tişt bir.

Mirov çawa Fanon binirxîne, Fanon ê ku me herî zêde aciz dike, li vir û niha, Fanon ê hêrsa tundrew a li dijî zilm û zorê, wexta ev hêrs di dema “şerê qirêj” ên salên 1990î de girseyî bû? Şerekî navxweyî, neteweyî, cezayîrî ku dîsa jî bi gelek awayan di şeka serwerîya kolonyal de jî xwe bi cih dike.

Çiqas tebeqeyên şîddetê bi girnijînê derkevin holê, xwe zêde dikin û belav dibin, bi dehan salan, ducar yan jî sêcar û heta bêhtir li xwe zêde dibin. Dema ku me carekê behsa vî “şerê qirêj” kir, hê hertişt nehatîye gotin. Bêguman beşeke wê ya mezin sivîl û navxweyî bû, lê ne bi tenê ev bû. Li herdu alîyan jî mirov hevdu hê bi “ne ji me bûnê” gunehbar dikin: îslamîst bi rengekî karîkaturîzekirî weke “afganan” tên nîşan dan û laîk weke “francouchan” [navê ku cezayîrî li fransiyên li Cezayîrê dikin; nota wergêr]. Mirov referansên welatparêz bi kar tînin û îstîsmar dikin û li cem hinan bêyî ku mirov pê bihîse jesteke teqlîda paraşûtvanên fransîyan xwe dide der, li cem yên din hêrseke kevin a li dijî FLNyê (Bereya Rizgariyê ya Neteweyî) tê çandin, ya ku şerê Tevgera Neteweyî ya Cezayirî (MNA) û gelek muxalifan ên ku şerê serxwebûnê rengîn kirin, bi bîr dixe (2). Gelo mumkin e mirov Fanon vexwenda da ku bi me re îro awayê ku pê şîddet ji warekî pengizî warê din û dema ev kir jî ew war teqandin, bixwîne? Gelo Fanon hem zêde ciwan mir, hem jî di demekê de ku awir pir bi lez dizîvirin bûyerên din? Yan jî tam berevajîyê vê ye. Gelo, bi xwe evqasî nêzîkkirina van herdu deman, tevî ku vê yekê naxwaze Fanon jesteke hêrsa dîdaktîk dike, ev hêrsa dîdaktîk zorê li mejî dike da ku mirov peyvan û dîrokê bi giranîya taybet a şîddeta pêl bi pêl fêm bike? Ev zilamên ku wan diavêjin çemê Seinê, yên ku li bajarê Rohnîyê mirov didin dûv wan, ên ku di nava bêdengîyê de tên qetilkirin û yên ku mirov bi awayekî şermoke pêncî salan piştre rûmetê ji wan re digire... Gelo van mirovan dikarî xwe ne bi şîddetê û bi awayekî din rizgar bikira? Û dema ev kirin, çi şansê wan hebû ku xwe ne di efsaneya şoreşa îdealîzekirî de pêk bînin û bi rengekî din pêk bînin? Û ji wir jî, veguherîn girtîyên derewên di nava dîrokeke ji bo pêdivîyên propagandaya rejîmeke baskokirî de; tevî ku dijminê do ye yê ku arşîvên dîrokî di destê xwe de digire. Ev yek ji wan henekan e ku dîrok bi mirovan dike.

Lê bêlê di vir de herweha tiştên ku mirov li ser çerxên serdestîyê (ji nû ve) fêr bibe hene. Ev serdestî ji kolonîkirinê û wêde, mohra xwe li têkilîyên di navbera mirovan de dixe. Şîddeta rizgarker a ku Fanon di nava analîza xwe ya elîtên neteweyî de nîşan dide, nikare bêyî dawîanîna li kolonîkirinê pêk were. Erdekî şûvhiştî ku globalbûn wê tevlîhev dike, cihê wê diguhere û li parçeyên dijberê hev dabeş dike. Ziman bi xwe vediguhere qada şerên navxweyî û derve. Mirov çawa ku zimanê wan baş hîn dibin xwe ji fransîyan rizgar dikin, yan jî çawa derbasî ingilîzî dibin yan jî li erebî yan jî zimanê berber vedigerin; dema ev diqewime jî, astên şer ên zimanî, çandî, dînî, aborî û fizîkî pêrgî hev dibin. Û ev çoyên şerî yên rastî hev tên, li hev diqelibin û hev zêde dikin, rê li ber topografîyeke nû ya ku lê fikra Fanon nikare êdî bi maneya wê ya gotinan were fêmkirin. Ev fikr dikare nakokîyê bihewîne û qebûl bike heke ji qada rewakirinê veqete da ku veguhere havênê rûmet û jêhatîbûna jêbihurînê. Lê belê divê mirov karibe bêhnfereh be ji bo ku ji xwe bibihure.

Bihurîna ji xezeb, êş, dînîtî, xwekujî û bêdengîyê. Psîkyatrîya piştî serxwebûnê û nexasim ya piştî “şerê qirêj” a salên 1990î hê li benda Fanonê xwe ye. Xwendina nivîsên Fanon ê psîkyatr bû di dema şerê Cezayîrê de û nêrîna li dînîtîya bi nexweşîyan, bi depresyonan, bi xwekuştinên protestoyî, bi gelek şîddetên li dijî xwe û li dijî yên din xwe da der, piştî pêncî salan bi hêsanî nayê fêmkirin. Lewra li cem vê cîhanê qadeke normalîyê ya cezayirî heye ya ku bi awayekî bêqusûr cihê xwe di nava normalîya dinyayê de digire.

Lê belê, gelo dibe ku, ya ku dibe sedema hêrs û şîddetê bi xwe mijara bi rastî ya hetikînê be? Normalîya kesên ji belayê dûr, parastî, dewlemend, yên li alîyê baş ê bendan hatin dinê, yên baş difikirin, gelo dibe ku hetikîn li vir bi xwe be? Û heke ev hêsanîya ecêb bû ya ku mirovên asayî pê dikarin li kêleka mexdûrên hovîtî û terorê bi dilferehî bijîn, ya ku dike mirov ber bi bayê hêrsên mezin bikeve? Ji bo çi diviyabû mirov li bendê bin ku Fanonekî bi dildarî li dijî nazîzmê û kolonyalîzmê angaje bû – dema ku yên herî zêde di rehetîyê de man, ev psîkyatrê herî zêde nêzî tinebûna exlaqî û fizîkî ya nexweşên xwe bû – qêrîneke hindiktir tundrew li dijî serwerîyê îfade bike? Ji bo çi mirov ji Fanon ê ku tevahîya rîskan girte ser xwe, bipê ku weke maqûl û zanayan bidîqet be?

Di alîyê cografî de rêya wî ji Martînîkê dest pê dike, diçe Cezayîrê, di vê navberê de jî di Fransayê re derbas dibe, da ku li nexweşxaneyeke amerîkî bi dawî bibe, berîya ku xwe li Cezayîrê bide veşartin. Ma ev ne rêyek e, ku der barê dîroka demdirêj – ya ku têde mirovên weke Fanon beriqînên bi heybet bi dildarî û hêrsa herî zêde bi gewde dikin – de dersan dide? Mîrateya koledariyê jêre ma, di şerê li dijî kolonîkirinê, yê şerê li dijî nazîzmê de cih girt, herî dawî jî li erdekî mir ku hê mohra rasîzmê li ser bû û çîroka wî bi veşartina li erdekî bi dawî bû ku wê yekê ji şoreşên herî sembolîk ên dîroka nêzîk pêşî bi ser bixe û paşê xiyanetê pêre bike. Jiyan û mirina Fanon bûn nîşana angajmana tundrew a mirovî. Li cem Fanon, mirov ew kes e ku êşê dikişîne.

Nakokîya em îşaretê pê dikin a tam di navbera astên herî jor ên romantîk ên li ser şoreşa Cezayirê û xwezaya dîktatorî ya rejîma roja piştî sexwebûnê xwe bi cih kirî de li ser rêya Fanon de ne, yekane nakokî ye. Ew kesê ku di Şerê Cîhanê yê Duyem de lehengekî xemilandî bû, wî bi xwe di şerê Cezayirê de li dijî kevnelehengên rizgarkirina Franseyê şer kir, yên ku veguherîn kolonyalîst û partîzanên şerê giştî li dijî cezayirîyan. Li vir jî li gorî Fanon şîddet ji nû ve diyar dibe.

Li ber wicdanê wan kesên ku pêşî înkar kirin ku lehengên rohnî yên rizgarîya Fransayê carinan li Cezayirê bênamûs bûn, paşê xwe rast kirin û gotin, lehengên wan zilm li gelê xwe nekirine, li yekî din kirine, piştre xwedî li nirxên “gerdûnî” derdikevin û pesnê “kirinên baş ên kolonîkirinê” didin û pê xwe xurt dikin. Ev hemû di nava guftûgoyekê de diqewimin ku Cezayir û Fransa bi qasî hev parve dikin. Ne di nava du alîyên ji hev cihê de yên ku destûrê bidin mirov qelşên kûr di navbera kolonyalîst û dijkolonyalîst de bibîne, lê belê di nava geremoleke birêzkirinên medyatîk û manîpulasyonên siyasetvanan de ku lê brîndarî û mubalexe bêyî ku guh bidin hev bersivê didin hev.

Rêzgirtina ji Fanon re dibe ku li cihê ku şîddet lê dest pê dike, bi cih dibe, digere û kirasê şaristanîyê li serdestîyê dike, rahiştina mijara şîddetê be. Paşê rêyê berepaş biçin, di birêveçûna serhildêr bi xwe de hêmanên ku azadîyê bi şîddetê dixitimînin, bide alî. Êdî ne bi tenê bi rêya şîddetê dibe.

Heman kes, yan jî hema hema heman kesan piştî ku **Albert Camus** pîroz kirin Fanon pîroz dikin, ev nîşana sînorên em dikarin ji bibîranînekê hêvî bikin e. Ne di nava wê aramîyê de ku çandek û dîrokeke dualî hev qebûl bikin, belê para bêhtir di nava helwesteke reqabetparêz (navxweyî, vê carê) ya bibîranînan de. Ji bo gelek neteweperestên cezayirî derbaskirina Deryaya Sipî hêsantir e ji rûbirûbûna bi xwe û dîroka xwe re.

Ma mirov wekî din çawa wê rastîyê fêm bike ku rojname û întelektuelên li ser navê şerê dij-terorîzmê ji siyaseta “tinekirina îslamîstan” amentuya xwe çêkirin, rêzê ji Fanon re digirin? Fanon hem pir nêzîkî pirsên me yên derbarê doh de ye û hem jî nêzîkî bêdengîya me ya der barê îro de ye, heke em bala xwe nedinê dikare bi lez veguhere aktualîteyeke nip û nû. Lewra carinan hêrs bi tenê ji ber mirovatîyeke dimîne, ya ku heke me hertiştê wê nestandibe jî me zêde jê stand.

* Rojnamevan, berpirsiyara malpera *lanation.info*, Cezayîra paytext.

(1) **Jean Sénac** helbestvanek bû ku di nava refên doza serxwebûna Cezayirê de cihê xwe girt. Sala 1973yê hat kuştin. Nameyê bixwîne: “Mammeri dans la guerre / Mammerî di şer de”, 3yê tîrmeha 2011ê, www.lanation.info

(2) **Alain Ruscio**, “Messali Hadj, père oublié du nationalisme Algérien / ***Messali Hadj, bavê jibîrkirî yê neteweparêziya cezayîrî***”, *Le Monde diplomatique,* hezîran 2012.

Wergera ji fransî: Luqman Guldivê



Nêrîna li dînîtiya
bi nexweşiyan, bi depresyonan,
bi xwekuştinên protestoyî,
bi gelek şîddetên
li dijî xwe û li dijî yên din xwe da der

Mirovekî ji xwe çûyî

Jîyana Frantz Fanon ê ku li Martînîkê tîrmeha 1925ê ji dayik bû, wê kurt bûya: dema ku ew kanûna 1961ê li Washingtonê ji ber losemîyê mir, ew hê 36 salî bû. Fonon reş e û ji Antîllan e, timî rastî nijadperestîyê dihat. Lê belê wî tevahîya fehşîya wê di Şerê Cîhanê yê Duyem de nas kir. Bi dilê xwe sala 1943yê di nava refên Hêzên Fransî yên Azad de cihê xwe girt, wî bi lez zelûlîya vê artêşê dît; ev artêş şerê nazîyan dike û serwerîya neteweyî pîroz dike, di nava xwe de jî cudakarîya nijadî û mîtolojîya kolonyal her dewam dike. Ew bi awayekî tirş û tahl nîsana 1945ê dinivîse “*min şaş kir!*” Serhildêr, ji xwe çûyî, tevahîya jîyana xwe Fanon wê wisa bimaya. Xwendekarê tibê yê li Lyonê, piştî şer pisporîya xwe weke psîkyatr dike û bi kelecan dildarê fênomênolojîyê û eksîstansîyalîzmê ye. Sala 1952yê weşanên Seuil pirtûka wî ya yekem, *Peau noire, masques blancs* / *Çermê reş maskeyên sipî* weşand, vê pirtûkê piştrast kir ku yek ji fîlozofên herî hûrûkûr lêdikole –û hingê ew 27 salî ye – yê mekanîka nijadî ye. Fanon ê psîkyatr di kirinên xwe yên pîşeyî de jî xwe ji yên din cihê dike. Sala 1953yê ew li nexweşxaneya Blida-Joinville ya li Cezayirê hat wezîfedarkirin, wî li wir rêbazên nûker û azadker ên ku îlhama xwe ji psîkoterapîya sazûmankirî digirtin, dan destpêkirin. Lê belê şerê Cezayirê yê ku dawîya sala 1954ê dest pê kir, ew neçar kir ku alîyekî bigire. Wî bi şer û pevçûnê sala 1956ê îstîfa kir, li Tûnisê tevlî nav refên koma *El Mucahîd* rojnameya Bereya Rizgarîya Neteweyî (FLN) bû û ji weşanên Maspero *L'An V de la révolution algérienne* / *Sala 5ê ya şoreşa cezayirî weşand,* ev berhem çawa ku hat weşandin sala 1959ê hat sansûrkirin.

Şoreşa cezayîrî ji bo wî di azadbûna cîhana kolonîkirî de bi tenê qonaxek e. Hukûmeta Demî ya Komara Cezayirê (HDKC) ew weke “sefîrê” welatên jêra Sehrayê yên ku hingê serbixwe bûn ango Gana û Gîneyê wezîfedar kir, wî li wir xebata xwe ya siyasî nexasim ji bo şoreşa afrîkî dikir (1). Lê belê ew bi nexweşîyê ket. Wî xwe da redaksîyona berhema xwe ya dawî *Les Damnés de la terre* / *lanetîyên dinyayê*, berhemeke muhteşem ku Jean-Paul Sartre pêşgotina wê nivîsî, ev berhem çend rojan berîya ku Fanon bimire çap bû.

THOMAS DELTOMBE

(1) Navê pirtûka ku sê salan piştî mirina wî hat weşandin ji vir tê; di vê pirtûkê de gotar, axaftin û têbînîyên Fanon li ser vê mijarê nivîsandî hatine komkirin: *Pour la révolution africaine* / *Ji bo Şoreşa afrîkî*, Maspero, Parîs, 1964.

www.lanalyse.org

Birêvebirina şerê fikran ji bo derxistina çînên xizan ên gel ji îdeolojiya serdest da ku desthilatdarî were bidestxistin…Analîzên ku Antonio Gramsci dema ji aliyê faşîstan ve hatibû zindanîkirin, di destpêka salên 1930î de nivîsîn, gelek caran ji ber wan tê girtin, kêm caran tên xwendin û têra xwe jî tên bênirxkirin; ev analîz bi awayekî hêjayî mirov bala xwe bidiyê vedijin. Ji Ewropayê heta bi Hindistan û Amerîkaya Latîn nivîsên wî belav dibin û fikra rexnegir berdar dikin.

SÊWIRANDINÊN HERDEM BANDORÊ DIKIN

Antonio Gramsci, fikreke ku bû dinyayek

RAZMIG KEUCHEYAN *

Çima ya ku sala 1917ê li Rûsyayê mumkin bû, ango şoreşeke karkeran, li her deverê bi bin ket? Çawa hingê wisa bû ku tevger li tevahîya welatên din ên ewropî hatibû şikandin – li Almanya, Macarîstan, lê belê herweha li Îtalyayê "Konseya Torînoyê", dema ku karkerên bakurê welêt sala 1919-1920ê bi mehan fabrîkeyên xwe dagir kiribûn?

Nivîsên Girtîgehê (1) yên navdar ên Antonio Gramsci bi vê pirsê dest pê dikin, vî şoreşgerê ciwan sîlehên xwe yên pêşî di dema ezmûna Torînoyê de çêkiribûn. Çend salan piştî vegera ji vê pêvajoyê ev berhema mezin a siyasî ya sedsala 20ê hat nivîsandin û ev berhem hizirîneke kûr e li ser binketina şoreşên li Ewropayê û li ser awayê bihurîna ji têkçûna tevgera karkeran a salên 1920 û 1930î. Sê çaryekên sedsalekê di ser mirina Gramsci re derbas bûn, ev berhem hê xitabî herkesî dike ku dev ji lêgerîna rêyên ber bi cihaneke din a mumkin ve bernedaye.

Bi awayekî ecêb, ev berhem xitabî wan kesan jî dike ku ji dil dixwazin pêşîyê li pêkhatina wê dinya din bigirin. Çend rojan berîya tûra yekem a hilbijartinên serokkomarîya Fransayê yên sala 2007ê Nicolas Sarkozy ragihand: "*Ya rastî min analîza Gramsci ji xwe re kir mal: desthilatdarî bi fikran tê bidestxistin. Ev yekem car e ku mirovekî rastgir vî şerî digire ser xwe*." (2)

Rastgirên tundrew dixwazin ji nû ve xwedî li nivîskarê *Nivîsên Girtîgehê* derkevin, hin şêwirmendên nêz ên Sarkozy ji wan in – weke Patrick Buisson – û di rastîyê de ev karê rastgirên tundrew kevin e. Vê yekê qet pêşî lê negirt ku tevahîya sedsala 20ê tevgerên şoreşger ên li seranserê dinyayê Gramsci bikin mijara ji nû ve şîrovekirinên hişyarker. (3)

Li gorî Gramsci sedema mumkinbûna şoreşê li Rûsyayê û ne li Ewropaya Rojava xisleta dewletê û ya civaka sivîl e. Li Rûsyaya çarîst para bêhtir a desthilatdarîyê di destê dewletê de kombûyî ye; civaka sivîl bi xwe – partî, sendîka, şirket, çapemenî, komele... – kêm bi pêş ketîye. Di nava van şert û mercan de bidestxistina desthilatdarîyê çawa ku bolşevîkan kir, berîya her tiştî ferz dike ku çerx û mekanîzmaya dewletê were bidestxistin: artêş, îdare, polîs, dadgerî... Civaka sivîl hê weke cenînekê bû, her kesê ku desthilatdarîya dewletê di destê xwe de digire dikare hukim lê bike. Lê belê dîsa jî kêlîya ku dewlet hat bidestxistin serêşî û acizî jî dest pê dikin: şerê navxweyî, zindîkirina amûra hilberîner, têkilîyên nazik ên di navbera çîna karker û ya cotkar de...

Li Ewropaya Rojava bi xwe civaka sivîl şidyayî û xweser e. Di bin bandora şoreşa pîşesazîyê de her çû bêhtir li ser kursîya hilberandinê rûniştê. Ew beşeke girîng a tevahîya desthilatdarîyê di destê xwe de digire, lewra bidestxistina dewletê ne bes e. Divê civaka sivîl jî bê razîkirin; pirsgirêk ew e ku razîkirina civaka sivîl bi heman awayî pêk nayê. Li gorî vê divê guhertinên civakî bi rengên ji ya li Rûsyayê cuda bi gewde bibin. Ne ku şoreşên li Ewropaya Rojava nemumkin bûne, ez dûrî vê fikrê me; lê belê divê ew di nava "şerekî helwestan" ê demdirêj de pêk bên.

Ji pêronîzmê heta bi "lêkolînên ya talî"

Gramsci dixwaze dilsozê şoreşa rûs be – ew heyranekî Lenîn e, di *Nivîsên Girtîgehê* de her qedrê wî digire. Lê belê wî herweha fêm kir ku ev dilsozî di pratîkê de guhertina awayê kirina şoreşan jî dihewîne. Teorîya wî ya "hegemonyayê" ji vê tesbîtê dest pê dike. Gramsci dibêje, şerê çînan ji niha û pêve divê alîyekî çandî jî bihewîne; divê ew pirsa razîbûna çînên ji bo şoreşê talî jî ji xwe bike. Hêz û razîbûn du bingehên birêvebirina dewletên modern in, du stûnên hegemonyayekê ne. Dema ku razîbûn kêm dibe – çawa ku li cîhana erebî sala 2011ê rewş wisa bû –, hingê şert û merc hemû amade ne ji bo hilweşandina desthilatdarîya heyî.

Çapa peşî ya *Nivîsên Girtîgehê* ber bi dawîya salên 1940î ve çap bû. Ev çap di bin berpirsiyarîya sekreterê giştî yê Partîya Komunîst a Îtalî (PKÎ) Palmiro Togliatti de bû, wî heta bi destpêka salên 1960î otorîteya xwe ya li ser belavkirina nivîsên hevrêyê xwe yê rehmetî (*nivîsa di çarçoveyê de bixwîne*) parast. Ji hingê ve berhema Gramsci ji bo herkesî li dinyayê yê ku hewl dide dilsozîya bi Şoreşa Çirîya Pêşîn a 1917ê re biparêze û daxwaza wê/wî ya adaptekirina pêvajoyê li çarçoveyên civakî-siyasî yên ku carinan ji çarçoveya li Rûsyayê gelekî dûr in, heye, weke xala yekbûnê bi kêr tê. Ev yek jî bi lez belavbûna navneteweyî ya tezên Gramsci û pêkhatina tevgerên gramsciparêz li çar alîyên dinyayê rave dike. Ji bo *Nivîsên Girtîgehê* mirov dikare bibêje ku yek ji teorîyên pêşî yên rexnegirên globalbûyî ye.

Sê diyardeyên li serîyên dijberê hev, vê gerê nîşan didin. Berîya ku welatên din ên parzemînê yên weke Brezîlya, Meksîka yan jî Şîlîyê jî serê xwe bi lêkolîna *Nivîsên Girtîgehê* biêşînin, Arjantîn ji nîvê sedsala 20ê û pêve vediguhere devera rêûresmeke girîng a gramsciparêz. Lez û ferehîya qebûla Gramsci li Arjantînê mirov dikare bi mezinahîya koçberîya ji Îtalyayê ber bi Arjantînê ve rave bike. Yek ji sedeman jî ew e ku têgehên wê yên sereke – "hegemonya", lê belê herweha "sezarîzm [dîktatorîya eskerî; nota wergêr]" yan jî "şoreşa pasîf" – li wir bi kêr hatin ji bo jihevderxistina fenomena siyasî ya tîpîk arjantînî ango ji bo serwextbûna li peronîzmê [fenomena siyasî ku xwe disipêre kevne-serokdewletê Arjantînê Juan Perón; nota wergêr] bi kêr hatin.

Bi awayekî giştîtir ew bi kêr tên ji bo analîzkirina rejîmên eskerî yên "pêşverû" yan jî "bipêşvebir" – yên weke Juan Domingo Perón li Arjantînê, Lázaro Cárdenas li Meksîkayê yan jî Getúlio Vargas li Brezîlyayê – yên ku li herêmê derketin holê. Ev rejîm şêwazên "modernkirina muhafezekar" pêk tînin, ku ne şoreş in, ne jî sererastkirin in û di sedsala 20ê de li welatên cîhana sêyem pir belav in. Fikra "şoreşa pasîf" a ku Gramsci di *Nivîsên Girtîgehê* de pêk tîne dema ku li avabûna netewe-dewleta îtalî ya sedsala 19ê bi awayekî giştîtir) dikole tam jî bi vî awayî pêvajoyên siyasî yên dudilî dide nasîn. Carinan "sezarek"– fikra "sezarîzmê" ji vê peyvê tê – ango lîderekî karîzmatîk van şoreşan bi rê ve dibe, ev lîder girêdanên yekser bi girseyan re datîne û mînakên lîderên bi vî rengî li Amerîkaya Latîn her hebûn û hene, hem sedsalên bihurî û hem jî roja me ya îro.

Mirovên fikrê yên weke José Aricó, Juan Carlos Portantiero, Carlos Nelson Coutinho yan jî Ernesto Laclau û gelekên din xwendinên nûker ên *Nivîsên Girtîgehê* diafirandin û bandora wan ji Amerîka Latîn dibihurî. (4) Weke Gramsci bi xwe, gelek şîrovekerên nivîsên Gramsci yên herî girîng ketin nav berxwedana şoreşger, ku di salên 1960 û 1970yî de parzemîn dabû ber xwe.

Li serîyê din ê dinyayê ji salên 1960î û bi şûn ve fikrên întelektuelê îtalî digihîjin Hindistanê. Ew referanseke mezin a lêkolînên piştî serdema kolonyal (*postcolonial studies*) e. Damezrênerê sereke yê vê tevgerê Edward Saîdê filistînî ye, wî jî ew bi kar anîn da ku rexneya xwe ya li orîyentalîzmê ango li danasînên "Rojhilatê" yên halêhazir li cihana rojavayî hene, îfade bike. (5) Di bin bandora Saîd de lê belê herweha di bin bandora dîrokzanên marksîst ên brîtanî Eric Hobsbawm û E.P. Thompson de salên 1970yî sektoreke xusûsî ya Hindistanê ya lêkolînên piştî serdema kolonyal derdikeve holê: lêkolînên "talî" (*subaltern studies*). Ev tevgera ku Ranajit Guha, Partha Chatterjee (6) û Dipesh Chakrabarty nûnerîya wê dikin, navê xwe yekser ji Gramsci digire. Peyva "talî" di sernavê Nivîsa Girtîgehê ya 25ê de ku navê wê yê bêkêmasî "li kevîyên dîrokê (dîroka komên civakî yên talî)" de heye, ev komên civakî heke çalak bibin dibe ku ji wan were karibin nîzama civakî serûbinîhev bikin.

Belavbûna têgehên gramsciparêz ji Îtalyaya sedsala 20ê ber bi Hindistana salên 1970yî ve mirov dikare bi nêzîkbûna avahîyên civakî yên van welatan rave bike, nexasim jî hebûna çîneke cotkar a xurt li van herdu welatan. Di nivîsa bi navê *"Çend mijarên pirsa başûr"* de ku Gramsci sala 1926ê, hema berîya were girtin nivîsî, pesnê hevgirtina di navbera çîna karker a li bakurê Îtalyayê –bi hejmar kêm, lê belê di warê aborî û siyasî de xurt dibe – û çîna cotkar a başûrê Îtalyayê – wê demê hê jî hejmara wê pir e – dide. "Subalternîstên" Hindistanî jî pesnê stratejîyeke bi heman rengî li welatê xwe didin.

Bi alîkarîya têgehên nivîskarê *Nivîsên Girtîgehê* pêşniyazkirî, tevgereke sêyem jî xwe bi fikra jeopolîtîk ve girêda. Ew xwe dide nasîn bi navê teorîya "neogramsciparêz" ya têkilîyên navneteweyî. Damezrênerê vê tevgerê marksîstekî nûker ê kanadî Robert Cox e ku di heman demê de di birêveberîya Rêxistina Navneteweyî ya Kar a li Cenevreyê de jî cihê xwe digire. Kees van der Pijl, Henk Overbeek, Stephen Gill û gelekên din xwe di nava vê tevgerê de qebûl dikin. Van nivîskaran nexasim avabûna ewropî analîz kirin, ku pê erka wan fêmkirina krîza heyî ye. (7) Li gorî wan ev krîz dikare ji alîyekî ve bê ravekirin bi bêkerîya projeya ewropî di razîbûna aktîf a xelk û gelên parzemînê de. Ango ji bo ku hegemonyayek ji bo demeke dirêj xwe bi sazî bike li welatekî yan jî parzemînekê, yên serdest divê bawerîya bindestan pê bînin ku ev hegemonî qet nebe qismî bi kêra berjewendîyên wan jî tê. Li alîyê din, ji destpêka sedsala 20ê ve, em şahidîyê dikin li ketina zikhev a her diçe zêde dibe ya elîtên ewropî û amerîkî. Maneya vê jî ew e ku avahîya ewropî gelek caran li gorî berjewendîyên împeretorîya amerîkî pêk hatîye û ji Ewropayê nehatîye ku bibe xwedîyê projeyeke siyasî ya xweser.

Gramsci ku yek ji întelektuelên mezin ên sedsala derbasbûyî ye, bi rêya xebata xwe ji bo Înternasyonala Sêyem her hewl da ku "partîya bindestan" hem di asta Îtalyayê û hem jî di asta navneteweyî de ava bike.Wî teorî û pratîk bi hev ve girêdidan ya ku – mixabin – di nava întelektuelên rexnegir yên roja me ya îro de kêm caran derdikeve holê.

* Dersdar e li zanîngeha Parîs IV-Sorbonne; edîtorê antolojiya nivîsên Antonio Gramsci *Guerre de mouvement et guerre de position / Şerê tevgerê û şerê helwestê,* La Fabrique, Parîs, 2012.

AHMET KARABULAK: **Rêzewêneyên ji Guernîcayê heta Halebçê**, (Detay)
qîr li ser mûşembeyê, 70 x 100 cm

Di xizmeta şoreşê de

Antonio Gramsci sala 1891ê li Sardunyayê di malbateke nisbî xizan de ji dayik bû. Piştî ku bûrsek stend û pê karîbû biçe li **Torînoyê** filozofiyê bixwîne, wî **Palmiro Togliatti, Angelo Tasca** û **Umberto Terracini** nas kirin. Bi hev re wan ê pêşî di nava Partîya Sosyalîst a Îtalî (PSÎ) de milîtanî bikira, paşê di nava Partîya Komunîst a Îtalî (PKÎ) de, piştre jî sala 1919ê rojnameya mîtîk *L'Ordine Nuovo* damezrandin. Di dema damezrandina PKÎyê de sala 1921ê **Gramsci** dibe endamê komîteya navendî û sala 1924ê weke sekreterê wê yê giştî tê wezîfedarkirin. Di nîsana 1924ê de ew ji bo Meclîsa Neteweyî ya Îtalî weke parlemanter hat hilbijartin. Tê gotin, dema ku Gramsci li ser kursîya meclîsê bi dengê xwe yê zenûnî dipeyivî, **Benito Mussolini** guhên xwe bel dikirin da ku tevahîya axaftinên vî muxalifê mirov pê nikare bibihîse û ji wan nemîne.

Gramsci sala 1926ê li Romayê hat girtin û sala 1928ê bîst sal cezayê girtîgehê lê hat birrîn. Dema ku biryara cezayê hat eşkere kirin dozgerê faşîst hay ji tehlûkeya ji bo desthilatdarîyê ya reqîbekî wisa hebû û wê bigota "*Divê em pêşîyê li vî mêjîyî bigirin da ku bîst salan nexebite*". Sala 1929ê Gramsci mafê nivîsandina li girtîgehê bi dest xist, wî dê ev mafê xwe heta 1935ê bi kar bianîya, ango heta ku siheta wî bi awayekî ku derman nebe xira bû. Piştî ku deh salên bi êş û azar li girtîgehên Mussolini derbas kirin, 27ê nîsana 1937ê ji ber ku xwîn rijiya ser mêjîyê wî mir. Wî li pişt xwe komek nivîsên bi dawî nebûyî hiştin û van nivîsan wê di duyemîn nîvê sedsala 20ê de marksîzm serûbinîhev bikira.

R.K.

(1) Antonio Gramsci, Cahiers de prison / Nivîsên Girtîgehê, Gallimard, coll. « Bibliothèque de philosophie », Parîs, 1978-1992, 5 berg.

(2) *Le Figaro,* Parîs, 17ê nîsana 2007ê.

(3) *Bigire li ber* Pierre-AndréTaguieff, "Origines et métamorphoses de la nouvelle droite / Kok û veguherîna siyaseta rastgir a nû", Vingtième Siècle, hejmar 40, Parîs, 1993.

(4) Raul Burgos, *Los gramscianos argentinos,* Siglo XXI, Buenos Aires, 2004 *bixwîne*.

(5) Edward Saïd, *L'Orientalisme. L'Orient créé par l'Occident / Orîyentalîzm. Rojhilata ku Rojavayê ew afirandî*, Seuil, coll. "La couleur des idées", Parîs, 2005 (çapa yekem: 1978) bixwîne.

(6) Berhema li jêr bixwîne: Partha Chatterjee, "Controverses en Inde autour de l'histoire coloniale / Li Hindistanê gengeşiyên li ser dîroka kolonyal", Le Monde diplomatique, sibat 2006.

(7) Weke mînak bigire li ber Henk Overbeek û Bastiaan van Apeldoorn (di bin birêveberîya wan de), *Neoliberalism in Crisis / Neolîberalîzm di krîzê de,* Palgrave MacMillan, London, 2012.

Wergera ji fransî: Luqman Guldivê

Awireke gelemper li ser sînemaya kurdî

Sînemaya kurdî li reng û dengê xwe digere

Ali Güler

Sînemaya kurdî herçiqas çend sal piştî destpêka dîroka sînemaya cîhanê gavên xwe yên yekem avêtibe jî, ji ber pirsgirêkên netewî bi qasê ku tê xwestin bi pêş neket. Wek zarokeke nexweş û elemdar bi awayeke tendûrist seyreke erênî neşopand. Vê rewşê demeke dirêj hebûna xwe parast. Lê di nav 20 salên dawîn de, di sînemaya kurdî de pêşketineke berbiçav derkete holê. Helbet ne bi pêşketineke ku meriv pê şanaz be. Ji ber kû sînemaya kurdî hîn di nav teşqele û zehmetîyan de li rêya xwe digere…

Hunera sînemayê di sala 1895ê de li Parîs a paytexta Fransayê dest pê kir. Du birayên fransîyên bi navên Auguste û Louis Lumiere, di 28ê kanûna 1895ê de li kafeyeke Parîsê, rêzewêne li ser hev û bi lez wek fîlm dan nîşandan. Di vî fîlmî de behsa îstasyoneke trênê dihate kirin. Di fîlm de gelek kes diketin îstasyona trênê û jê derdiketin. Fîlm, di nava temaşevanên kafeyê de tesîr û heyecaneke wusa çêkir ku, hin ji wan jê we bû ku dê trên wê kêlîyê bikeve salona kafeyê û heta hin ji wan ji salonê revîyan. Ev hewldana herdu birayên Lumiere, li hemû cîhanê wek destpêka sînemayê tê pejirandin.

Kurdan jî 31 sal piştî vê bûyera dîrokî sînema nas kirin. Derhêner û sazkarê sînemaya ermenî Hamo Beknazaryan di sala 1926ê de li deşta Elegezê çîroka keçeke kurd a bi navê ‘Zerê’ anî ser perdeya spî. Wê demê li Ewropa û Amerîkayê sînema gav bi gav pêş diket. Lê di heman demê de hîn gelek welat ji hebûna sînemayê ne agahdar bûn.

Bi kişandina fîlma "Zerê" kurdên Ermenistanê kamera û teknîka sînemayê naskiribûn û di fîlmêkê de cîh girtibûn. Fîlm, herçiqas jî ji alîyê derhênerekî ermenî û hinek listîkvanên bîyanî ve jî hatibe kişandin, ji alîyê mijarê ve fîlmeke kurdî bû. Gelek kurdan jî di fîlmê de cîh girtibûn. Fîlma bêdeng ya reş û sipî behsa evîna keça kurd "Zerê" dike… Ev fîlm wek yekem fîlmê kurdî û destpêka sînemaya kurdî tê pejirandin. Navê fîlmê duwem ê kurdî jî "Zînê"ye. Ev fîlm jî di sala 1933yê de tê kişandin. "Zînê" jî ji hêla naverokê ve wek "Zerê" qala çîroka jineke kurd dike. Di vê fîlmê de jî cîh û war dîsa deşta Elegezê ye. Piştî van herdu fîlman, di sala 1948ê de belgefîlma bi navê "Kurdên Ermenistana Sovyetê" tê kişandin. 11 sal bi şûn de, di 1959ê de fîlmek din bi navê "Kurdên Ermenistanê" tê çêkirin. Sedemê ku li Sovyeta kevin ev fîlm hatine kişandin, pêşketina sînemayê ya li vî welatî bû. Lê piştî van fîlman, ne li vê derê û ne jî li devereke din a Kurdistanê demeke dirêj tu fîlm nehatin kişandin. Ev yek jî ji bêsazîbûna kurdan û bêdewletbûna wan tê. Lewra ji bo çêkirina fîlman û sazkirina sînemayê hewcedarî bi alîkarîya dewletan û hêzên xurt hene. Kurdan ji bo afirandinê derfetên bi vî rengî bi dest nexistine. Ev yek jî ji bo pêşketina sînema û çanda kurdî dezavantajeke mezin e. Dewletên dagirker li peşîya ziman û çanda kurdî, herdem astengîyên mezin derxistin. Di nav van şert û mercan de hevîya pêşketina sînema û çanda kurdî jî ji xwe wek xewn û xeyalekê bû. Heta derhênerê mezin Yilmaz Guney, bi derfetên xwe yên şexsî derket holê. Piştî “Zerê” û“Rê”, di 20 salên dawîn de fîlmên wek “Dema Hespên Serxweş”,”Kusî jî dikarin bifirin”,” Kîlometre zero” Dol”,”Ax” “Bahoz”,”Bawke”,”Davîd û Leyla”,”Nêrgîz bişkivîn”,” Bêrîtan”,” Min Dît”,”Kevoka Spî” ‘’Roja duyemîn”,”Sirte le gel ba” û “Meş” nêzikî hezar fîlmên dirêj, belgefîlm û kurtefîlmê kurdî hatine kişandin. Gelek ji van fîlman di qadên navnetewî de xelatên girîng wergirtin û ketin nav sînemaya cîhanê.

Her derhênerek li gorî felsefeya jiyana xwe nêzikî sînemayê dibe. Karekterên fîlmên wan herçiqas ji hev cudabin jî di nuxteyekê de digihîjin hev; êş û jana kurdan. Behman Qobadî jîyana kurdan a li welatê xwe ya li ser sînor nîşanî cîhanê da. Hiner Saleem, bi terzeke cuda ket nav sînemayê. Wî di fîlmên xwe de tenê ne êş û jana kurdan nîşan da. Herweha li hemberî dagirkerên kurdan jî şerek da dest pê kirin. Kazım Öz, bi sînemaya xwe hevî mezintir kir. Di fîlmê xwe yê ‘’Bahoz’’ de berê keç û xortên kurdan da çîyê.… Halil Uysal jî sînema xwe wek, “Sînemaya çîyê” da naskirin. Miraz Bêzar ê ciwan jî, tola zarokên kurd ji *jîtem* û sîstema Tirkîyeyê girt. Yüksel Yavuz û Hişam Zaman jî, jîyana kurdên dîyasporayê bi awayekî dramatîk anî ser perdeya sipî.

Di sînemaya kurdî de rola Yilmaz Guney…

Yilmaz Güney, di salên 1960ê de li dijî jonên “Yeşilçam”ê wek ”Şahê kirêt-Çirkin Kral” derket meydanê. Lê di salên dawîyê de jî ji bo sînemaya kurdî gavên mezin avêtin. Li vê derê ji bo me mijar herçiqas zelal be jî, ger hêzên desthilatdar û ger hin kurd jî dibêjin: ”Yilmaz Guney sînemavenekî tirk e.” Vê nêrînê jî bi destpêka sînemaya Yilmaz Guney ve girê didin. Lê em dizanin ku derhêner, di jiyana xwe ya sînemayê de gelek caran rewşa kurdan û xizanan anîye ser perdeya spî . Ji ber vê helwestê piranîya jîyana xwe di zindanan de derbas kiriye. Ji alîyekî din ve, fîlmên wî yên wek “Rê”, “Kerî”, “Hêvî” û gelekên din di vî warî de mînak in. Helwesta Yilmaz Guney a li ser van nîqaşên ku “gelo ew sînemevanekî tirk e yan kurd?” di dema kişandina fîlmê ”Dîwar’’ de li Parîsê ji nivîskar Mahmut Baksî re bi awayekî vekirî dibêje ku; ”Ez derhenêrekî kurd im.” (1) Axaftinek din a wî ya herî girîng jî weha ye: “Ez ê di demeke nezîk de bi Qasimlo re li çîyayên Kurdistanê fîlmekî bi zîmanê kurdî bikişînim.” (2) Ev gotinên wî wek notên girîng li dîrokê tên nivîsandin û dawî li nîqaşên derbarê wî de jî pûç dikin. Hostayê mezin, demeke ne li bendê çû ser dilovanîyê. Temenê wî jî ji bo van xeyalan têrê nekir.

Keda 20 salan hêdî hêdî derdikeve holê…

Tekoşîna li Bakurê Kurdistanê wek gelek tiştên din rêya sînemayê jî vekir. Ji wan salan sînemaya kurdî jî hêdî hêdî dest pê kir û bi pêş ket. Di salên 90î de li Navenda Çanda Mezopotamyayê (NÇM) li ser sînemayê hin xebat hatin destpêkirin. Komek ciwanên kurd, di salên 90î de di bin sîya vê sazîyê de Yekîtîya Sînemavanên Mezopotomyayê avakirin û dest bi perwerdeya sînemayê kirin. Li vir gelek ciwanên kurd fêrî sînemayê bûn. Di gelek fîlman de cîh girtin. Di sala 1996ê de di bin derhênerîya Kazim Öz de cara yekem fîlmê xwe kişandin. Fîlmê bi navê “Ax” 30 deqîqe ye û behsa valakirina gundên kurdan dike. Fîlm di gelek festîvalan de hat nişandan û eleqeyeke mezin dît.

Piştî fîlmê “Ax”, “Fotograf” û gelek belgefîlm ji alî vî komê de hat kişandin. Bi van helwestan li bakur bingeha sînema kurdî hat avêtin. Gelek ciwan bi van fîlman nêzikî vî beşê hunerê bûn û ji bo kişandina fîlman ketin nav hewldanan. Di salên 2000ê de sînema hêdî hêdî li vî parçeyê welat rûniştibû. Dema îro bi dehan derhêner li bakurê Kurdistanê fîlman dikişînin. Bêguman fîlmên li vir derketin pêş di serî de “Bahoz”, “Min Dît”, “Meş” û gelek belge û kurte fîlmên din bûn. Dîsa derhênerê ciwan yê wek Özkan Kuçuk, Arîn Înan Aslan, Erol Menteş, derketin pêş. Nêrîna van kesan ya sînemayê û ji fîlmên wan tê kifşkirin ku di siberojê de ew ê gelek berhemên baş derxin holê. Dîsa ew bingehên ku wan salan hatin avêtin îro berê xwe digire. Di serî da li Amed û Êlihê gelek çalakîyên sînemayê tên li dar xistin. Li NÇMya Stenbolê, Navenda Çanda Aram Tîgran û Cîgerxwîn ya li Amedê beşên taybetî yên sînemayê hene û ders tên dayîn. Her çiqas ev kar kêm bin jî, ji bo sînemaya me gavên gelek girîng in. Ez di wê bawerîyê de me salên pêşîyê me ev hewldan dê zêdetir bin. Rewş wisa dide nîşandan. Ji ber ku, bi sedan ciwan ji nêzik ve bi sînemayê eleqedar in, ev bi awayekî ber bi çav tê dîtin.

Sînema kurdî ji Rojhilat belav bû

Îro her çiqas dilê sînemaya kurdî li bakur bavêje jî, berhemên girîng li Rojhilatê Kurdistanê derket. Behmen Qobadî di 2000ê de bi çêkirina fîlm, ne tenê sînemaya kurdî, pirsgirêk û jana gelê xwe jî nîşanî cîhanê da. Ji Çînê bigire heyanî Awusturalyayê temaşevan piştî Yilmaz Guney kurd û pirsgirêka kurdî bi Behmen Qobadî nas kir. Bi rastî Qobadî bi têrbarî, nêrin û estetîka sînemayê, bala alemê kişand. Qobadî, tenê sînemaya xwe nîşan neda, bi vê yekê re wî hem sînemaya kurdî da nasandin û hem jî jibo ciwanên nû, bû hêvîyek. Fîlmên wek “Dema Hespên Serxweş”,”Kusî Jî Dikarin Bifirin” û “Nîw Mang” di serî de li Venedîk, Cannes, Berlinale û San Sebastianê hat nişandan û xelatên giranbuha wergirtin. Gelek ciwan bi rêberîya Behmen Qobadî, ketin nava tevgara sînemayê. Dîsa li rojhilatê Kurdistanê, derhênerê wek Şirîn Cîhanî, Rahîm Zebahî, Jiyar Gol, Ferîboz,Taha Kerîmî û Babek Amînî derketin û fîlman çêdikin û fîlmên wan di festîvalên navneteweyî de tên nîşandan.

Li gorî derfetan pêşketin kêm e

Li başûr rewş ne wek bakur û rojhilatê ye. Sînema li vir piştî ketina rejîma Baas bi pêş ket. Wekî maf û qedera kurdan ji sala 2003ê şûn de li başûrê Kurdistanê gelek tişt ji nû ve ava bû. Keç û xortên hezkiriyê sînemayê jî ji bo sînemayê ketin nav hewldanan û dest bi kişandina fîlman kirin. Dîsa di bin sîya Wezareta Çand û Hunerê de beşa sînemayê hat avakirin. Li gelek bajaran dezgehên sînemayê hatin sazkirin. Ji bo kişandina fîlman ji alî hukumetê fon hat veqetandin û alîkarîya derhenêran tê kirin. Li zanîngehên Hewler û Silêmanîyê beşên sînemayê hatin vekirin û perwerde tê dayîn. Derhênerên wek Hiner Saleem, Şewket Emîn Korkî, Hisên Hesen, Mesûd Arif, Viyan Mayî, Shahram Alî fîlmên *“Nêrgiz Bişkivin, Dol, Kîlometre Zero, Kick Off Kerkuk”* çêkirin. Ev fîlm li gelek festîvalên cîhanê hatin nişandan. Dîsa van salên dawî bi amadekirina festîvalên fîlman, başurê Kurdistanê hêdî hêdi dibe navenda sînemaya kurdî. Lê li gorî derfet û îmkanên aborî gelek jî kêmasî hene. Ev 10 sal in ji çend fîlmên xwuyakirî sînema zêdetir bi pêş neket. Wek mînak li vî perçeyî çanda belgefîlm û kurtefîlman tuneye û çênebûye. Ev jî pirsgirêka herî mezin e. Eger di sînemaya gelekî de kurtefilm û belgefîlm tunebin mirov nikare li wir behsa sînemayê bike. Li başûr jî niha rewşeke wisa heye. Ez di wê hêvîyê de me, di demeke nêzik de rêveberên sînemayê dê dest biavêjin vê mijarê.

Ji Amûdê bêhna laşên zarokan tê…

Dema li vir sînema tê gotin, Agirê Sînemaya Amûdê tê bîra mirovan. Sînema li vir ewqas bi êş û keder e. Di 1960ê de li sînemaya Amudê bi dehan zarokên kurdan ji ber derketina agir jiyana xwe ji dest dan. Li gorî gelek kesan rejimê ev yek kirîye, li gorî hinekan jî agir bi xwe derketîye. Lê çi dibe bila bibe, di dawîyê de bi dehan laşên zarokên kurd yên şewitî ji salona sînemayê hatin derxistin. Ev bûyerek wek bûyereke reş ket dîroka kurdan. Lê sînema û çanda kurdî li vir ji ber zilm û zordarîya dewletê tu carî çênebû. Heyanî îro jî qedexe ye. Tu derfetek tune ku fîlmên kurdî werin kişandin. Ew kesên bi sînemayê re eleqedar in jî, ji ber zilm û zordarîyê direvin derve û li diyasporayê fîlman çêdikin. Mano Xelîl, Ekrem Eydo û Ekrem Kiro, li Avrupayê dijîn û fîlmên xwe liv ir çêdikin.

Di sînemaya kurdî de derfetên diyasporayê…

Diyaspora di dîroka gelek gelan de roleke girîng lîstîye. Gelek hunermendên Amerîka Latînî dema ji ber rejîmên diktator revîyan hatin Europayê li vir karê xwe berdewam kirin û gelek bi pêş xistin. Sînema jî yek ji van beşên hunerê ye. Ji ber wê yekê li gel dezavantajên dîyasporayê, her weha di hin waran de avantajên wê jî hene. Ev yek ji bo kurdan jî derbas dibe. Ji ber ku mirov dikare bibêje ku sînemaya kurdî jî li diyasporayê dest pê kirîye. Fîlmê ***Zerê*** li Ermenistanê hat kişandin. Yilmaz Guney cara yekem li Fransayê got ez; ”Derhenêrekî kurd im”, di sala 1991ê Nîzamettîn Ariç, fîlmê “***Klamek ji bo Beko***” li derveyî Kurdistanê kişand. Dû re Yuksel Yavuz, Hisham Zaman, Binevşa Berîvan derketin holê, jîyan û trejedîya kurdên diyasporayê anîn ser perdeya sipî. Bê guman van 10 salên dawîn gavên ku hatine avêtin, ji bo bingeha sînemaya kurdî gelekî girîng û pîroz in. Di vir de çalakîyên sînemayê yên di bin navê Festîvala Fîlmên Kurdî de li Berlîn, London, Viyana, Parîs, Roma û gelek cîhên din hatine çêkirin, roleke mezin lîst. Derhênerên kurd, cara yekem li van platforman bi temaşevanên kurd re û hem jî bi derhênerên din re hatin ba hev. Berhemên xwe li vir nîşanî temeşevanên kurdan dan. Ev çalakî ji bo Festîvalên Fîlm ên li Kurdistanê jî bûn nimûne. Ji ber wê yekê rola diyasporayê di sînemaya kurdî de gelekî girîng e.

Pirsgirêka sînemaya kurdî

Li gel ewqas pêşketinan, dîsa jî kevirên sînemaya kurdî hê jî tam di cîhê xwê de rûneniştine. Sînemaya kurdî di bin tesîra sînor û parçebunê de li reng û deng û nasnemaya xwe digere.

Her çiqas hewldanên şexsî hebin jî mirov nikare sedî sed behsa sektor û bazara sînemaya kurdî bike. Salonên sînemayê tunene, fîlm ji bo temaşevanên kurd nayên çêkirin. Şirketên belavkirinê hê jî çênebûne. Weqf û sazî hê jî nehatine avakirin. Ne li başurê Kurdistanê û ne jî li bakurê Kurdistanê endustrîyeke sînemayê hê jî pêk nehatîye. Lê li gorî derfetan gerek ev sazî û sîstem ji mêj ve hatibana avakirin. Lê ez bawer im salên pêşîya me ev kêmasî dê peyder pey werin telafîkirin û ji bo sînemaya kurdî dê gavên baş werin avêtin…

(1) Mahmut Baksi; Kürt Gözüyle Yılmaz Güney (Bi Çavê Kurdan Yilmaz Guney)

(2) Mahmut Baksi; Kürt Gözüyle Yılmaz Güney (Bi Çavê Kurdan Yilmaz Guney)

Dîmenek ji fîlmê "David & Layla"

Dîmenek ji fîlmê "Dema Hespên Serxweş"

www.sirvaturo.org